

K T

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî
Metin û Lêkolîn

Serdar YILMAZ

11711009

Şewirmendê Tezê

Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Mêrdîn 2013

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

KURTE

DÎWANA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ METIN Û LEKOLÎN

Serdar YILMAZ

Şêx Şemsedîn, di sedsala 16-17an de helbestvan û mutesewifekî serdema edebiyata kurdî ya klasik e. Bi qasî ku tê zanîn yekemîn helbestvanê kurd yê terîqeta Xelwetî ye. Em vêya ji mexlesa wî ya “Xelwetî” fêhmdikin. Helbestavan di qada edebiyata kurdî de weke mexlesa xwe xelwetî maye. Ji dawiya sedsala 16an heta sedsala 17an jiyaye. Di sedsalên ku helbest nivîsandine, edebiyata kurdî di lutkeya xwe ya herî bilind de ye.

Şêx Şemsedîn Exlatî, ji ber şerê di navbera dewleta Osmanî û Sefewiyan de ji navçeya Exlat ya girêdayî bajarê Bilîsê koçber bûye. Piştî mayîna çend salan li Oremarê, herî dawî li gundê Birîfka ya girêdayî bajarê Duhokê bi cî bûye. Jiyana xwe di uzlet û xelwetê de derbas kiriye. Di helbestê de zimanê wî giran û xwedî sentaksên cûda ye. Di helbesta kurdî de qalibên serbixwe ava kirine. Di helbestên xwe de bi piranî li ser jiyana gundewariyê rawestiyaye. Mîna şaîrên hemdemê xwe, felsefeya tesewifê di helbestên xwe de baş hunaye. Unsûrên devoka Serhed û devoka Behdînî di helbestên wî de hene.

Helbestên dîwana wî bi piranî wenda ne. Ji ber ku di jiyana gundewarî û cihên asê de jiyaye, berhemên wî negihîştine navendên ilmî. Herwiha berhemên wî bi piranî winda, pûç û pelaçe bûne. Lê helbestên wî yên di destên me de didin îspatkirin ku şairekî mezin e. Heta niha jî hîn baş lêkolîn li ser nehatine kirin û negihîştîye nixê xwe yê rewa. Helbestên xwe bi qalibên êrûzê nivîsandine. Di helbestên wî de senêtên edebî, serwa, paşserwa û gelek biwêj, unsûrên erebî, farisî bi kar anîne. Ji ayetan îqtîbas kiriye. Nêzî baweriya wehdetu'l wucûde ye. Ji dîwana wî 16 helbest li ber destê me hene. Ji van du helbest metlê helbestan in. Bi giştî xezel nivîsandine.

Ev xebata me ji despêk û pênc beşan pêk hatiye. Di despêkê de em li ser rewşa sîyasî ya ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye rawestiyane. Di beşa yekemîn de li ser jiyana û berhemên wî; di beşa duyemîn de li ser ziman û kesayeta edebî ya Şêx Şemsedînê Exlatî rawestiyane. Di beşa sêyemîn de ji hêla teşeyê ve vekolîna dîwanê me kiriye. Di beşa çaremîn de tehlîla dîwanê û di beşa pêncemîn de em li ser metnê dîwanê rawestiyane.

Em di wê baweriyê de ne ku wê ev xebat cihê Şêx Şemsedîn di edebiyata kurdî de bêtir eşkere bike û şair baştir bide nasîn. Heta niha ji ber ku xebateke akademîk li ser dîwana Şêx Şemsedîn nehatiye kirin wê deriyê van xebatan bi awayekî baştir bide vekirin.

Peyvên Sereke:

Şêx Şemsedîn, Exlat, Birîfkan, Xelwetî, Oremar, Mele Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Xezel, Şêx Memdûhê Birîfkanî, Şêx Mihemed Tahirê Birîfkanî, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Tesewif.

ÖZET

ŞEYH ŞEMSEDİN AHLATI DİVANI METİN VE İNCELEME

Serdar YILMAZ

Klasik Kürt edebiyatının en önemli şairlerinden biri olan Şeyh Şemsedin-i Ahlati 16-17 yy. arasında yaşamış mutasavvuf bir şaiirdir. Bilindiği kadarıyla klasik Kürt edebiyatında Kürtçe şiir yazan ilk ve tek Halveti şairdir. Bunu şiirlerinde kullandığı “Helveti” mahlasından da anlayabiliyoruz. Şair, Kürt edebiyatı sahasında halveti kalmıştır. 16. Yüzyılın sonlarından 17. Yüzyıla kadar yaşamıştır. Şiir yazdığı yüzyılda Kürt edebiyatı en zirve durumundaydı.

Şeyh Şemsedin Ahlati, Osmanlı ve Sefevi devletleri arasındaki savaşlar yüzünden Ahlat’tan göç etmiştir. Oramar’da kaldığı birkaç seneden sonra Bırifka’ya yerleşmiştir. Hayatını uzlet ve halvetle geçirmiştir. Halveti bir şair oluşu, şiirlerinde açıkça görülmektedir. Ağır bir dil kullandığı şiirlerinde farklı sentakslar geliştirmiştir. Özgün kalıplar kurmuştur. Şiirlerinde çoğunlukla kırsal yaşantı üzerinde durmuştur. Çağdaşları olan şairler gibi, tasavvuf felsefesini şiirlerinde iyi işlemiştir. Serhat ve Behdini ağızlarının özellikleri şiirine yansımıştır.

Divandaki şiirlerin çoğu kaybolmuştur. Kırsal ve sarp yerlerde yaşadığı için, eserleri ilim merkezlerine ulaşmamıştır. Bu şekilde kaybolmuş ve kalanlar da yıpranmıştır. Elimizdeki şiirleri büyük bir şair olduğunu, bize kanıtlıyor.

Şimdiye kadar da üzerinde iyi bir araştırma yapılmamış ve hakettiği ilgiyi göstermemiştir. Şiirlerini aruz kalıbıyla yazmıştır. Şiirlerinde edebi sanatları, kafiye, redif, bir çok deyim, Arapça ve Farsça unsurları kullanmıştır. Ayetlerden iktibas

yapmıştır. Vahdet-ul vücut felsefesine yakındır. Divanından elimizde 16 şiiri mevcuttur. Bunlardan ikisi şiir matlalarıdır. Tamamıyla gazel yazmıştır.

Bu çalışmamız giriş ve beş bölümden oluşmaktadır. Girişte Şeyh Şemsedin Ahlati'nin yaşadığı dönemin siyasi durumu üzerinde durduk. Birinci bölümde; hayatı ve eserleri üzerinde; ikinci bölümde dili ve edebi kişiliği üzerinde durduk. Üçüncü bölümde, şekil yönünden divanı araştırdık. Dördüncü bölümde, divanın içerik tahlilini yaptık. En son bölüm beşinci bölümde, divanın metni üzerinde durduk.

Bize göre Şeyh Şemsedin Ahlati'nin divanı üzerinde yapılan bu çalışma Kürt edebiyatı sahasında bir boşluğu dolduracak olup, bundan sonra yapılacak akademik çalışmalara bir kapı aralayacaktır.

Anahtar Kelimeler:

Şeyx Şemsedîn, Ahlat, Birîfkan, Halveti, Oremar, Mele Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Hanî, Gazel, Şeyh Memdûhê Birîfkanî, Şeyh Mihemed Tahirê Birîfkanî, Şeyh Nûredînê Birîfkanî, Tasavvuf.

SUMMARY

SHEIK ŞEMSEDİN EXLATÎ'S COLLECTED TEXT AND ANALYSING

Serdar YILMAZ

Sheik Shemsedîn Exlati's appellation is Xalweti. He has been a Xalweti in the kurdish literature till up to date. He is the most important poet of all kurdish classic literature. He lived in the end of the sixteenth century till the seventeenth century. We accepted him that he is the kurdish poet of the religious order pf Xalweti. The kurdish literature in the centruy which he wrote his poems was the height of alls,according to our viewpoint.

Sheik Shemsedîn Exlati emigrated from Exlat because of the battles between the Ottomon Empire and Safavid. After he had stayed in Oromarda for a few years, he seated in Birifkaya. He spent his life with uzlet and xelwet. Poet as a Xalweti stared in his poems. He wrote his poems with puffed-up language and he rectified different syntaxes in his poems. He designed original versifications in his poems. Most of the poems of the poems of him were about sily. Like the poets being Sheik Shemsedîn Exlati's contemporary, he discoursed the philosophy of mysticism very well in his poems. The characteristics of Serhat and Behdini's dialects are exist in his poems.

Many of the poems in Collected were lost. Since he lived in rural areas his literary works couldn't be come to hand to the seat of learning. So almost all of them were lost but rests were being damaged Exlati is a great poet.

There hasn't been carried out a well rounded research so far about him. He wrote his poems using eruz versification. In his poems he used many components such as poetry,rhyme,lots of idioms,arabic and persian/farsi. He extracted some of the verse of the koran. His poems are near to the philosophy of "wahdetu'l wucûd" only sixteenpoems of him exist from his collected. Two of them are poem metles. He wrote completely Iyric poems.

Our this research consists of introduction and five chapters. In the introduction we have emphasized on the political situation of the are being Sheik Şemsedin Exlati lived. In chapter one we emphasized the life and the literary work of Sheik Şemseddin Exlati. In chapter two we emphasized the literary personality and puffed-up language of Sheik Şemsedin Exlati's poems. In Chapter three we carried out the collected in terms of structure. In chapter four we analysed the collected in terms of the content. In the last chapter we emphasized on the text of the collected.

Keywords:

Sheik Shemsedîn, Exlat, Birîfkan, Xelwetî, Oremar, Mele Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Ode, Sheik Memduhê Birîfkanî, Sheik Mihemed Tahirê Birîfkanî, Sheik Nûredînê Birîfkanî, Tesewif.

NAVEROK

	Rûpel
KURTE.....	IV
ÖZET.....	VI
SUMMARY.....	VIII
NAVEROK.....	X
PÊŞGOTIN.....	XVI
LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN.....	XVII
KURTEBÊJE.....	IX
DESTPÊK.....	21
1. ÇAVKANIYÊN TEZÊ	21
2. DÎ AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZ.....	22
3. REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ.....	24
3. 1. Têkiliya Kurdan û Osmanîyan.....	24
3. 2. Rewşa Siyasî ya Cihên ku Nivîskar lê Jiyaye.....	25
3. 3. Rewşa Wêjeya Kurdî.....	27

BEŞA YEKEM

JIYAN Û BERHEMÊN ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

1. JIYANA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ	28
1. 2. Nav û Mexlesa wî.....	28
1. 3. Serdema Exlatê.....	31
1. 3. 1. Jidayîkbûna Wî.....	31
1. 3. 2. Malbata Wî.....	33
1. 3. 3. Terîqet û Aliyê Wî yê Tesewifî.....	37
1. 3. 4. Perwerdeya Wî.....	42
1. 4. Serdema Oremarê û Birîfkanê	43

1. 4. 1. Wefata Wî.....	44
2. BERHEMÊN ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ.....	45
2. 1. Dîwana Kurdî.....	45

BEŞA DUYEM

KESAYETIYA EDEBÎ YA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

1. ZIMANÊ WÎ.....	47
1. 1. Devoka Exlatê	48
1. 2. Devoka Behdînan.....	49
1. 3. Peyvên Soranî.....	50
1. 4. Peyvên Kurdî yên Resen.....	50
1. 5. Biwêjên ku di Dîwanê de Hatine bi Kar Anîn.....	51
1. 6. Unsûrên Erebi, Farisî û Tirkî.....	57
1. 6. 1. Unsûrên Erebi.....	57
1. 6. 2. Unsûrên Farisî.....	57
1. 6. 3. Unsûrên Tirkî.....	59
2. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ.....	61
3. EDÎBÊN KURD ÊN DI DEMA ŞÊXŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ DE.....	64
3. 1. Mele Ehmedê Cizîrî.....	64
3. 2. Feqiyê Teyran.....	67
3. 3. Ehmedê Xanî.....	69

BEŞA SÊYEM

JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ

1. TAYBETIYÊN TEŞEYÊ.....	71
1. 1. Awayê Rêza Helbestên Dîwanê.....	71
1. 1. 1. Rêz û Hejmara Helbestan.....	71
1. 2. Teşe Nezmê.....	72
1. 2. 1. Xezel.....	72
1. 2. 2. Metle'.....	73
1. 3. Kêş (Wezin).....	73
1. 3. 1. Îmale.....	75

1. 3. 2. Med	75
1. 3. 3. Zîhaf.....	75
1. 3. 4. Wesl.....	76
1. 4. Serwa Cûreyên Wê (Qafiye)	76
1. 4. 1. Li Gorî Cihê Wê Di Risteyê de.....	77
1. 4. 1. 1. Serwaya Kutayî.....	77
1. 4. 1. 2. Serwaya Navekî.....	77
1. 4. 1. 3. Serwaya Sereta.....	77
1. 4. 2. Li Gorî Dengan	77
1. 4. 2. 1. Serwaya Lawaz.....	77
1. 4. 2. 2. Serwaya Asayî.....	78
1. 4. 2. 3. Serwaya Zêdebar.....	78
1. 4. 2. 4. Serwaya Regezdozî.....	78
1. 5. Paşserwa (Redîf)	79

BEŞA ÇAREM

TEHLÎLA DÎWANÊ

1. DÎN	80
1. 1. Xwedê.....	82
1. 2. Pirtûkên Pîroz.....	82
1. 3. Pêxember	82
1. 4. Îqtîbasên ji Ayetan.....	84
1. 4. 1. Çêbûn.....	84
1. 4. 2. Qisetên Pêxemberan.....	85
1. 4. 3. Xeyb.....	86
1. 4. 4. Tezkiya Nefsê.....	86
1. 4. 5. Bereketa Quranê.....	87
1. 4. 6. Tecelliya Xweda.....	87
1. 5. Secdeya Şikrê.....	87
1. 6. Melek, Horî û Cin.....	87
1. 2. TAYBETIYÊN TESEWIFÎ	88
1. 2. 1. Wehdetu'l-Wicûd.....	89

1. 2. 2. Evîn	90
1. 2. 3. Dinya.....	90
1. 2. 4. Terîqet.....	90
1. 2. 5. Rind.....	91
1. 2. 6. Nefs.....	91
1. 2. 7. Zûhd û Teqwa.....	92
1. 2. 8. Xeyb û Sir.....	92
1. 2. 9. Uzlet û Xelwet.....	93
1. 2. 10. Mûrşîd, Pîr û Îrşad.....	93
1. 2. 11. Ya Hû.....	94
1. 2. 12. Çelebî.....	94
1. 3. CIHÊN TAYBET	95
1. 3. 1. Welat û Bajar.....	95
1. 3. 2. Derya û Çiya.....	95
1. 4. JIYANA CIVAKÎ	96
1. 4. 1. Aletên Pîvanê.....	96
1. 4. 2. Aletên Muzîkê.....	96
1. 4. 3. Aletên Şer	96
1. 4. 4. Lîstik, Kêf û Şahî.....	96
1. 5. ÎNSAN	97
1. 5. 1. Yar	97
1. 5. 2. Tesewurê Xweşîkbûnê	97
1. 6. REWŞÊN EVÎNÎ	98
1. 6. 1. Dînîfî.....	98
1. 6. 2. Ax, Hewar, Fîxan û Nalîn.....	98
1. 6. 3. Mest, Xerab, Waleh û Serxweş.....	99
1. 6. 4. Weslet (Gihaştin).....	99
1. 6. 5. Bade, Şerab, Qedeh, Mey û Cam.....	100
1. 6. 6. Dil.....	100
1. 7. TIŞTÊN SIRUŞTÎ	101
1. 7. 1. Av, Ax, Agir, Hewa û Nûr.....	101
1. 8. DEM	101
1. 9. AJEL (HEYWAN)	102
1. 9. 1. Ker.....	102

1. 9. 2. Bilbil.....	102
1. 9. 3. Kund.....	102
1. 9. 4. Rovî û Kuje.....	103
1. 9. 5. Şêr.....	103
1. 9. 6. Hudhud.....	103
1. 9. 7. Mişk.....	103
1. 9. 8. Mar (Sûèban, Ejderha).....	104
1. 10. RIWET (NEBAT).....	104
1. 10. 1. Dar û Ber.....	104
1. 10. 2. Gul (èendelîb), Xar (Sitirî) û Bilbil.....	104

BEŞA PÊNCHEM

METNÊ DÎWANÊ

1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ.....	105
1. 1. Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî.....	105
1. 2. Nusxeyên Dîwanê.....	105
1. 2. 1. Nusxeya Şêx Memdûhê Birîfkanî.....	105
1. 2. 2. Nusxeya Mihemed Tahirê Birîfkî.....	106
1. 2. 3. Şerha Şêx Nûredîne Birîfkanî.....	107
3. Metnên Dîwanê yên Latînzekirî.....	108
ENCAM.....	122
ÇAVKANÎ.....	123
PÊVEK.....	125

PÊŞGOTIN

Edebiyata kurdan, li ser hemû zordestiyan xwedî dîrokeke serbilind e. Weke hemû netewan xwedî berhem û nivîskarên mezin e. Ji bo ku nirx û serbilindayiya kurdan bêtir derkeve holê pêwîst e berhemên kurdan zahftir werin lêkolîn kirin. Em li ser xwe weke erkekê dibînin ku em van çavkaniyên mîrasa çanda xwe bidine nasîn û em li ser wan bixebitin.

Şêx Şemsedînê Exlatî, dema ku helbesta kurdî di lutkeya xwe ya herî bilind de bû helbest nivîsandiye. Taybetmendiyeke wî ya balkêş ev e ku mîna helbestvanê hemdemê xwe ne di nava civakê de helbest nivîsandiye. Şêx Şemsedîn li serê dar, zinar, teht û çiyar, li cihên xewle helbest nivîsandine. Naveroka helbestên wî bi xwezayê re bi deng û aheng in. Şêx Şemsedîn, ji bo edebiyata kurdî nirxekî mezin e. Lê mixabin heta niha xebatên ilmî pir li ser nehatine kirin û negihîştîye wî nirxê xwe yê rewa. Ji ber van sedeman me xwest ku em li ser berhemeke edebiyata klasîk rewestin û lêkolîn bikin.

Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî, di sedsala 17an de hatiye nivîsîn. Şêx Şemsedîn helbestvanê yekemîn yê terîqeta Xelwetî ye. Ji ber vê sedemê cihê wî di qada edebiyata kurdî de pir giring e.

Ev xebat ji despêk û pênc beşan pêk hatiye. Di despêkê de, em li ser rewşa sîyasî ya serdema Şêx Şemsedîn tê de jiyaye, rawestiyane. Me di vê beşê de xebatên li ser Diwana Şêx Şemsedîn ku hatine kirin eşkere kirine. Di beşa yekemîn de li ser qonaxa jiyana wî û malbata wî rawestiyane. Di beşa duyemîn de em li ser zimanê dîwanê û kesayeta helbestvan û şaîrên hemdemê wî rawestiyane. Di beşa sêyemîn de, me dîwan ji hêla teşeyê ve lêkolîn kiriye. Em li ser danasîna dîwanê ji hêla taybetiyên teşeyê weke erûz, kêş, teşeyên nezmê, qafîye hwd. rawestiyane. Di beşa çaremîn de tehlîla naveroka dîwanê, bi simbolên edebiyata klasîk, bi awayekî pir berfireh me kiriye. Herî dawî jî me di beşa pêncemîn de li ser metnê dîwanê û nusxeyên wê rawestiyane. Me metnê dîwanê ji hêla erûz û maênayê girte ber çavan û me ya herî baş li gorî xwe tespît kiriye.

Di despêkê de ez sipasiyên xwe ji bo alîkariya maddî û manewî ya şêwirmendê xwe, mamosteyê birêz Doç. Dr. Abdurrahman Adak dikim. Duyemîn, ji bo alîkariya wan ez sipasiya Alk. Doç. Dr. Hayrullah Acar, Doç. Dr. Tahîrhan Aydın, Seyid Mahmud Birîfkanî û Abdusselam Yusif dikim. Sêyemîn, bo alîkariya bi desxistina

destxeta dîwanê ya Mihemed Tahirê Birîfkî û şandina vê desxetê ez sipasiya xwe ji Îsmail Taha Şahîn re dikim. Herî dawî, ez sipasiya malbata xwe, xwuşk û birayên xwe dikim.

Serdar YILMAZ

Mêrdîn 2013

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN

TABLO

Tablo 1: Tabloya ku qalib û behrên erûzê nîşan dide.

PÊVEK

Pêvek 1: Destxeta Şêx Memdûhê Birîfkanî

Pêvek 2: Destxeta Mihemed Tahirê Birîfkanî

Pêvek 3: Şeceraya Malbata Birîfkanîyan ya ku di sala 1970 de ji hêla Şêx Memdûhê Birîfkanî ve hatiye nivîsandin

Pêvek 4: Şecereya malbatê ya ku Şêx Memdûh nivîsandiye

Pêvek 5: Şecereya malbatê ya ku Şêx Memdûh nivîsandiye

Pêvek 6: Şeceraya Malbata Birîfkanîyan ya ku ji hêla lawê Şêx Memdûh Birîfkanî Nûr Muhammed ve hatiye nivîsîn

Pêvek 7: Şecereya Terîqeta Xelwetiye

Pêvek 8: Ji mizgeft û tekiya Birîfkan du dîmen

Pêvek 9: Di sala 1907an de dîmeneke ji gundê Birîfkanê

KURTEBÊJE

Amd.	: Amadekar
Bnr.	: Binêrin
C.	: Cild
Ç.	: Çap
H.b.	: Heman berhem
Hwd.	: Her wekî din
J.	: Jimare
M.	: Mirina wî/wê
R.	: Rûpel
Wer.	: Werger
W.	: Wefat
H.	: Hicrî
M.	: Mîladî
NŞMB	: Nusxeya Şêx Memdûhê Birîfkanî
NMTB	: Nusxeya Mihemed Tahirê Birîfkanî
TDVIA	: Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi

DESTPÊK

1. ÇAVKANIYÊN TEZÊ

Em dixwazin di despêkê de berhem û xebatên li ser Şêx Şemsedîn hatine kirin li jêrê destnîşan bikin.

1. Yekemîn xebata ku li ser Şêx Şemsedîn hatiye kirin, şerha dîwana wî ku bi zimanê erebî ji hêla neviyê wî, Şêx Nûredînê Birîfkanî hatiye kirin e. Di sala 1238/1821 de bi navê “el Bidûrel Celiyye” şerha dîwanê hatiye kirin. Lê niha ev şerha ku li ber destê me, ji pênc helbestên dîwanê pêk tê.

2. Xebata duyemîn, destxeta Mihemed Tahirê Birîfkî ye. Destxeta Mihemed Tahirê Birîfkî, di mecmuêa bi navê “Tuhfetul Xullan” de ye û ev destxet ji çar helbestên dîwanê pêk tê. Tuhfetul Xullan sê beş in. Beşa yekem li ser tewsiya Şêx Seyid Mihemed Eliyê Ertuşî, xizmetkarê wî “Ehmed” nivîsandiye. Beşa duyemîn nivîskarê wê nediyar e. Beşa sêyemîn bi destxeta Mihemed Tahirê Birîfkî di sala 1327an h. (1907 m.) hatiye nivîsîn. Ev mecmuêe behsa terîqeta qadirî, zikir û şîrovekirina hinek helbestên tesewifî dike. Ev berhem, Malbatên Birîfkaniyan weke mîrat ji hev re hiştine. Ev mecmuêe aniha li cem zavayê malbata Birîfkaniyan Îsmâil Taha Şahîn e.

2. Xebata sêyemîn destxeta Şêx Memduhê Birîfkanî ye. Egerek mezin e ku Şêx Memduh, ji bo ku dîwan wînda nebe û bi tamamî nerize, dîwana heyî bi destxeta xwe nivîsandiye.

3. Xebata çaremîn ya ku derheqê Şêx Şemsedîn hatiye kirin, bi navê “Dîdarê Yar” ku ji hêla neviyê neviyê Şêx Şemsedîn, Zahid Birîfkanî hatiye kirin. Zahid Birîfkanî bi destxeta bavê xwe Memdûh Birîfkanî de dîwana Şêx Şemsedîn, bi tîpên erebî û latîni berhev kiriye. Di vê xebatê de şîroveya erebî ya dîwana Şêx Şemsedîn ku ji hêla Şêx Nûredînê Birîfkanî ve hatiye kirin cî digire. Di sala 2002yan de li Hewlêrê hatiye çap kirin.

3. Xebata pêncemîn, ji hêla nivîskar Mihemed Emîn Doskî, bi navê *Lewami`uş-Şehb fi Şerhî Dîwanî Şemseddîni`l-Exlatî el-Qutub*, bi zimanê erebî dîwana Şêx Şemsedîn şerh kiriye.

4. Navê Şêx Şemsedîn di antolojiya helbesta kurdî ya Selim Temo de derbas dibe. Bi kurtayi jiyana wî¹ û du helbestên wî² di vê antolojiyê de hatine qeyd kirin.

5. Li bakurî Kurdistan, Tehsîn Îbrahim Doskî, di sala 1998an de, di kovara Nubiharê de bi navê “Şêx Şemsedînê Exlatî”³ ku ji kurtejiyan û ji du helbestan, maqaleyek nivsandiye.

6. Agahiyên di derbarê Şêx Şemsedîn di pirtuka “Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk” ya Abdurrahman Adak de hatine nivîsandin. Di vê pirtukê de behsa wî mîna helbestvanekî sedsala 17an nasnameya wî û cihê wî yê di edebiyata kurdî de hatiye kirin.

2. DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZ

Me rêbazên amadekirina metnê dîwanê, li jêrê dane xwuya kirin.

1. Me latînzekirina metnê dîwana Şêx Şemsedîn ya ku bi desxeta Şêx Memduhê Birîfkanî, ku lawê wî Zahid Birîfkanî, weke orjînalê wê di pirtuka xwe ya binavê “Dîdarê Yar” de çap kiribû esas girt. Me alfabeya transkrîpsiyonê ya navnetewî, hîlbijart.

Elîfbêya Transkrîpsiyonê

ء	: é
ث	: æâ
ح	: Óó
ذ	: Öö
ص	: äã
ض	: Øø
ط	: Ûù
ظ	: Ôô

¹ Selim Temo, Kürt Şiir Antolojisi, Weşana Agora Kitaplığı, İstanbul 2007, c. II., r. 1464.

² Selim Temo, h.b., r. 189-190-191.

³ Tehsîn Îbrahim Doskî, Şêx Şemseddînê Exlatî, Kovara Nubihar, İstanbul 1998, h. 68-69, r. 21.

ع : è

غ : áà

ا : ā

و : ū

ش : š

2. Ji ber ku nusxeyên dîwanê pir tune ne, me nusxeya Şêx Memduhê Birîfkanî esas girt û di ciyên ku em di desxetê de ketin şuphê, me ji kitêba Mihemed Emîn Doskî “*Lewami`èu`ş-Şehb fî Şerhî Dîwanî Şemseddînî`l-Exlatî el-Qutub*”, kitêba Zahid Birîfkanî “*Dîdarê yar*” û ji desxeta Mihemed Tahirê Birîfkî sud wergirt. Me ev tev beramberî hev kirin û me li gorî xwe ya rast hîlbijart.

3. Me ji bo helbestan hejmar danîne û ji bo nîşandana malikên helbestan jî me hejmar danîne ber malikan.

4. Hinek peyvên erebî ji bo ku kêşa erûzê temam bibe bi du herfên bêdeng hatine nîşandan. Mîna: hetta, sedd, sirr. Di hinek peyvên de ji bo kêşa erûzê temam bibe kesre di şuna ع de me bi kar aniye. Mînak: yekî cew(3/10). Dîsan di hinek peyvên de ji bo kêşa erûzê temam bibe me herfeke bideng di nava kevanê de zêde kiriye. Mînak: par(i) mir.

5. Di hinek peyvên de ji bo kêşa erûzê temam bibe me hinek deng kurt kirine û bi apostrofê nîşan dane. Mînak: Çi b`kem dîsa kûve b`revim(1/6).

4. Ayet an jî îbare û beytên erebî, farisî yên ku di dîwanê de derbas dibin, me bi şêweya îtalîk nivisîne û di jêrenotan de jî me cî daye wergerên wan ên kurdî. Me zîhafên di dîwanê de bi şêweya îtalîk nivisîne.

5. Me nusxeyên dîwanê, di pêvekan de destnîşan kirine.

3. REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

Şêx Şemsedînê Exlatî, di sala 1588an de ji dayîk bûye û di sala 1674an de jî wefat kiriye.⁴ Ji bo ku pîvaneke zanistî û xebateke ilmî derkeve holê bi nerîneke hermenotîkî pêwîste salên ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye derkevin ber çavan û bi awayekî kronolojîk bi kurtî bêne zanîn. Me bi rêbazeke rasteqîne, serdema ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye û bi disiplîneke kronolojîk bûyer û encamên bûyeran, rûdan û bandora wan di vê xebatê de destnîşan kirine.

Beriya em behsa serdema ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye bikin pêwîst e ku em behsa bûyerên ku bandor li serdema wî kirine bikin.

Em ê di vê beşê de rewşa siyasî ya serdema ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye ji dawiya sedsala 16an û heya bi nivê sedsala 17an bi awayekî kurt bigirin ber çavan.

3.1. Têkiliyên Kurdan û Osmanîyan

Beriya têkiliya kurdan û dewleta Osmanî, kurd serbixwe bûne û çend dewlet ava kirine.⁵ Herwekî dewleta Eyubîyan ku desthilatdarî li gelek welatan kirîye. Hinek mîrektiyên kurdan li ser navê xwe pere çap kirine.

Ji ber ku welatê kurdan ji hêla coxrafîk ve di nava du dewletên xwedî îhtîras de maye, her daim şer û bûyerên xirab li ber deriyê kurdan qewimîne. Dewleta Osmanî û dewleta Sefewî, bi sedema ku ji hêla mezhebî muxalifê hev bûn, şerên wan ên desthilatdariyê berdewam kirine.

Sefera Îranê ya padîşahê Dewleta Osmanî Sultan Selîmê I. di 1514an de li hemberî şahê Sefewîyan kiriye, têkiliyek fermî ya dewleta Osmanî û kurdan çêkiriye. “Sefera 1514an heta sedsala 18an îşaretî despêka şerê Sultan û Şahan e.”⁶ Nêzî 200 salî welatê kurdan bûye qada şerê dewleta Osmanî û Sefewiyên Îranî. “Di navbera

⁴ Zahid Birîfkanî, Dîdarê Yar, Weşana Aras Press, Kurdistan-Erbîl 2002, r. 9-21; Mihemed Emîn Doskî, “Lewamiêu `ş-Şehb fî Şerhî Dîwanî Şemseddîni`l-Exlatî el-Qutub”, Weşanxaneya Sipîrêz, Duhok 2007, r. 10 ; Enwer Maî, El-Ekrad Fil-Behdînan, Weşanxana El Hîsan, Musil 1960, r. 82 ; Seyyid Mahmut Birîfkanî, Birîfkan Seyyidleri, Poyraz Ofset, Ankara 2011, r. 137.

⁵ Muhammed Emin Zekî Beg, Kürtler ve Kürdistan Tarihi, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2010, r. 423.

⁶ Robert Mantran, Osmanlı İmparatorluğu Tarihi, İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2011, c. I, r. 174.

salên 1514an û 151an de erdên kurdan yên ku ketine nava xaka Împaratoriya Osmanî bûne sê eyaletên nû. Dîyarbekîr⁷, Reqqa⁸ û Mûsil (başurê Kurdistana îro).”⁹

Yavuz Siltan Selîmê I. ji bo berteref kirina tehlîkeya dewleta Sefewî di sala 1514an de derketiye sefera rojhilatê. Bi zafera Çaldiranê, bandora dewleta Sefewî li ser Kurdistanê bi dawî hatiye û cihên ku kurd lê dijyan bi dewleta Osmanî ve hatine girêdan. Di zafera Çaldiranê de rola eşîretên kurdan pir mezin çê bûye. Bi taybetî Îdrîsê Bidlîsî mîna kesayetekî dîrokî derketiye holê.

Di navbera Îdrîsê Bitlîsî û Siltan Selîmê I. de Piştî şerê Çaldiranê peymanek hatiye lidarxistin. Li gorî vê peymanê;

- 1- Mîrekiyên kurdan wê di karên derve de girêdayî dewleta Osmanî bibin, lê di karên hundir de wê serbixwe bin.
- 2- Di mîrekiyê kurdan de rêvebirî ji bav wê derbasî law bibe û bi fermana padîşah bê îlan kirin.
- 3- Kurd di şeran de wê leşker bidin dewleta Osmanî.
- 4- Dewleta Osmanî wê kurdan, ji êrîşên derve biparêze.
- 5- Kurd wê bacê bidin dewleta Osmanî.¹⁰

Ji kurdan re bi vê peymanê li ser xaka Kurdistanê, despêkeke nû çêbûye. Bi peymana Îdrîsê Bitlîsî û Siltan Selîmê I. de kurd bi dewleta Osmanî ve hatine girêdan. Kurdan ji xiraban a herî baş tercîh kirine û xwe ji talana Sefewiyan parastine.

3.2. Rewşa Siyasî ya Cihên ku Nivîskar lê Jiyaye

Di sedsala 16an de mîrên kurdan bi sedsalan bi awayekî mîna qiraliyetê bûne desthilatdarê xaka xwe. Lê Sefewî û Akkoyunluya xwestine her daim hêza van mîran bişkînin.¹¹

⁷ Li bakurê Kurdistanê beşek mezin a rojavayê Gola Wanê.

⁸ Wîlayeta Tirkiye ya îro Riha û wîlayeta Surî Reqqa.

⁹ Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh, Devlet, Werger, İletişim Yayınları, İstanbul 2010, r. 174.

¹⁰ M.Emîn Zekî Beg, h.b., r. 162,167,169,171.

Polîtîkayên dewleta Osmanî û Dewleta Sefewî ya li hember kurdan ji hev cuda ne. Polîtîkaya Şah Îsmâil (Damezrînerê Dewleta Sefewî û hikimdarê yekemîn) li hember kurdan mîna polîtîkaya Uzun Hasan (Hikimdarê Akkoyunluyan) e. Herdu hikimdarên jî xwestine reîsên kurdan ji holê rakin û alîgirên xwe bikin waliyê herêmên kurdan. Dema ku bixwastana ji herema kurdan kesekî bikin rayedar jî, di şûna malbatên eslî û kevin de, dijberên xwediyê sitatuyên nizm, dianîn rayedariyê. Ji reîsên kurdan, kesên ku ev yek qebûl nekirina, bi awayekî bi xwîn binpê dikirin.¹²

Mîrekiya Bilîsê, Îmadiyê û Hekarî heta sala 1660an de di binê desthilatdariya serbixwe ya mîrên kurdan de bû. Piştî 1660an ketiye binê desthilatdariya Osmaniyan.

Şerên dijwar yê di navbera Siltanê Osmaniyan û Şahê Sefewiyan giringbûna kurdan û xaka Kurdistanê bi awayekî vekirî derxistiye meydanê. Lê mixabin çi rewşeke xirab e ku kurdan ji van bûyerên dîrokî ders nestandine û li hemberî van dewletan cepheyê yekgirtî ava nekirine.¹³

Şerê du dewletên ku çavê xwe berdabûn xaka kurdan û şerê xwe li ser xaka kurdan dikirin, ji herkesî bêtir zirar didan kurdan. Mîna ku Ehmedê Xanî, di wê demê de dibêje:

Ev Rom û ‘ Ecem bi wan hesar in
Kurmanci hemî li çar kenar in

Her du terefan qabilê Kurmanc
Bo tîrê qeda kirîne amanc

Goya ku li ser heddan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in

Ev qulzumê Rom û behrê Tacîk
Gava ku dikin xurûc û tehrîk”

Kurmanc dibin bi xwûnê mulettex
Wan jêk ve dikin mîsalê berzex¹⁴

¹¹ Martin van Bruinessen, h.b., r. 218.

¹² Martin van Bruinessen, h.b., r. 211.

¹³ M.Emîn Zekî Beg, h.b., r. 191.

¹⁴ Kadri Yıldırım, Mem û Zîn, Weşanên Awesta, İstanbul, 2010. r, 154-155.

Wateya Beytan:

Ev rom û faris, kurd dorpêç kirine û kurd kirine çar perçe. Van her du terefan (rom û faris) li hember kurdan rawestiyane û kurd kirine hedefa tîrên xwe. Kurd mîna kîlîdan in li ser tixuban û eşîretên wan jî mîna sedên sexlem in. Ev behrasorê rom û derya ya faris, çî wextê ku derketine û ketine tevgerê, kurd her car di nava xwînê de hiştine, kurd mîna berzexê ji hev veqetandine.

Rastiya vê demê meriv dikare di van beytê Ehmedê Xanî de bibîne. Kurdan pir zirar ji şerê van her du dewletan dîtine. Koçber û talan bûne. Yek ji wan koçberiyên kurdan yê wê demê, ya ber bi warên cihê ve, malbata Şêx Şemsedînê Exlatî ye.

3.3. Rewşa Wêjeya Kurdî

Şêx Şemsedînê Exlatî, di sala 1588an de çêbûye û di sala 1674an de wefat kiriye. Pêwîste em behsa rewşa wêjeya kurdî ya wê serdemê bikin.

“Piştî ku di sala 1514an dewleta Osmaniyan bi alîkariya mîrên kurdan di şerê Çaldiranê de Sefewî tîk birin ji bo kurdan serdemeke nû despêkir û mîrekiyên kurdan desthilatdariya xwe bihêztir kirin. Herwiha saziyên wan ên siyasî, dînî û perwerdeyî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan perwerde bûn û di encamê de helbestên kurdî derketin holê. Di vê serdemê de helbestvan li dora qesrên mîran kom dibûn. Helbestvanên vê serdemê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Wedaî, Selîmê Silêman û Harisê Bedlîsî li dora mîran rabûne û bûne helbestvanên wan.”¹⁵

Di sedsala 16an û heta sedsala 17an wêjeya kurdî di lutkeya xwe ya herî bilind de ye. Wêjeyanê herî bi bandor li ser pêşeroja edebiyata kurdî di vê serdemê de derketine.

“Di dawîya sedsala şazdeh û despêka sedsala hivdehan de ji aliyê Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ve di warê xezel û menzûmeyên tesewîfî de bingeh hatibû avêtin. Îcar di sedsala hivdehan de jî di hinek warên dî de bingeh hatiye avêtin. Ehmedê Xanî di warê mesnewiyên evînî û mesnewiyên dîdakdîk ên derheqê ferhengnasî û zanistên dînî de bingehê baş avêtiye û digel Mela û Feqî edebiyata kurdî ya klasîk saz kirine. Di vê sedsalê de Şêx Şemsedînê Exlatî wekî şêxekî terîqeta Xelwetî di warê helbesta tekyayê û remzî de pêşengî kiriye. Bi vî awayî Xanî û Exlatî wekî du nunerên herî

¹⁵ Abdurrehman Adak, Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, Îst. 2013, r. 176.

giring ên vê sedsalê derdikevin pêş. Ji bilî van kesan kesên mîna Remezanê Cizîrî, Axaokê Bêdarî, Laxer û Mele Remezanê Ebbasî û Eliyê Teremaxî dikari bide nîşandan.

Di sedsala hivdehan de edebiyata klasîkî kurdî zaravayê kurmancî bi her awayî damezrîna xwe temam kiriye.”¹⁶

¹⁶ Abdurrehman Adak, h.b., r. 220.

BEŞA YEKEM

JİYAN Û BERHEMÊN ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

1. JİYANA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

Şêx Şemsedîn di dawiya sedsala XVIan, di sala 1588an de ji dayik bûye¹⁷ û di dawiya sedsala XVIIan di sala 1674an de jî wefat kiriye. Di dema Şêx Şemsedîn de, nivîskarên kurd ên serdema kilasîk du kes in; Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran e. Dema ku meriv dibêje edebiyata kurdî ya kilasîk, raste rast navên her du şairan li pêş e. Mixabin, jiyana gundewariyê navê Şêx Şemsedîn, di xwe de fetisandiye. Sedemeke din ya ku heta îro Şêx Şemsedîn mîna hemdemê xwe meşhur nebûye ev e ku terîqeta wî ya Xelwetî di nava kurdan de zêde belav nebûye. Terîqeta Neqşibendî, terîqeta ku herî pir di nava kurdan de belav e. Lewra Neqşibendiyan dîwana Melayê Cizîrî di terîqeta xwe de, ji bo terbiye û talîma mirîdan pir bi kar anîne. Ji ber vê sedemê û gelek sedeman Melayê Cizîrî bandora wî di nava kurdan de pir e. Lê mixabin bandora Şêx Şemsedîn berevajî vê ye.

Şêx Şemsedînê Exlatî, helbestvan û şêxekî firarê dema xwe ye. Di vê mişextî û koçberiya xwe de, wî û malbata xwe berê xwe dane çiyayên asê û xwestine ji ber îhtîrasên rom û eceman dûr bikevin.

1.2. Navê Helbestvan û Mexlesa wî

Em ê di vê beşê de pêşî li ser nav û mexlesa Şêx Şemsedîn rawestin. Paşî em ê mijarê bikin du beş:

1. Serdema Exlatê.
2. Serdema Birîfkanê û Oremarê.

¹⁷ Zahid Birîfkanî, Dîdarê Yar, r. 9-21; Mihemed Emîn Doskî, h.b., r. 10; Enwer maî, h.b., r. 82; Seyyid Mahmut Birîfkanî, h.b, r. 137.

Navê Şêx Şemsedîn nisbet bi du aliyan ve ye. Aliyekî navê wî Exlatê û aliyê din jî nisbet bi bal Birifkanê ve ye. Navê helbestvan Şemsedîn e. Helbestvan bi navê Şêx Şemsedînê Exlatî tê naskirin. Herî dawî bi navê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî yê Birifkanî jî hatiye bi nav kirin. Yekemîn niştecihbûna wî li ser xaka Exlatê çêbûye. Bi nisbet vê bûye Şêx Şemsedînê *Exlatî*. Ji ber ku şêxê terîqetê ye nasnava “şêx” wergirtiye. Navê helbestvan ê “*qutb*” bi nisbet derece ya wî ya di tesewifê de ye. Nasnava wî “Birifkanî” piştî koçberbûna wî ya ji Exlatê sitendiye. Ji ber ku piştî ji Exlatê koçber bûye konaxa wî ya dawî Birifkan bûye. Bi tevayî, jê re Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî yê Birifkanî tê gotin. Lê navê wî yê berbelav Şêx Şemsedînê Exlatî ye.

Şêx Şemsedînê Exlatî, di helbestên xwe de du mexles bi kar anîne. Yek ji wan, navê wî yê rastîn Şemsedîn weke mexles “*Şemdîn*” bikaraniye. Navê duduyan nîsbet bi bal terîqet û nêzîkayiya wî ya tesewifî ve *Xelwetî* ye. Tenê di malîkekê de mexlesa Şemdîn bi kar aniye.

Ji derdê âema èişqê dîsan sotiye **Şemdîn**
 Ez im âamîtê teslîm ez im bende *ê* ferman
 (10/13)

Li jêrê me cî daye hejmara bikaranîna mexlesan. Me bi tamamî mexlesên ku bi kar anîne bi mînakên ji dîwanê pêşkeş kirine.

Mexlesa *Xelwetî* di seranserê dîwanê de 10 caran hatiye bi kar anîn.

Li èaşiqê te ãuhbetî ku bîxûd bûye şerbetî
 Dîsan bixwe çû **Xelwetî** ten tele lat la la
 (1/15)

Ta vi kengî muntezir bim ãebr û ùaqet min neman
 Ey hebîba way li min ku ’v **Xelwetî** yekcarî kuşt
 (2/11)

Xelwetî irşadê pîrê xwe bigir mûhkem bi dest
 Guh li xelqê qeû medêr madam ku Baqî bête lêr
 (4/5)

Hetta ku **Xelwetî** heye èaşiqê bêgavê te ye
 Her tiàerim ku lewme ye ez tibêjim j’ derdê èişq
 (5/13)

Ev **Xelwetî** er nale b’kitin lewme mekin hûn
 Rastî ku ji hîcranê hebîbê herê west im
 (6/10)

Ey **Xelwetî** ta çend çend qiflan li te kin bend bend
 Bit gêrîn li te kend kend hey hey Çelebî *qum qum*
 (7/17)

Ev **Xelwetî** bêgav tikete nale û feryad
Meèizûr bikin hûn bi kerem jê gelî yaran
(11/11)

Xelwetî èaşıqê mest im qedehe bade bi dest im
Ji dinê da ew perest im tenenaha ya hû
(12/17)

Xelwet îm û âuhbet îm û dost(i) dar
Şerbet îm û èişret îm û bûlbil î
(14/13)

Ev **Xelwetî** aza bû dîsan ji àeman rabû
Şukrane ku dil şabû ez ber'ketê Yasîne
(15/7)

Di edebiyata klasîk de helbestvanan mexlesên xwe bi piranî di malika dawî, di rîzika duyemîn de bi kar anîne. Şêx Şemsedîne Exlatî, mexlesên xwe bi piranî di malika dawî, di rîzika (rista) yekemîn de bi kar aniye.

Hetta ku **Xelwetî** heye èaşıqê bêgavê te ye
Her tiàerim ku lewme ye ez tibêjim j' derdê èişq
(5/13)

Ev **Xelwetî** er nale b'kitin lewme mekin hûn
Rastî ku ji hîcranê hebîbê herê west im
(6/10)

Ey **Xelwetî** ta çend çend qiflan li te kin bend bend
Bit gêrîn li te kend kend hey hey Çelebî *qum qum*
(7/17)

Tenê di du helbestan de di beyta dawî de, di rîzika (rista) duyemîn de bi kar aniye.

Li èaşıqê te âuhbetî ku bîxûd bûye şerbetî
Dîsan bixwe çû **Xelwetî** ten tele lat la la
(1/15)

Ta vi kengî muntezir bim ãebr û ûaqet min neman
Ey hebîba way li min ku 'v **Xelwetî** yekcarî kuşt
(2/11)

Di helbestekê de helbestvan mexlesa xwe ne di malika dawî de di malika duyemîn di rîzika yekê de bi kar aniye.

10 Ev **Xelwetî** bêgav tikete nale û feryad
Meèizûr bikin hûn bi kerem jê gelî yaran

11 Der èişqê meqamat û kemalê ku meşîbû
Şeb ta seherê sakinê her kûh û qifaran
(11/10.11)

1.3. Serdema Exlatê

1.3.1. Jidayîkbûna Wî

Navê bavê Şêx Şemsedîn, Seyid Ebdilkerîm Exlatî ye. Şêx Şemsedînê Exlatî, di sala 1588an de li navçeya Exlatê ku îro girêdayî Bilîsê ye ji dayîk bûye.¹⁸ Dema ku di sala 1603yan de şerê Osmanî û Îraniyan despê kir Şêx Şemsedîn 15 salî bû.

Exlat, di navbera çiyayê Siphon û Nemrûdê de ye û dikeve bakurê rojhilatê Gola Wanê. Navçeyeke bi bax û baxçe ye. Navê Exlatê bi gelek awayan waryantên wê hene. Urartuyan jê re gotine Halads, ermeniya gotine Şaleat, suryaniyan kelath, ereban Xilat, îraniyan û tirkên îro dibêjin Ahlat.¹⁹

Kurdan jê re Xelat û Exlat gotine. Di kurdî de “ax” xwedî wateyekê ye (bi wate ya tebeqeya li ser ruyê erdê), lat; bi wateya teht, zinar, cihên bilind e. Bi rastî jî li Exlatê, ji hêlekê ve çiyayê Siphonê bi ser bajêr ve ye û ji hêleke ve jî li jêra bajêr zozanên bi ax hene.²⁰

Şerefxan, di Şerefnameyê de, dema ku behsa Bilîsê dike weha dibêje “Bajarê Bilîsê bi rastî jî xwedî derdorek xweşik e û navçeyên wê yên xweşik hene. Yek ji van navçeyan, koka xwe berdaye dema borî û bajarekî dîrokî ku navçeya Exlatê ye. Exlat di demekê de ji bo kralê herêma Ermenîstanê paytext bûye. Di dema Kral Nuşîrevan de Exlat, di binê rêvebiriya Camasb de bûye. Hewaya Exlatê û kişwera wê pir paqij e. Bexçeyên dewlemend, ji cureyên dar û fêkiyan û bi taybetî, ji hêla çêjê û mezinbûnê sêv û mişmişên bêhempa bajar dorpêç kiribûn. Ji hêlek dinê jî wîlayeta Exlatê mizgeft, medrese, rawestgeh, xan, gelek saziyên xêrê di hundirê xwe de gihandiye hev. Bajarê Exlatê di dema Îslamiyetê de pir caran arasteyî xerabûn û wêranbûnê bûye.”²¹

Di despêkê de Siltan Celaledînê Xarzemşah, di sala 626 /1230yan de meşiyaye ser Exlatê, bi rêya hêz û çopandina xwe, di dema ku ji destên Selçuqiyên derxist, Exlat kire xerabe û li bajar komkujiyeke mezin pêk anî.²² Piştî Xarzemşahiyan Moxol hatin, bajar ji Celaledîn sitandin û di radeyekê ku aqil nikare tesewur bike, bajar xera kirin û şewitandin.

¹⁸ Zahid Birîfkanî, h.b., r. 17; Mihemed Emîn Doskî, h.b., r. 9; Enwer Maî, h.b., r. 82; Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 137.

¹⁹ Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, İstanbul, 1989, c. II. r. 19.

²⁰ Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 97.

²¹ Şeref Xan, Şerefname, Wer. Mehmet Emin Bozaslan, Deng Yayınları, İstanbul 1971, r. 284.

²² Şeref Xan, h.b., r. 285.

Exlat di sala 644/1247an de arasteyî erdhejeke mezin bû û di encama vê erdhejê de, gelek avahî xirabûn û bajêr wêran bû. Di sala 955/1549an de jî, di nivê zivistanê de, Şah Tahmasb êrîşî bajar kir, bajar û keleha bajêr dorpêç kir. Di dawiya vê êrîşê de, bajar ji destê yekîneyên parastinê, yên ku ji hêla Siltan Sileyman ve hatibûn wezîfedar kirin hate sitandin. Dawiyê Şah Tahmasb, emrê xerakirina bend û bircên bajêr da. Li ser vê fermanê, di sa'etêkê de bendên bajêr serûbin kirin. Piştî demekê Siltan Sileyman Xan dev ji bajarê kevin û bendên wê berda û li peravê Gola Wanê bajar û benedê nû ava kir. Ev jî, bû sedemê ku bi temamê bend û bajarê kevin xera bibin. Bajarê nû di warê jiyana û avahîsaziyê de, bi pêşketî.²³

Ji van agahiyên Şerefnameyê jî meriv têdgiheje ku Exlat warekî xweş e, lê herdem bûye qada şer û wêranê.

Mucadeleya 41 salî ya Sefewî û Osmanîyan bi peymana Amasyayê ya sala 1555an bi dawî bûye. Lê belê ji ber gelek sedeman û piştî îstîlaya Moxolan, bajarê Exlatê, giringiya xwe wunda kir û di hewza Gola Wanê de bû bajarê herî vemirî. Dema ku Wan bû navenda eyaletê, Exlat jî bû navçeya sencexa Adilcewazê. Di sala 1556 an de li gorî qeydên wê demê, ji bilî leşker, wezîfedar û mirovên olî, hejmara nufusa bajêr, li derdora 1600 kesî bûye. Hejmara kesên misilman yên ku bac didan 128 bûn. Ji ber ku bajar arasteyî felaketan bûye, li Exlatê ji hêla mizgeft û medreseyan ti weqif nînin.²⁴

Katip Çelebî, Exlat wekî bajarekî bi sêv û mişmişên xwe meşhur û bi bax û bexçe qeyd kiriye. Di sala 1655an de Ewliya Çelebî çûye Exlatê û bi awayekî berfireh behsa Exlatê kiriye. Behsa masiyên ku ji gola wanê dihatin girtin û firotana wan dike.²⁵

Şêx Şemsedîn her çiqas sala derketina wî ya ji Exlatê tam ne diyar be jî, li gorî ku tê texmîn kirin li dora temenê sîh saliya xwe, ji Exlatê derketiye. Yanî beramberî salên 1617/1618an de meriv dikare bibêje.

Seyid Ebdulkerîmê Exlatî di gel herdu kurên xwe (Şêx Şemsedînê Exlatî) û (Mihemed Emîn) yê ku bi navê Qutbeddîn dihate nasîn, Exlat di cîh de hiştin, ber bi eşîra Doskî ya jorî, ya bakurê Oremarê ve çûn û li wir bi cîh û war bûne. Ev mîşextbûna

²³ Şeref Xan, h.b., r. 286.

²⁴ TDVİA, h.b., c. II. r. 21.

²⁵ TDVİA, h.b., c. II. r. 22

wan ji ber wan şerên di navbera Dewleta Osmanî û Sefewiyan de dihatin kirin qewimî bû. Piraniya van li kenarê bakurê behra Wanê û devera Exlatê kiribûn qada şerên xwe.²⁶

1.3.2. Malbata Wî

*Malbata Şêx Şemsedîn binemaleke rewşenbîr û navdar e. Ew bi koka xwe digihêje Şêx Huseynê Exlatî ye navdar.*²⁷ Malbata Şêx Şemsedîn bi koka xwe digihêjin malbata Cenabê Pêxember (s). Navê bavê wî, Seyîd Ebdikerîm e. Em negihîştin agahiyên navê diya wî. Malbata Şêx Şemsedîn di dema Seyid Ehmedê Exlatî, hatine Exlatê. Seyid Ehmedê Exlatî, li Hemedanê ji dayik bûye. Ji ber ku ji herema Loristanê ya Îranê hatiye Exlatê, Exlatiyan jê re gotine “Seyid Bavê Lor”. Seyid Ehmedê Exlatî, ji bavê Seyid Emîr el Kebîr Zeynelabîdîn Elî el Hemedanî el Meşhur bî Zurdanî el Mulaqqab bî Wahîdel- Xoresanî (w.685 h.) îcaza terîqeta Suhrewerdî wergirtiye (h.682-m1283) û li ser wesiyyeta bavê xwe, di heman salê de ji bo îrşada terîqeta Suhrewerdî hatiye Exlatê.²⁸

Êdî gelek èalim û zanayên vê malbatê bi paşnavê Exlatî hatine nasîn. Çawa ku di şecera malbatê de xuya dibe 11 bavikên vê malbatê, paşnavê wan Exlatî ye. Her çiqas hinek bavikên vê malbatê, ji Exlatê koçber bûne, lê hinek bavikê vê malbatê hîn jî li Exlatê dijîn. Ev malbata ji ber ku ehlê ilmê û maneviyatê bûne, warek tenê mîna welat ji xwe re nedîtine. Li çar aliyên welatan belav bûne.²⁹

Gelek alim û edîbên kurd ên xwedî berhem ji vê malbatê derketine. Ji van alim û edîban em ê behsa çend kesên vê malbatê bikin.

Şêx Huseynê Exlatî (w. 808/1405)

Şêxê terîqetê bûye. Bi hezaran mirîdên wî hebûne. Mîrên Bilîsê bixwe mirîdên wî bûne. Şerefyanê Bilîsî, di şerefnamê de behsa wî dike. Ji ber êrîşên Tîmurleng ew û mirîdên xwe goçberî Misrê bûne. Berhemên wî :

1. Zahîretul Esmâ
2. Risaleyî Cifrî Camî
3. Husulul Mekasîd

²⁶ Zahîd Birîfkanî, h.b., r. 21; Mihemed Emîn Doskî, h.b., r. 11; Seyyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 138.

²⁷ Zahîd Birîfkanî, h.b., r. 21.

²⁸ Seyyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 350; Zahîd Birîfkanî, h.b., r.17-18; Mihemed Emîn Doskî, h.b., r. 9.

²⁹ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Seyyid Mahmut Birîfkanî, Birîfkan Seyidleri.

4. Şerhul Mesnewî³⁰

Şêx Nûredînê Birîfkanî (1790 m - 1851 m)

Li Birîfkanê ji dayik bûye. Alim, mutesewif û şair bûye. Gelek berhemên Şêx Nûredîn hene lê em ê berhemên çapbûyî ji bo nimune bidin. Nêzî 25 heb berhemên wî yê destxet hene. Em ê behsa van bi tevahî nekin. Gelek kesan li ser Şêx Nûredîn berhem nivîsandine. Nêzî 19 berhemên ku li ser Şêx Nûredîn hatine nivîsîn hene.³¹

Berhemên wî yên çapbûyî

1. El Bidurul Celîye
2. Telhîsul Hikem
3. Dîwana Helbestan a Erebî
4. Dîwana Helbestan ya Kurdî
5. Zuhretus Salîkîn³²

Şêx Memdûhê Birîfkanî (1911m - 1976 m)

Li gundê Badê ku girêdayî bajarê Duhokê hatiye dinyayê. Alim, mutesewif û helbestvanekî kurd e. Dîwana wî ya helbestan ya bi navê “*Kurdistan*” heye. Di kovarên Ronahî û Hawarê de helbestên wî weşiyane. Di sala 1973an de serokatiya “Yekîtiya Nivîskarên Kurd” kiriye.³³

Bi rastî, gelek alim, edîb û mutesewifên vê malbatê hene. Ji ber ku pirin, em nikarin bi tevahî behsa wan bikin. Me li jorê behsa çend bapîrên Şêx Şemsedîn ên girîng kirine.

Bapîrên Şêx Şemsedînê Exlatî, bi rêzê wisa ne:

1. Hz.Fatîmetûz Zehra-Keça Resulê Xwedê Hz.Muhemmed (s.)
2. Seyid Îmam Huseyîn Kərbela (w.61 h/680-81 m.)
3. Îmam eElî Zeynelâbidîn (w.94 h./712-13 m.)
4. Îmam Mu'ommed Baqir (w.114 h./732 -33 m.)
5. Îmam Caferê Sadiq(w.148 h./765-66 m.)
6. Îmam Musa Kazim (w.183 h./799-800 m.)

³⁰ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Seyyîd Mahmut Birifkanî, Birikan Seyyidleri.

³¹ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Seyyîd Mahmut Birifkanî, Birikan Seyyidleri; Mahmut Ulucan, Nûreddin Birifkanî Hayatî ve Tasavuf Görüşleri.

³² Ji bo agahiyên berfireh bnr. Seyyîd Mahmut Birifkanî, Birikan Seyyidleri; Mahmut Ulucan, Nûreddin Birifkanî Hayatî ve Tasavuf Görüşleri.

³³ Seyyîd Mahmut Birifkanî, h.b., 171,172.

7. Îmam Elî Riza (w.203 h./818-19 m.)
8. Îmam Muóemmed Cewad (w.220 h./835 m.)
9. Îmam èElî Hadî (w.254 h./868 m.)
10. Îmam Cafer Zekî el Museddeq (w.282 h./895 m.)
11. Seyid èElî el Muxtar
12. Seyid Ebdullah el Munteóîb
13. Seyid Eómedê Taqî
14. Seyid Meó mud
15. Seyid Muóemmed
16. Seyid Cafer Ebû Hars
17. Seyid èElî Ebû Mûeyyed el Meşhur bil-Weharet we Keza bî Şuèayb
18. Seyid Huseyîn Celaleddîn
19. Seyid Muóemmed Yusif Sedreddîn
20. Seyid Eyub Hemedanî
21. Seyid Ebû Yaèqub Yusufê Hemedanî (w.535 h./1140 m.)
22. Seyid Ebû Mislîm (Selîm) el èIraqî el Hemedanî (w.645 h./1247-48 m.)
23. Seyid Yusufê Hemedanî (w.610 h./1213-14 m.)
24. Seyid Salihê Hemedanî (w.650 h./1252-53 m.)
25. Seyid Emîr el Kebîr Zeynelàabîddîn èElî el hemedanî el meşhur Bî Zurdanî el Mulaqqab bî Muwaóîd el Xoresanî (w.985 h./1286-87 m.)
26. Seyid Eómed Exlatî (w.715 h./1315-16 m.)
27. Seyid Óecî Nîzameddîn Exlatî (w.751 h.-1350-51 m.)
28. Seyid Ebû Óesen èElî Exlatî (w.781 h.-1379 m.)
29. Kemalul-Milletî wed-Dîn Seyid Óuseynê Exlatî (w.808 h.-1405 m.)
30. Seyid Baba Mansurê Exlatî (w.849 h.-1445-46 m.)
31. Seyid Îsóaq Exlatî (w.890 h.-1485-86 m.)
32. Seyid Ebdilxenî Exlatî (w.926 h.-1519-20 m.)
33. Seyid Sileyman Exlatî (w.961 h.-1553-54 m.)
34. Seyid Musa Exlatî (w.995 h.-1586-87 m.)
35. Seyid èEbdilkerîm Exlatî (w. 1027 h.-1617-18 m.)
36. Seyid Şêx Şemsedînê Qûtbê Exlatî-Birîfkanî (ç.1588-w.1674) ³⁴

Ji vê şecerê jî tê fahm kirin ku Şêx Şemsedînê Exlatî, ji hêla nesebê ve digihêje binemala Pêxember (s.).

³⁴ Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 350-; Zahid Birîfkanî, h.b., r. 17-18.

Şeref Xan di Şerefname de dema ku behsa Exlatê dike, behsa yek ji bapîrên vê malbatê Seyid Huseynê Exlatî dike.

*Li Exlatê gelek welî, zana, abid û şêx mezin bûne. Yek ji van, Seyid Huseyinê Exlatî bûye. Di dema xwe de zanayekî ji hêla mijarên ilmên zahirî û batinî ve pir bi pêş ve bûye. Di ilme cîfrê de meşhurê dema xwe bûye. Bi wesîta ilme cîfrê, hayê wî ji Cengîz Xan çêbûye. Ku wê Cengîz xan derkeve û li welatê îran û turanê texribên mezin pêk bîne. Beriya ku ev felaket û xwînriştin pêkve bê, ew û malbat, eşîr û mirîden xwe welat terk kirine û çûne welatê Misrê. Seyid Huseynê Exlatî heta ku çû ser dilovaniya xwe li Misrê ma. Mezelê wî li Misrê ye.*³⁵

Di navbera Cengîz xan û Seyid Huseyinê Exlatî de demek dirêj heye. Cengîz xan di sala 1227an de miriye. Di sala 1405an de Seyid Huseyinê Exlatî wefat kiriye. Ji ber ku ne hemdemê hev in, wê mabesta Şerefxan di Şerefname de neviyên Cengîz xan bin. Jixwe Seyid Mahmudê Birîfkanî vê agahiyê bi vî awayî piştrast dike.

*Şerefxan, di Şerefname de, behsa Cengîz xan dike lê evya ne rast e. Ya rast Tîmurleng e. Tîmurleng di sala 1370an de derketiye seferên xwe û heta sala 1402an de di şerê Enqere de Siltan Yıldırım Beyazid mexlub kiriye. Jixwe Tîmurleng jî neviyê Cengîz xan e.*³⁶

Seyid Nûredînê Birîfkanî, dema ku di sala 1235an h. ji Exlatê vedigere, di îcazeta ku daye Huseyîn b. Elî Sîverekî û Seyid Elî xwe wisa teqdîm dike: Seyid Nûrî, lawê Seyid Ebdilcebbar, lawê Seyid Nûreddîn, lawê Seyid Ebîbekir, lawê Zeynelabidîn, lawê Şêx Murşit el Arîfu Bîllahî Şêx Şemsedînê Exlatî el Qutb el Xalwetî el Birîfkanî, lawê Seyid Ebdilkerîm, lawê Seyid Musa, lawê Seyid Sileyman, lawê Seyid Ebdilxenî, lawê Seyid Îshaq, lawê Seyid Baba Mensur, lawê Seyid, lawê Mewla Hasîp Nesîb el Alîmu Rebbanî wel Qutbu Samedanî Şeyxul-Murşid Hazretî Îmam Seyid Huseynê Exlatî, lawê Seyidus-Senet Îmamul-Ewhed Seyid Elî, lawê Seyid Hecî Nîzameddîn, Lawê Seyid Ehmed, lawê Seyid Îmam Zeynelabidîn Elî el-Meşhur bî Zurdanî.³⁷

³⁵ Şeref Xan, Şerefname, r. 285.

³⁶ Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 103.

³⁷ Seyid Mahmut Birîfkanî, h. b., r. 23.

Di dawiyê de jî waha diqede: Ev neseba bi şeref û silsileya mibarek li ser şecereya seyidên Exlatê hatiye nivîsîn. Evya jî Şêx Ebdilhadî Birîfkî ji Birîfkanê hatiye Exlatê bi qelesa xwe li ser şecereyan nivîsiye.³⁸

Zarokên Wî:

Pênc kurên Şêx Şemsedîn hebûn:

- 1. Seyid Musa:** (1023-1111 h.) Ew babkalê Seyidên geliyê Riman, Dergel, Beskê û deverên din e. Şêx Şemsedîn karê rêvebirina milkan û xizmata mêhvanan dabû destan.
- 2. Seyid Ebdirrehman:** (1025-1103 h.) Ew bavkalê Seyidên Etrûşê, Dêre, Navkurê û hin deverên din. Şêx Şemsedîn karê îrşad û weêzan dabû destan.
- 3. Seyid Ebdilxenî:** (1027-1121 H.) Ew bapîrê Seyidên Beroşkê û beşek ji Seyidên Nesre ye.
- 4. Seyid Zeynûl'abidîn:** (1035-1119 h.) Ew bapîrê binemala El-Nurî, Şêstnavdîn û binemala Xezalî ye. Di serdema xwe de qazî bû. Karê pêwendî û berevanî, çareser kirina girift û xwîndariyan bi rêve dibir.
- 5. Seyid Muhyeddîn:** (1039-1120 h.) Ew papîrê Seyidên binemala Mela û Seyidên 'asê û beşek ji Nesîrê, beşek ji Seyidên Birîfkan û Sernê ye. Karê pêşlimêjiyê (li pêş ceme'etê li mêj kirin) li mizgefta Birîfka dikir.³⁹

1.3.3. Terîqet û Aliyê Wî yê Tesewifî

Terîqet, di sedsala dehan derketiye. Pirên terîqetan bi navê sazumankarê xwe hatine nasîn. Terîqeta Xelwetî, navê xwe ji uzlet û xelwetê sitandiye. Xelwet, bi wateya xwe yî bêjeyî; tunebûna bi kesekî re, tê bi kar anîn. Li gorî tesewifê, bi wateya parastina ji guneh û ji bo îbadetê baş jiyanbûna li cihên xewle, tê îfade kirin.⁴⁰

Di edebiyata kurdî de, bandora terîqeta Xelwetî pir kêr e û mîna helbestvanekî Xelwetî, Şêx Şemsedîn numuna yekem e.

Di edebiyata kurdî de, bandora terîqetên tesewufî pir heye. Di berhemên despêka edebiyata klasîk de terîqeta Neqşibendî, ji hêla rêbazên manewîyatê bandorek mezin

³⁸ Seyid Mahmut Birîfkanî, h. b., r. 23; Zahid Birîfkanî, h. b., r. 22-23.

³⁹ Seyid Mahmut Birîfkanî, h. b., r. 144-145; Zahid Birîfkanî, h. b., r. 22-23; Mihemed Doskî, h. b., r. 16.

⁴⁰ Süleyman Uludağ, Halvet, DİA, İstanbul 1997, c. XV, r. 386.

kiriye. Herwekî ku tesîr li Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî kiriye. Di van serdemên dawî de gelek medhiye û mersiye li ser şêx û kesayetên vê terîqetê hatine kirin.

Elametên Neqşibendîbûna Melayê Cizîrî herçiqas weke îqrarek eşkere tunebin jî di dîwana Melayê Cizîrî de şetafat û dijberiyeye li dijî pîvanên şerê tune ye. Ji hêla rêbazên eşqa manewî di dîwana wî de hemahengiyek erkanên terîqeta Neqşibendîtiyê heye. Ji ber van taybetiyên Melayê Cizîrî meriv dikare bibêje ku bandorek terîqeta Neqşibendî lê hatiye kirin.

Bo numune ji Ehmedê Xanî:

Me dî neqşek ji neqşê Neqşibendan
Vebû qeydê di min yek bi yek ji zendan⁴¹

Bandora duyemîn ku ji hêla tesewifê li ser edebiyata kurdî bûyi bandora terîqeta Qadirî ye. Mîna, Şex Nûredîn Birîfkanî, Seyyid Qedrîyê Cizîrî û hwd.

Meyla tesewifî û terîqetê ya Şêx Şemsedîn, ji edebiyata kurdî re rengê xwedî nîrx e. Şêx Şemsedîn navê terîqeta xwe ya Xelwetî kiriye mexlesa xwe. Terîqeta Xelwetî ji terîqeta Suhrewerdî hatiye. Herwekî di despêka vê silsileyê de, gelek bapîrên Şêx Şemsedîn, Suhrewerdî bûne. Damezrênerê terîqeta Suhrewerdî, Ebu Hafs Omer Suhrewerdî (w.1236 m.) ye. Terîqeta Suhrewerdîye, li îran, efxanîstan, hindistan û li pakîstanê pir belav e. Ev terîqet li Enedolê ne belav e. Terîqeta Suhrewerdîyê, ji bilî esasên dînî, şîroveyan nake. Li ser dengeya cezbê û coşê radiweste. Terîqeta Suhrewerdî, di dema xelwetê de li ser esasê beşdarbûna qelbê ya gotina zîkrê “laîlahe îlallah” hatiye ava kirin.⁴² Egerek mezin Şêx Şemsedîn Xelîfeyê bavê xwe ye. Di terîqeta Xelwetî de zatekî mezin, heta ku naîlî dereceya murşîdîtiyê û qutbîtiyê bûye.⁴³

Damezrênerê Terîqeta Xelwetî, Omer b. Ekmeleddîn Xelwetî Lahîcî ye. (w.800 h.-1397 m.). Perwerdeya xwe li Lahîcanê (Girêdayi eyaleta Gîlan a Îranê) kiriye. Paşî li Harezmê întisabî apê xwe Kerîmuddîn Xelwetî kiriye. Piştî ku mirşîdê wî wefat kir, çûye hecê. Li ser daweta Siltan Uweys, diçe Heratê û li wira wefat dike. Kesên ku terîqeta Xelwetî, nisbetî bi bal Zahid Geylanî (w.690/1291), ku şaxê Zahidiyê qebl dîkin jî

⁴¹ Kadrî Yıldırım, Mem û Zîn, Weşanên Avesta, İstanbul 2010. r. 77.

⁴² Mustafa, Kara, Dervişin Hayatı Sofinin Kelamı, Dergah Yayınları, İstanbul 2005, r. 73-74.

⁴³ Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 140.

hene. Pîrê terîqetê, ji ber ku giringahî pir daye xelwetê, bi vê leqebê belav bûye û paşî ev nav, bûye navê wê yê taybet. Yehya Şîrvanî (w.862/1480) weke pîrê sanî (Pîrê duyemîn) yê vê terîqetê tê qebl kirin. Terîqeta Xelwetî ji Şîrvanî û piştî mirîdê wî Dede Omer Ruşenî belavbûna wê çêbûye.⁴⁴

Terîqeta Xelwetî, li Enedolê û li Rumeliyê, terîqeta herî pir xwedî tekiya ye. Taybetmendiyêke vê terîqetê jî ev e ku xwediyê gelek şaxan e. Şaxên wê ev in: Şabaniye, Cerrahiye, Uşşaqiye, Sûnbûliye, Gulşeniye, Misriye. Pirên pîrên şaxên terîqetê li Enedolê medfûn in.⁴⁵

Esasên terîqeta Xelwetiye ev in:

1. Dewamkirina zikrê laîlahe îllellah,
2. Meşxulbûna bi Esmayê Seba (heft nav),
3. Pêdekirina qelbekî paqij bûyî.⁴⁶

Dijberê Xelwetê, celwet e. Terîqeta Xelwetî hejmara dubarekirina zikrê esmaul-husna zêde kiriye. Yanî li ser navê Ellah, Hayy, Qahhar, nav in Xwedê yên din, zêde kirine.⁴⁷

Şex Şemsedîn, herwekî ku mexlesa wî ya di helbestê de, jê tê fahm kirin, ku Xelwetî ye. Di dema Dewleta Osmanîyan de terîqeta Xelwetî, ya herî belavbûyî bûye. Di dema me de jî li rojavayê Enedolê bi sed hezaran muntisibê vê terîqetê hene. Piraniya muntisibê wê tirk in. Ev terîqet li nava kurdan baş belav nebûye. Ji ber muntisibê vê terîqetê piraniya wan tirk in, mîna terîqeta tirkan hatiye nasîn.

Terîqa Xelwetî bi piranî li ser uzleta ji însanan e. Muntisibê vê terîqetê, li şikef û deverên xewle de, bi zikir û îbadatê meşxul bûne. Di tekiya Birîfkanê de heta Şêx Nûredînê Birîfkanî dewam kiriye. Piştî ku Şêx Nûredînê Birîfkanî bûye muntisibê terîqeta Qadirî, êdî tekiya Birîfkanê bûye tekiyeyêke Qadirîyan.⁴⁸

⁴⁴ Mustafa Kara, Tasavvuf ve Tarikatlar Tarihi, Dergah Yayınları, İstanbul 2011, r. 226.


⁴⁵ Mustafa Kara, h.b., r. 226.

⁴⁶ Mustafa Kara, h.b., r. 226-227.

⁴⁷ Mustafa Kara, h.c.

⁴⁸ Mihemed Emîn Doskî, h.b., r. 14.

TERÎQETA XELWETIYE Û ŞAXÊN WÊ



⁴⁹ Mustafa Kara, h. b., r. 186.

1.3.4. Perwerdeya Wî

Şêx Şemsedîn xwendina xwe ya despêkê li dibistanê Exlatê qedandiye. Pişt re weke hemû şagirtan li gelek cihan, li ber destê çend mamosteyên pispor, li ser xwendina xwe berdewam bûye. Heta ku îcazên olî û zanistî wergirtiye û bûye yek ji alimên serkêşê zemanê xwe.⁵⁰

Di serdema ku Şêx Şemsedîn tê de jiyaye, Exlat û derdora wê navendeke ilmî bûye. Herwekî ku di beşa rewşa sîyasî ya ku Şêx Şemsedîn têde jiyaye behs hatibû kirin, Exlat çî sedsala 16an û sedsala 17an û çî jî beriya van sedsalan navendeke ilmî bûye. Dema ku meriv li malbata Şêx Şemsedîn dinêre, malbatek rewşenbîr, alim û meşhurê dema xwe bûye. Şêx Şemsedîn li cem bavê xwe an li cem kesên ji malbata xwe, xwendina xwe temam kiriye. Herwiha mimkin e ku hinek an temamê xwendina xwe li cem mamosteyên biyanî jî temam kiribe.

Şêx Şemsedîn di ciwaniya xwe de bala gelek kesan kişandiye. Xwediyê manewiyatek mezin bû. Leqeba wî “*eqtab*” e. Eqtab ew kesên ku dereceya wan a welîtîyê di astekê bilind de ye. Şêx Muhemmed Beşîr Birîfkanî, di kitêba Abdussemed Sofî Muhemmed, ya bi navê “*ed-Durerul Mubîn fî Measîrî eş-Şeyx Nûreddîn el-Birîfkanî*” wisa behsa Şêx Şemsedîn kiriye:

Emê hinekî behsa Şêx Şemsedîn bikin. Lewra em nikarin tevên hal sîfetên wî binivîsînin. Lewra ew qutb, welî, abid, salîkê terîqeta Xelwetî ye. Bi cin û heywenan re dipeyivî û nesîhet li însanan dikirin. Bapîrê malbata Birîfkanîyan û çeşmeya wanî sereke bûye. Çeşmeke wisa bû ku jê çem diherikîn. Her çemê ku diherikî, ji hingiv şêrîntir û ji teyrokê (zîpik) paqijtir bû. Ji vê zuriyetê ez qesta alim, şêx û wan kesên ku insan ber bi riya başîyê dibirin dikim. Şêx Şemsedîn, qutub û fenafillah bû. Hemû tiştên pê re, kelîmetullah, nûrullah, nuvvetullah bû.

Carnan bi sivikayî radipelîkî ser darên gelek bilind. Zeîf bû. Xwarin dida çêlîkên çukan, birînên wan dipêça, yek bi yek hebên birinç û genim dixiste devên wan. Wan jî devên xwe vedikirin û dixwarin. Dawiyê emrê diya wan dikir, daku li ser wan razê. Ji ber mutewazîtiya wî, ne mîna şêx, mîna insanekî ji rêzê dihate xwuyayîn.

⁵⁰ Seyid Mahmut Birîfkanî, h. b., r. 137; Zahid Birîfkanî, h. b., r. 21.

Rojekê marekî mezin, çûye ser darek ku hêlînê çukan lê hebûn. Jixwe armanca mar ku çêlikên hêlînê daqurtîne. Çivîka mê, difire ser serê Şêx û dike fixan. Li ser fixana çivîka mê Şêx diçe ser darê û berbi mar ve diçe, ji mar re dibêje: “Ey xebîs bi izna xwedê raweste, wellahî ku tu çêlikekê jî jarh bike, ezê jî te jehr bikim. Li ser vê mar xwe tavêje xwarê û diçe. Kesên li cem Şêx hazir, li vê kerameta ku Xwedê daye Şêx şaş mabûn.”

Kesekî dema bixwaze bi Şêx Şemsedîn re îstîşare bike, beriya ku îstîşarê bike û bipeyive, Şêx jê re digot, vêya bike an jî neke.⁵¹

1.4. Serdema Oremarê û Birîfkanê

Şêx Şemsedîn û malbata xwe dema ku welatê wan arasteyî şerên Dewleta Osmanî û Sefewiyan hat, di nav sala 1615an jî 1616an de ji Exlatê koçber bûne û li herema Oremarê nêzî 4-5 salan mane. Devera ku li Oremarê mane gundekî bi navê Birîva ye.⁵²

“Koçberiya vê malbatê ya ji Exlatê di dema Seyid Huseynê Exlatî de bi koçberiya Misrê despêkiriye. Malbata Şêx Şemsedîn di dema Seyid Ehmedê Exlatî de, hatine Exlatê (w.715/1315-16). Seyid Şemsedîn û birayê xwe Muhemmed Emîn (leqeba wî Qutbedîn e) bi bavên xwe re terka Exlatê kirin, li bakurê Oremarê di nava eşîreta Doskiya jorî de bi cî bûn. Ji ber ku wê demê Exlat, di nava dewleta Osmanî û Sefewiyan de, bibû meydana şer. Eşîreta Doskî di binê desthilatdariya Siltan Îmadedînê Hekarî de bûye. Desthilatdariya wî heta sala 1049/1639an berdewam kiriye. Li bakurê Oremarê cîhên xewle, bilind û tenha hebûne. Seyid Ebdilekrîm û lawê wî Seyid Mihemed Emîn li wira wefat kirine. Pişt re Şêx Şemsedîn û biraziyê wî Seyid Sen’an, bi koçerên Eşîreta Etrûşî re koç kirine. Di sala 1030/1620an Eşîreta Etrûşî di dema Osmaniyan de car caran heta herema Mizuriyan diçû. Şêx Şemsedîn û biraziyê xwe dighêjin Amediyê. Eşîreta Etrûşîyan, di wê demê de, ji bo ku bi rehetî tevbigerin, çune cem Hakimê Amêdiyê lawê Mîr qubad Beg Sîdî Xan. Di wî wextî de, dema ku Sidî Xan Şêx Şemsedîn dibîne, dikeve bin bandora wî. Sidî Xan ji Şêx Şemsedîn xwestiye ku li wira niştecîh bibe û ilim û tesewifê belav bike. Paşî heft gundên bi navê, Birîfkan, Gelîrîman, Bazîdk, Bêgeh, Rîqava, Aluqa û Tildêbê dide Şêx Şemsedîn. Şêx

⁵¹ Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 140.

⁵² Seyid Mahmut Birîfkanî, h.c.

Şemsedîn, daxwaziyê qebûl dike û li gundê Birîfkanê bi cîh û war dibe. Paşî tekyê ava dike û dest bi îrşada terîqeta Xelwetî-Suhrewerdî dike. Ev îrşad heta sala wefata wî 1085/1674an berdewam kiriye. Şêx Şemsedîn, yekemîn kes e ku li Birîfkanê tekyaya terîqeta Xelwetî ava kiriye. Piştî wefata wî, zarokên wî ev îrşad devam kirine. Heta 200 salî bê navber berdewam bûye. Di dema ku Seyid Nûredînê Birîfkanî terîqeta Qadîrî hîlbijart, êdî ev tekiye mîna tekiya Qadiriyan, maneviyata xwe dewam kiriye.”⁵³

“Birîfkan, li başûrê Kurdistanê gundekî giradayî bajarê Duhokê ye. Dikeve rojavayê Duhokê û bakurê Rojhilatê Musilê. Ev gund ji gundên Eşîreta Mizûriya ye.”⁵⁴

“Di çavkaniyên kurdî yên ku bi alfebeya latînî hatine nivîsîn de bêjeya Birîfkanê bi awayê; Birîfka, Birîfkan, Brîfkan hatiye nivîsîn. Di çavkaniyên ku bi tirkî hatîne nivîsîn de; Berîfkan, Berifkan, Bîrifka an jî Bîrifkan hatiye nivîsandin. Di çavkaniyên erebî, farîsî û kurdî de, bêjeya Birîfkan, bi elifbeya erebî wisa hatiye nivîsandin: بَرِفْكَان , بَرِفْكَا , بَرِفْكَا⁵⁵

Seyid Mahmut Birîfkanî, bêjeya Birîfkan bi vî şeklî îzah dike;

1. Bi kurdî, ji gihandina du peyvên; *pirît (pir) û kanî* pêk hatiye. Yanî kaniyên pir.
2. Bi kurdî, ji gihandina du peyvên; *berfî (berf) û kanî* pêk hatiye. Yanî kaniya mîna berfê sar.
3. Bi kurdî ji gihandina du peyvên; *bîr û kanî* pêk hatiye. Di nava demê de, ku ev gotin wergeriyane Birîfkanî.”⁵⁶

Piştî niştecîhbûna Şêx Şemsedîn, Birîfkan bûye navenda malbatê. Êdî malbat mîna malbata Seyidê Birîfkanîyan an Birîfkanî hatine naskirin. Şêx Nûredînê Birîfkanî, di şerha helbesta Şêx Şemsedîn ya bi navê “uzlet tikirim” de wisa behsa kalê xwe Şex Şemsedîn dike:

Kalê min (Şêx Şemsedînê Exlatî), qudîse siruhû, bi piranî li çiyayên gundê me dikete uzletê. Ji ber ku gundê me, bilind, ferah, fireh û vekirî bû. Çiya bilind û ji hev dur

⁵³Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 22; Zahid Birîfkanî, h.b., r. 21.

⁵⁴Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 23; Zahid Birîfkanî, h.b., r. 21- 22.

⁵⁵Mahmut Ulucan, h.b., r.15.

⁵⁶Seyid Mahmut Birîfkanî, Birîfkan Seyitleri, r. 22-23.

*bûn. Ji ber vêya ti çiya derdora xwe nedigirt û niştecihên xwe aciz nedikirin. Niştecihên wir, di demsala havînê de pir kêfxweş bûn. Di nîvê şevê de dengê terennuma çukan dihate bihîstin.*⁵⁷

1.4.1. Wefata Wî

Piraniya temenê Şêx Şemsedîn, li Birîfkan derbasbûye. Li Exlatê 28-29 sal, li Oremarê 4-5 sal û li Birîfkayê 52 sal emrê xwe derbas kiriye. Şêx Şemsedîn, di sala 1674an de, di 86 saliya xwe de, li başûrê Kurdistanê li gundê Birîfkan ku girêdayi bajarê Dihokê ye, wefat kiriye û li wê derê hatiye veşartin.⁵⁸

⁵⁷Nûreddîn Birîfkanî, h.b., r. 306-307; Zahid Birîfkanî, h.b., r. 89.

⁵⁸Seyid Mahmut Birîfkanî, h.b., r. 138-139; Zahid Birîfkanî, h.b., r. 22.

2. BERHEMÊN ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

Ji bilî dîwana wî ya kurmacî, ti berhemên wî di destên me de nînin. Lê zana û edîbekî mîna Şêx Şemsedîn, egereke mezin e ku hinek berhemên wî din jî hebin. Piraniya berhemên wî wunda bûne. Li gorî ku Zahid Birîfkanî di pirtuka xwe ya bi navê “Dîdarê Yar” de dibêje, “*Dîwaneke mezin ya Şêx Şemsedîn ya helbestan bi zimanê erebî jî heye. Herwiha gelek pirtûk û berhem nivîsîne. Cihê daxê ye ku gelek ji wan pûç û pelaçe bûne. Ew berhem jî heta niha nehatine çap kirin.*”⁵⁹

“Em li ti berhemên wî yê din rast nehatin. Herçende ku wî pir pirtuk nivîsîne. Herwiha me dizanî ku dîwaneke wî ya taybet bi zimanê kurdî heye. Desxetek vê dîwanê li cem neviyê wî Şêx Memdûh Birîfkanî maye.”⁶⁰

2.1. Dîwana Kurdî

Dîwana Şêx Şemsedîn ya ku heyî ji 16 helbestan pêk tê. 2 helbest mîna metle’ a helbestan in, eger meriv van nehesibîne wê demê hejmara helbesta 14 dimînin. Piraniya helbestên dîwanê wî wî ne. Desxeta Şêx Şemsedîn bi xwe nexwiyaye. Dibe ku dîwana bi desxeta Şêx Şemsedîn li ber tunebûnê bûye. Neviyê Şêx Şemsedîn, Şêx Memdûhê Birîfkanî dîwana wî bi qasî ku karibe xelas bike nusxeyek wê nivîsandiye. Egerek ev e; ji ber ku nusxeya Şêx Memdûh jî kême e. Egera diduyan; dibe ku Şêx Memdûh nusxeya dîwanê bi temamî nivîsandîbe, paşî ev dîwan li ber lingan çûbe. Em hêvî dikin ku rojekê wê ev dîwan li arşîvên Musil, Bexda, yan jî li arşîvên Osmaniyan bê dîtin.

Ya herî girîng jî bo edebiyata kurdî ku di wê demê de, helbestvanekî helbest nivîsandiye. Her çiqas dîwana wî kême jî, agahiyên girîng di derbareyî edebiyata kurdî de dide me. Em ê di tehlîla dîwanê de bi berfirehî li ser naveroka dîwanê rawestin.

⁵⁹ Zahid Birîfkanî, h.b., r. 10.

⁶⁰ Zahid Birîfkanî, h.b., r. 26 .

BEŞA DUYEM

KESAYETIYA EDEBÎ YA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ

1. ZIMANÊ WÎ

Zimanê dîwanê kê m zêde weke zimanê dîwanên klasîk e. Di dîwanê de gelek peyvên erebî û farisî hatine bi kar anîn. Ji hêla zimanê kurdî ve helbestvan bihêz e. Gotinên kurdî yê hevpar pir bi kar anîne. Zimanê xwezayê û unsûrên heywanî pir bi kar anîne. Dubare kirina dengan, peyvan, dengên xwezayê û dengvedana dengan di dîwanê de pir berbiçav in. Di edebiyata kurdî de ev taybetmendî bi piranî xasê Şêx Şemsedîn e. Di dîwanê de mînakên vê ûslûba wî pir in, lê em ê li vir tenê çend mînakên bidin.

èUzlet tikirim daim dîsan(i) wekû kungir
Her wê ki hebit kavilek ez lê tixûnim **qû qû**

Geh geh wekû hudhud ez menôûrê Suleyman im
Geh geh li rûyê ãeħra bi fîàan dibêjim **pû pû**

Dîtîm ki li ser darê ba zeban fesîħ kapil
Tigirî ki tibin àafil ev xelq(i) hemû **kû kû**
(13/1.2.3)
Sotim ji àemê **mû mû** ta çendî biçim **sû sû**
Ey dost(i) were **zû zû** hey hey Çelebî **qum qum**

Meħbûb ki vekat **xeh xeh** ti dil im kir ha **reh reh**
Dîsan xweş im ez **weh weh** hey hey Çelebî **qum qum**

Hûn lêm negirin **zeq zeq** yêkcar(î) bûyim **şeq şeq**
Óeq maye tinê **Óeq Óeq** hey hey Çelebî **qum qum**
(7/2.3.4)

Di diwanê de sentaks û qalibên zimanê farisî li pêş e. Ev jî dide nîşandan ku haya wî ji edebiyata farisî heye û di bin bandora edebiyata farisî de maye. Şêx Şemsedîn, di helbesta xwe de qalibin serbixwe ava kirine. Hinek rêbazên tesewiffî di dawiya helbestan de bi ahengiya dubarekirina hevokan û peyvan disiplîne kiriye. Mînak;

Mest û xerab im ji meyê **ten tele lat la la**
Dibêjim ez ya lebeyê **ten tele lat la la**
(1/1)

Ez ku mestê meyê êişq im **tenenaha ya hû**
Miâr û Beâdad û Dîmeşq im **tenenaha ya hû**
(12/1)

Şêx Şemsedîn, di helbestên xwe de di malikeke helbestê de, carnan di rêzeke helbestê de peyvên ji hêla wateyê dijber bi kar anîne. Gelek ramanên xwe bi dijberiya peyvan îfade kiriye. Ev rêbaz di helbestên Şêx Şemsedîn de pir hatiye bi kar anîn. Îfade kirina bi peyvên dijber rêbazeke pir balkêş e û ev rêbaz taybetmendiyeke Şêx Şemsedîn e. Me ev dijberiya peyvan bi îtalîk li jêr nîşan daye. Mînak:

Ev suxenê ti min dur in ez çî bikim ku nakirin
Ôahir û batin im pir in wey ku bibêm wey ku nebêm
(8/5)

Ez(i) bêcah û meqam im xadim û şah û àulam im
Meşriq û nûr û ôelam im tenenaha ya hû
(12/6)

Muşkil û hellê beyan im xefî û sirrê nihan im
Nadirê ehlê zeman im tenenaha ya hû
(12/10)

Èenber û misk û bixûr im âihuf û lewh û Zebûr im
Agir û av im û nûr im tenenaha ya hû
(12/12)

Turk û zeng im şox û şeng im bulbil î
Pir bireng im mest û deng im bulbi î
(14/1)

1.1. Devoka Exlatê

Devoka Exlatê girêdayî devoka Serhedê ye. Devoka Serhedê di nava xwe de ne yekgirtî ye. Heremên nêzî çiyayê û deverên asê ne mîna navendê ne. Herwekî ku li Serhedê kurdên bajarî, ji kurdên çiyayî re dibêjin “kurdên mamok”.⁶¹ Devoka kurdên çiyayî û kurdên bajarî ne mîna hev in.

Herema ser bi Tetwanê heta çiya û hêla colemergê ji vir jî heta bi Behdînan nêzî hev in. Li navenda Exlatê perçeyek ji kurdên ku vê dawiyê ji ber hinek sedemên cuda ji deverên çiyayî hatine navendê hene. Bi devoka kurdên çiyayî diaxifin. Yanî meriv dikare bibêje ku Serhedî aşînayê devoka Behdînan in.

⁶¹ Agahiyên Devkî.

Gelek helbestvanên helbesta klasîk, di bin bandora devoka Behdînî û Botan de mane. Şêx Şemsedîn heya 28-29 salîya xwe li Exlatê bûye. Kesekî heta 29 salî, hînbûna xwe yî ziman, kêr zêde tamam dike. Şêx Şemsedîn bingeha zimanê xwe li Serhedê sitandiye. Di dîwana Şêx Şemsedîn de taybetmendiyên devoka Serhedê hene.

1.2. Devoka Behdînan

Di edebiyata klasîk ya kurdî de berhemên di asta herî baş de hatine dayîn bi devoka Botan û Behdînî hatine nivîsandin. Mîna Melayê Cizîrî ku dîwana xwe bi devoka Botan, ya ser bi devoka Behdînî nivîsandiye. Ehmedê Xanî jî, her çiqas Serhedî ye, devoka berhemên wî bi ser devoka Botan ve diçe. Meriv dikare vê bandorê weke bandora Melayê Cizîrî bibîne. Lê ev bandor an taybetmendî seranser di zimanê Şêx Şemsedîn de nîne. Şêx Şemsedîn, di dîwana xwe de, devoka Serhedê û devoka Behdînî bi kar aniye.

Piştî koçberbûna Şêx Şemsedîn ya ber bi Oremarê û Birîfka ve, di dîwanê de tê xwuyayin ku Şêx Şemsedîn devoka Behdînî, di helbestên xwe de bi kar aniye. Heta ku hinek peyvên kurdî li gorî devoka behdînan di helbestên xwe de nivîsandine. Mînak: peyva “bêsim” di helbestê de “bêşim” hatiye nivîsîn.

Ew kerê vervî û rehwar *bêsim* û bênal û bizmar
Jê hesam ev salî yêkcar ku kerê min par(i) mir
(3/3)

Bo nimûne ji bo devoka Behdînî em dikarin peyvên wekî; hebit (13/1), evro (11/1), jêkve (11/1), disujîtin (11/2), nuke (11/2), ez keftime (11/8), navête (1/5) nîşan bidin.

Şêx Şemsedîn di dîwana xwe de, devoka niştecîhên Oremarê û Behdînan bi kar aniye. Li gorî ku me lêkolîn kir aniha jî, ku di şuna dengê *-d* yê de, dengê *-t* yê bi kar tînin. Ev devok li Colemergê, hinek cîhên Behdînan û li Oremarê tê bi kar anîn.

Bo nimûne :

Geh li min aib *tibû* ew geh li bal im bû yekî cew → tibû (dibû)
Nû hesa im xweş *tikim* xew ku kerê min par(i) mir → tikim (dikim)
(3/10)

Taybetmendiyeke zimanê Şêx Şemsedîn, du alî heye. Di beytekê de, du devok bi kar anîne. Devoka Behdînan û Serhedê bi hev re bi kar anîne. Lê ev taybetî ne ya Şêx Şemsedîn tenê ye. Ehmedê Xanî jî bi gelek devokên zimanê kurdî berhemên xwe nivîsandine. Devoka Serhedê devokeke dewlemend e û ji her devokan zimanê kurdî di xwe de dihewîne. Mînak:

èAlem eger çî qal dikin ez dibêjim ji derdê èişq → dikin- Serhedî
 Qetl im eger hêlal tikin ez dibêjim ji derdê èişq → tikin(dikin)- Behdînî
 (5/1)

Meriv dikare wek encam bibêje ku Şêx Şemsedînê Exlatî di dîwana xwe de devoka Serhedê, Behdînan û hinek peyvên soranî bi kar anîne.

1.3. Peyvên Soranî

Şêx Şemsedîn, di helbestên xwe de peyvên soranî jî bi kar anîne. Ev jî dide xwuya kirin ku têkiliya wî û zaravayê Soranî heye. Me peyvên soranî di nava malikan de bi îtalîk nivîsandine. Mînak:

Ew kerê rehwar û vervî beûir û bêdest û kûvî
 Jêm nema yêkcar(i) hîvî ku kerê min par(i) mir
 (3/2)

Ta vi kengî muntezir bim ãebr û ûaqet min neman
 Ey hebîba way li min ku 'v **Xelwetîf** yekcarî kuşt
 (2/11)

1.4. Peyvên Kurdî yên Resen

Di dîwana Şêx Şemsedîn de gelek peyvên kurdî yên taybet û resen hene.

Kul, rûvî, rext, pîrejin, bêguman, têr, xwîn, hêstir, pişt bi pişt, vejîn, ba, dîsa, cerg, hinav, bêdil, rê, perat, aram, serxoş, lez, lal, leşker, dilgeş, bêpa, bêdeng, bênav, kişwer, derya, ser, kûvî, yekser, cîhan, car car, bêgav, şaran, xak, ker, par, keştî, dil, yar, feryad, deng, pereng, pêt, kavilek, malxerab, pak, mişk, kadîn, pakij (paqij), birîn, genim, kevîn, siwar, tazî û hwd.

1.5. Biwêjên ku di Dîwanê de Hatine bi Kar Anîn

Dîwana Şêx Şemsedîn, ji hêla biwêjan ve li gorî hejmara helbestan, pir dewlemend e. Emê li jêrê biwêjên ku Şêx Şemsedîn di dîwana xwe de bi kar anîne li gorî rêzkirina helbestan bidin nîşandan:

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la
Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la
(1/1)

Ti meyxaneyê êişqê serê xwe te kir û nê
Vexwu badeyê ãafî were helqeyê rindan
(10/9)

*Em ê li jêrê bi awayekî berfireh cîh
bidin listeya biwêjan.*

1. Bi rengê kûhê Qaf (1/2)
2. ÊAşiqê dîwane (1/3)
3. Mûqîmê meyxane (1/3)
4. Sohtî wekû perwane (1/3)
5. Xerabê bavzer (1/4)
6. Sotiyê biryan ceger (1/4)
7. ãebir û qerar (1/5)
8. Feryad û hewar(1/5)
9. Suhtim ji ser óeta qedem(1/5)
10. Havêt qefa(1/7)
11. Kuke min zewq û ãefa (1/7)
12. Êymin im ez ji qal û qîl (1/8)
13. Êişqe delîl(1/8)
14. Mûbah bûyî li min şerab(1/9)
15. Ava bûyî dilê xerab (1/9)
16. Êişqê te kirdim ez kebab (1/9)
17. Waleh û dîn û mest im (1/10)
18. Mestê meyê elest (1/10)
19. Rind qedeş ti dest (1/10)
20. ' Eta yim û mest û fereş (1/11)
21. Waleh mest im û cinûn(1/12)
22. Yekê bêçûn (1/12)
23. Cûstî menî (1/13)
24. Dêrdê êişqê (2/1)
25. Rojê ezel kir sernivişt (2/1)

26. Dilê kul sûz û derdî (2/1)
27. Dilê kul helat(2/3)
28. Qerîn bi qerîn(2/3)
29. Pişt bi pişt(2/3)
30. Dilê xerab(2/4)
31. Dil ku hingavt (2/4)
- 32 . Ûalibê dîdarê (2/5)
33. Cust û çû (2/5)
34. Aşnayê derdê dost(2/5)
35. Leşkerê eşqê (2/7)
36. Şehrîstanê dil(2/7)
37. Sûz derdê (2/8)
38. Mehwî nabîtin (2/10)
39. Dilê xerab im (2/10)
40. Nema yêkcar hîvî (3/2)
- 41 . âemgîn tixwazî(3/12)
42. Lehû û bazî (3/12)
43. Derdê serê min (3/13)
44. Derdirêj im (3/14)
45. Ehlê meîina (3/15)
46. Rumûzê cawidanî (3/16)
47. Lali serrafî (4/2)
48. Qelbê de'el (4/2)
49. Şahê weqt (4/3)
50. Şexâê bîrsî (4/3)
51. Mûhkem bi dest (4/5)
52. Derdê eşq(5/1)
53. Sîrrê xefî (5/3)

54. Nu'ûqê eşqê (5/5)
- 55 . eşqê mecazî (5/6)
56. Dêwê recîmî (5/8)
57. Mestê ti wecd û hal (5/9)
58. Bayê rû û wî'âl (5/9)

59. Sot cerg û hinav (5/12)
60. Balî heq (5/11)
61. Waleh û mest (6/1)
62. Xumxaneyê êişqê (6/2)
63. Kullî èelayîq (6/3)
64. Şehmarê àemê êişqê (6/4)
65. Feryad û feàan (6/4)
66. Mecrûh bigest (6/4)
67. Dilê sohtiyê bêçare (6/5)
68. Meheq û mehuest im(6/5)
69. Bêçareyê hest (6/6)
70. Dil berde gîyan suhtî (6/6)
71. Bêsekne û aram(6/7)
72. Mest û cinûn (6/8)
73. Roja elest (6/8)
74. Şefqetê îhsanê (6/9)
75. Hicranê hebîbî (6/10)
76. Sotim ji àemê mû mû (7/2)
77. Dil birêşte (7/7)
78. Munşeqqe dil (7/14)
79. Quûbê àeman û tehel (8/2)
80. Derdê àemê dilest (8/3)
81. Seraser ateş (8/4)
82. . èaşiqê rûyê dilgeş (8/4)
83. Mest û xerab û serxweş (8/4)
84. Maniêê xelqê nekbetê (8/6)
85. Qiymetê (8/6)
86. Bêser û bêpa (9/1)

87. Bênav im û bêdeng im bêear im û riswa (9/2)
88. Zihî durr û meèanî (10/1)
89. Zihî genc (10/1)
90. Zihî kan(10/1)
91. Zihî luûfê îlahî (10/1)

92. Zihî şefqetê îhsan (10/1)
93. Zihî bade (10/2)
94. Zihî cam (10/2)
95. Zihî şerbetê âafî (10/2)
96. Zihî xelwetê xalî (10/2)
97. Zihî saqiyê mestan(10/2)
98. Rindê xerabat (10/3)
99. Meyê eşqa celalî(10/4)
100. Gunbedê gerdan (10/5)
101. Nûrê mest (10/6)
102. Camê elest (10/6)
103. Waleh û heyran(10/6)
104. Mulazîm bixurûş (10/7)
105. Zihî èeynî èecaib (10/8)
106. Camê meyê eşqê xumar (10/8)
107. Qatilê nefse (10/8)
108. Timeyxaneyê eşqê (10/9)
109. helqeyê rindan(10/9)
110. Xumar im ji şerabê (10/11)
111. Zihî naûiqê nuûq (10/11)
112. Sîrrê èecîb (10/12)
113. Zihî sîrrê nihanî (10/12)
114. Zihî defterê eèiyan(10/12)
115. Derdê àema eşqê (10/13)
116. äamîtê teslîm (10/ 13)
117. Bende' ê ferman (10/13)
118. Dilê suhtî kebabest (11/2)

119. Newhe û zarê (11/3)
120. Bêgav tixurûş (11/3)
121. Dîwane tîgirîm (11/5)
122. Bêser û saman (11/5)
123. Êrvê û wêrve (11/6)
124. Deyayê àemê (11/8)

125. Eḥwalê dilê suhtîyê (11/9)
126. Bêgav tikete (11/10)
127. Meèizûr bikirin (11/10)
128. Êişqê meqamat û kemalê (11/11)
129. Şeb ta seḥerê (11/11)
130. Sakinê her kûh û qifaran(11/11)
131. Xeşyet û êişqan(11/12)
132. Mestê meyê êişq (12/1)
133. Teşne' ê ava wiãal (12/1)
134. Áemê êişqê (12/1)
135. Mestê meyê êişq (12/1)
136. Teşne' ê ava wiãal (12/1)
137. ÊAşiqê heyîyê Celal (12/2)
138. Cerge kebab (12/3)
139. Mest û xerab (12/3)
140. Cerge kebab (12/3)
141. Walleh û kas (12/5)
142. Şox û şeng (12/5)
143. Serbiser pêt û pereng (12/5)
144. Bêcah û meqam (12/6)
145. Xadim û şah û àulam (12/6)
146. Meşriq û nûr û ôelam (12/6)
147. Meôherê zat û ãîfat (12/7)
148. Meèdenê èeynê ḥeyat (12/7)
149. Keştî û Nûḥ û necat (12/7)
150. Hadiyê di rê û delîl (12/8)
151. Nemek û xwan û xelîl (12/8)
152. Benîyê xaãê Celîl (12/8)
153. Äaḥîbê qelbê selîm (12/9)
154. Dujminê dêwê recîm(12/9)
155. Cebelê Ûûr û kelîm(12/9)
156. Muşkil û ḥelîl beyan(12/10)

157. Xefî û sîrrê nihan (12/10)
158. Nadirê ehlê zeman(12/10)
159 . äihûf u lewh û Zebûr(12/12)
160. Ji meyhê èîşqê xumar (12/13)
161. Nema ãebir û qerar (12/13)
162 . èAşiqê weãletê yar (12/13)
163. Ji àemê èîşqê zebûn (12/14)
164. Waleh û mest û cinûn (12/14)
165 . èAşiqê heyyê bêçûn (12/14)
166. Bilbilê èaşiqê werd (12/15)
167. Gelekê bê xwab û xwurd (12/15)
168. Ji àemê dostê bi derd (12/15)
169 . äamit û lalê û xemûş (12/16)
170. Menôûrê Suleyman (13/2)
171. Rûyê ãeħra bi fîaan (13/2)
172. Ba zebanê fesîħ kapil (13/3)
173. Helak bûn (16/2)

1.6. Unsûrên Erebî, Farisî û Tirkî

Edebiyata klasîk a rojhilata navîn ji zimanên cur bi cur pêk tê. Zimanekî mîna erebî dewlemend, gelek bêje ji zimanê farisî sitandine. Zimanê farisî jî, bandorek mezin ji zimanê erebî wergirtiye. Dikare bê gotin ku zimanên rojhilata navîn tevan ji hev bandor girtine. Bi taybetî zimanên ku ji malbatekê ne, ev bandor zêde li hev kirine. Ji ber ku kurdî û farisî ji yek malbatê ne û ji hêla fonetîka ziman ve nêzî hev in, helbestvanên kurd û faris zimanên kurdî û farisî pir bi kar anîne. Şêx Şemsedîn qalib û sentaksê zimanê farisî di helbestên xwe de pir bi kar aniye. Ji helbestên wî tê fahm kirin ku Şêx Şemsedîn zimanê farisiya kevin baş dizane. Jixwe farisî li medreseyên Kurdistanê dihate xwendin. Heta dema îro jî li Serhedê di medreseyên mîna Oxîn (Bilîs) û Sêrtê de, farisî weke dersekê tê xwendinê. Şêx Şemsedîn jî teqez di medreseyên Kurdistanê de hîne zimanê farisî bûye. Li jêrê em ê cîh bidin van unsûrên zimanên ku di dîwanê de hatine bi kar anîn.

1.6.1. Unsûrên Erebî

Şêx Şemsedîn di dîwana xwe de erebî li gorî meşreb û dema xwe baş bi kar aniye. Di dîwana xwe de ji ayetan îqtîbas kiriye û biwêjên erebî bi kar anîne. Em di tehlîla dîwanê de bi berfirehî li ser rawestînin. Em ê li jêrê çend mînakên bidin.

Qatilê nefse (Kujerê nefse) (10/8)

Meoherê zat û aîfat (12/7)

Cebelê nûr û kelîm (Çiyayê nûr û axaftinê) (12/9)

1.6.2. Unsûrên Farisî

Şêx Şemsedîn di helbestên xwe de gotinên farisî gelek bi kar anîne. Farisiya ku hatiye bi kar anîn farisiya kevin e.

Bo nimûne:

a. *Ten*: Ten-Cesed

b. *Tele*: Xefk-Fex

1. Mest û xerab im ji meyê *ten tele* lat la la (1/1)

- c. *Guzaf*: Peyvê ne li cî.
 2. Nabêjim ez evê *guzaf* ten tele lat la la (1/2)
- d. *Dîwane*: Dîn
 3. èAşiqê *dîwane* yim ez muqîmê meyxane yim ez (1/3)
- e. *Bêçûn*: Bêhempa.
 4. èAşiq im ez li yekê *bêçûn* ten tele lat la la (1/12)
- f. *Cûstîmenî*: Gerandina bi du tişteki.
 5. Ji nav em *cûstîmenî* ten tele lat la la (1/13)

Şêx Şemsedîn, di dîwana xwe de mîna hemu nivîskarên klasîk yên dema xwe, farisî baş bi kar aniyê. Jixwe ev taybetiya edebiyata klasîk e. Me li jorê çend mînakên di nava beytan de dane nîşandan. Em ê li jêrê bikaranîna peyvên farisî bidin nîşandan.

<i>sûz</i> [şewat] (2/2),	<i>custûcû</i> [behs u teftiş] (2/5)
<i>xerabatest</i> [meyxane] (2/5)	<i>sernivişt</i> [çarenuş] (2/1)
<i>efgar</i> [derd] (3/8)	<i>bazî</i> [listik] (3/12)
<i>laf</i> [peyv] (3/15)	<i>nadan</i> [cahil] (3/15)
<i>cawidanî</i> [daîmî],	<i>asa</i> [weke-mîna] (4/4)
<i>bîdar</i> [şiyar] (5/4)	<i>dêwê</i> [şeytan] (5/8)
<i>xumxane</i> [mala ku şerabê lê çedikin](6/2)	<i>berde</i> [dil-esîr](6/6)
<i>şeb</i> [şev](7/1)	<i>dîdar</i> [dîtin](7/14)
<i>ateş</i> [agir](8/4)	<i>suxen</i> [peyv](8/5)
<i>hewes</i> [rexbet](8/3)	<i>zihî</i> [xweşik-baş](10/1)
<i>bade</i> [şerab](10/2)	<i>xurûş</i> [kêf-telaş](10/7)
<i>xar</i> [sitrî] (11/1)	<i>kişwer</i> [Iqlîm] (10/8)
<i>kungir</i> [kund](11/6)	<i>kûh</i> [çiya] (11/11)
<i>teşne</i> [tî](12/11)	<i>nemek</i> [xwê](12/8)
<i>xwan</i> [sifre]12/8)	<i>zebûn</i> [bêkêr](12/14)
<i>bêxwab</i> [bêxew](12/15)	<i>derdemend</i> [biderd](14/3)
<i>xemûş</i> [bêdeng](12/15)	<i>aftab</i> [roj](14/10)
<i>zeban</i> [ziman](13/3)	<i>pejmûr</i> [jihevketî](15/1)
<i>bîş</i> [pir](14/9)	<i>manendî</i> [mîna-weke](4/1)
<i>raz</i> [sir](14/12)	
<i>erzîn</i> [nebatat](15/5)	

1.6.3. Unsûrên Tirkî

Şêx Şemsedîn, di bikaranîna ziman de meyla wî ya zimanê tirkî di dîwanê de çênebûye. Mihemed Emîn Doskî di şerha dîwana Şêx Şemsedîn de, her çiqas çend peyv weke tirkî dîtîbin jî, lê li gorî me di dîwanê de peyvên tirkî nînin.

Mînak 1.

Mihemed Emîn Doskî, peyva; “*E’tayim*” bi wateya; “*ata*” (*mezin-atabeylik*) şîrove kiriye. Em di vê baweriyê de ne ku ev peyva bi wateya “*ez daim*” de ye. Lewra me herwekî ku berê jî anî ziman, ku hinek deng di hinek peyvan de ketine û hinek deng li gorî devoka hereman, hatine bi kar anîn. Di peyva “*E’tayim*” de, dengê *-z’ê* ketiye û di şuna dengê *-d’ê* de dengê *-t’ê* hatiye bikaranîn. Ya rast “*ez daim*” e. Meriv dikare ji bo vê gelek mînakan bide.

Şukrê Óeq daim <i>tikim</i> ez ku kerê min par(i) mir	tikim (dikim)
Secdeyê şukrê <i>tibim</i> ez ku kerê min par(i) mir	tibim (dibim)
	(3/1)
Sata ki dafme qedeḡ gote emin <i>feqed efleḡ</i>	
<i>E’tayim</i> û mest û fereḡ ten tele la la	<i>ez daim</i> (tîpa <i>-z’ê</i> ketiye)
	(1/12)

Ji bo ku em tespîtên xwe îspat bikin, emê hinekî li ser tertîba peyvên dîwanê rawestin. Hinek taybetmendiyên di helbestên Şêx Şemsedîn de, çend xalên giring yê dîwanê dide eşkere kirin.

1. Di dîwanê de di gelek ciyan, di şuna dengê *-d’ê*, dengê *-t’ê* hatiye bi kar anîn.

Mînak;

Tigrîm (1/5): Digrîm	Tibû (3/9): Dibû
Tibêm (1/12): Dibêm	Tixwazî (3/12): Dixwazî
Tikim (3/1): Dikim	Tirêjim (3/14): Dirêjim
Tibim (3/1): Dibim	Tizanî (3/15): Dizanî
Tinalim (5/9): Dinalim	Tike (5/8): Dike

2. Di dîwanê de, hinek peyv kurt bûne. Herwekî bi vê kurt kirina peyvan jî, hinek tîp ketine. Mînak;

Ku'z (3/8): Ku ez; ji vê peyvê tîpa *-e* ketiye.

Ne'z (14/5): Ne ez; ji vê peyvê tîpa *-e* ketiye.

E'tayim (1/11): Ez dayim; ji vê peyvê tîpa *-z* ketiye û tîpa *-d* wergeriyaye tîpa *-t'*ê.

Ku'v (6/3): Ku ev; ji vê peyvê tîpa *-e* ketiye.

Ev her du taybetmendî di dîwana Şêx Şemsedîn de pir hatine bi kar anîn. Ji bo vê em dixwazin hinek taybetiyan eşkere bikin. Ev taybetmendiyên ku em eşkere bikin, wê zelaliya hinek peyvan derxe holê.

Mînak 2.

Dîsa Mihemed Emîn Doskî peyva “*bilbilî*” wekî ‘*yul bilî*’ ya tirkî şîrove kiriye, ku tê wateya (kesê rê dizane). Li gorî lêkolîna me ev ne rast e. Di destxeta Şêx Memdûh de di helbestê de peyv bi dengê *-b'ê* hatiye nivisandin. Herwiha naveroka helbestê girêdayî bi peyva bilbil ve ye.

Dil àerîb est èendelîb est dostê gul

Yar hebîb est ew ûebîb est bûlbil î

(14/4)

Dîsa Mihemed Emîn Doskî di şerha dîwana Şêx Şemsedîn de ji bo peyva “*xeste*” gotiye bi tirkî ye. Lê ev li gorî tespîta me ne rast e. Ji ber ku di zimanê tirkî de du dengên dengdar *-s* û *-t* (bêdeng) nayên cem hev. Di zimanê farisî de peyva “*xeste*” bi wateya “*westiyayî*” tê bi kar anîn. Ev peyv bi koka xwe farisî ye.

Ez helak im derdenak im xeste dil

N'ez ji xak im rûhê pak im bûlbil î

(14/6)

Dîsa ji peyva “*çelebî*” re weke etîmolojî gotiye tirkîye. Lê me di ferhengên tirkî de lêkolîn kir, em lê rast nehatin ku ev peyv tirkî ye. Mesele di ferhenga “*Misalli Büyük Türkçe Sözlük*” de koka vê peyvê wekî nediyar hatiye nîşandan. Tirkan ev nav weke paşnav bi kar anîne. Mînak; Mehmet Çelebî.⁶²

Weke encam Şêx Şemsedîn di dîwanê de, li gorî tespîta me, peyvên bi tirkî bi kar nanîne.

⁶² İlhan, Ayverdi, “Çelebi” *Misalli Büyük Türkçe Sözlük*, c.1, Kubbealtı Lugatı, İstanbul 2008, r. 561.

2. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Şêx Şemsedînê Exlatî, ji gelek aliyan ve xwedî şêwazeke serbixwe ye. Di helbesta kurdî ya klasîk de sentaksên nu ava kirine. Şêx Şemsedîn, bi qalibên cuda nerîneke nû daye helbesta kurdî. Bi van qaliban, felsefeyêke tesewifê bi zimanê kurdî disiplîne kiriye. Qalibên wî yê serbixwe ev in:

1. *Ten tele lat la la*

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la
Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la

Xwardive şerbeta ãaf bûyime wekî kûhê Qaf
Nabêjim ez evê gezaf ten tele lat la la

ÈAşiq û dîwane yim ez muqîmê meyxane yim ez
Sot wekî perwane yim ez ten tele lat la la

(1/1-2-3)

Ten: Ten(cesed), **tele;** Xefk(Kemîn) **lat;** put, **la la;**na na

Li gorî felsefeya di vî qalibî de:

Ten (cesed) ji bo rûhê meriv mîna kemînekê ye. Dîsa cesedê (beden) meriv weke putekî ye. Pêwîst e meriv nekeve xefka bedenê û bedena meriv ji meriv re nebe mîna putekî . Li gorî vê felsefê ya giring giyanê meriv e. Pêwîst e kes ji bedena xwe pirtir giyanê xwe xurt bike û li du xwestekên bedena xwe (nefsa xwe) neçe û giyanê xwe li paş nehêle.

2. *Tenenaha ya hû*

Qalibê duyemîn ku Şêx Şemsedîn di helbestê de ava kiriye qalibê: “*tenenaha ya hû*” ye. Li gorî sofîyên ku bi felsefeya Wehdet-ul Wicudê ve girêdayine, kinkirina, ente ene ; ene îlah, ya hû we ye.

Em dixwazin hinekî li ser vê qalibî rawestin û bi hurbûnî analîz bikin. Şêx Nûredînê Birîfkanî li ser wateya “*tenenaha ya hû*” bi awayekî berfireh tehlîl kiriye. Dema ku tehlîla vî qalibî dike bi felsefeya Wehdet-ul Wicudê ve girêdide. Li gorî Şêx Nûredîn:

“Çi kelimên heyî weke şetafat, reng, çebûn, beqa, fena û tiştên heyî tev ji gotina “*Laîlahe îllellah*” çêbûne. Xwestiyê di wirdên xwe de yekîtiyekê di navbera xwe û rebê

xwe de çêke û hem jî di gotinê de veqetandinekê deyne. Tewhîda heqîqî guhertina zat bi zatê heq e û guhertina sîfatê ebd bi sîfatê heq e. Weke çawa wêne û şikil ji ser lewheya wicud ya heqîqî derbasî ser lewheyan bibe û weke veqerandina ronahiyê ji avê ber bi qursa rojê ya rastî. Agirê safîbûna zatê Xwedê yê ku bi nerîna arif bi zerreyekê be jî xalî nake ji şewatê. Ev giranbûna kaînatê weke hesinê di nava agir de ye. Dema ku hesin di nava agir de sor û zer dibe, dibe mîna agir. Lê di eslê xwe de hesin nabe agir. Lê hesin mîna agir dide xwuya kirin. Di eserê xwe de heraret wî dike mîna agir.

Tenenaha ya hû di halê şethê de zikrê zimanê Şêx Şemsedîn e û xêra zikir jê re heye. Weke çawa ku kesek ji bilî zimanê erebî zikir bike. Ji bo ku mîna Hellacê Mensur gotina “**enel heq**” ji ser zimanê wî neyê girtin Şêx Şemsedîn gotiye “**ente ena**”. Yanî ji bo ku weke Hellacê Mensur neyê fahm kirin gotiye **Tenenaha ya hû**.

ناها bi wateya ez Xwedê me. Elîfa ناها îşareta gihandina ezelê bi ebedê dike. Xwedê di her duyan de ebedîye. Ji Xwedê re ne ewel heye ne axir. Nisbeta bi bal axir û ezel gotina ناها ye.

Şêx Şemsedîn di van meşhed, zikir û wirdê xwe yê ku nêzikî Xwedê dibe zikrê “**tenenaha ya hû**” ye. Tenenaha ya hû li cem wî mîna “**laîlahe îllellah**” e. Bi zikrê tenenaha ya hû îlahê batil tune dike. Şêx Şemsedîn meqamê suflî û meqamê ulvî ihtîva kiriye û paşî pêdebûna meqamê ittîhadê pê re çêbû ye. Taliyê ji xeynî zatê îlahî tiştek pê re nema ye.

Şiyar bûna di şevan de ruh safî dike û çavên arif ronî dike. Şex Şemsedîn di şevan de ji ber ku şiyar mayîye ew tecelliyatê Xwedê bihîstine. Di nava şevê de zikrê zimanê şevê هاهاهانایاهو ye. Herfa ه yê îşareta dirêj bûna kesayeta di alema fanî de dike. Herfa ا îşaretî enaniyeta (kesayet) heqîqî dike. ياهو Gotineke piştî tevahiyê ye. Zikirkirina “**Ellah**” bi zimanê şevê ye û zikirkirina çiya, cewahiran û hewayaya ezman e.

Şêx Nûredînê Birîfkanî behsa cewahiran (hebûnê) wisa dike:

Ew cewahirên ku Xwedê Teala behsa wan kiriye min bihîstine. Min zikrê zimanê şevê jî bihîstiye. Ji ber ku tiştên ecêb bûn ez nikarim û îmkana min tune ye ku ez wan tabîr bikim.⁶³

Li jorê ji agahiyên ku me behs kirin tê fahm kirin ku Şêx Şemsedîn baweriya wî bi wahdet-ul wucûdê heye. Baweriya xwe ya wahdet-ul wucûdê bi awayekî bi şetafat û

⁶³ Şêx Nûredînê Birîfkanî, El Bidûrel Celiyye, 1821 r. 92-93.

serxoşiya eşqê neaniye ziman. Ev baweriya xwe hinekî disiplîne kiriye û bi hinek sentaksên cuda aniye ziman.

Ez ku mestê meyê èişq im tenenaha ya hû
Miâr û Beàdad û Dîmeşq im tenenaha ya hû

Teşne ê abê wiãal im ji àemê èişqê tinalim
èAşiqê Óeyyê Celal im tenenaha ya hû

Gellekî cerge kebab im bêxwud û mest û xerab im
Saqiyê xemr û şerab im tenenaha ya hû
(12/1-2-3)

Şêx Şemsedîn, zimanekî mutewazî bi kar aniye. Di helbestên xwe de, pesindariya xwe nekiriye û xwe mezin nedîtiye. Xelwet û uzleta xwe li çiyayên bilind û asê de kiriye. Ji ber van sedeman bi xwezayê re rû bi rû maye. Ev rû bi rû mayina wî xweza û dengên di xwezayê de kişandine nava helbestên xwe. Mînak;

èUzlet tikirim daim dîsan(i) wekû kungir
Her wê ki hebit kavilek ez lê tixûnim qû qû

Geh geh wekû hudhud ez menôûrê Suleyman im
Geh geh li rûyê ãehra bi fiàan dibêjim pû pû

Dîtîm ki li ser darê ba zeban fesîh kapil
Tigirî ki tibin àafil ev xelq(i) hemû kû kû
(13/1-2-3)

“Di tarîxa edebiyata kurdî de di sedsala 17an de wekî şêxekî terîqeta Xelwetî di warê helbesta tekyayê û remzî de pêşengî kiriye.”⁶⁴

⁶⁴ Abdurrehman Adak, h.b., r. 220.

3. EDÎBÊN KURD YÊN DI DEMA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ EXLATÎ DE

Edîbên di dema Şêx Şemsedîn de, Mele Ehmedê Cizîrî (1570-1640 m), Feqiyê Teyran (1590-1660 m) û Ehmedê Xanî (1951-1707 m.) e. Ev hersê şairên kurd, bi berhemên xwe, mohra xwe li edebiyata kurdî xistine. Lê em negihîştin wê baweriyê ku Şêx Şemsedîn ji hemdemê xwe bandor sitandiye an jî bandor li wan kiriye.

3.1. Mele Ehmedê Cizîrî

Melayê Cizîrî hemdemê Şêx Şemsedînê Exlatî ye. Ev herdu şair ji hêla uslûb û bikaranîna ziman ve hinekî nêzî hev in. Ji hêla felsefeya tesewifê ve di navbera wan de nêzîkbûneke mezin heye. Zimanê her dû şaîran giran e. Melayê Cizîrî, li ser gelek mijaran rawestiyaye. Şêx Şemsedîn, ji ber ku dîwana wî bi temamî li ber destê me nîne em nizanin ka çi qas mijar bi kar anîne. Lê eger dîwana Şêx Şemsedîn bi temamî li ber destê me hebûya, wê bihatana eşkere kirin ku Şêx Şemsedîn ji hêla edebî û manewî ve ne kêmtir Melayê Cizîrî ye. Herçi qas helbestên Şêx Şemsedîn ên li ber destê me hindik bin jî, lê dîsa di van helbestan de pir mijar hatine bi kar anîn. Dema ku meriv bi çavekî manewî li herdu şaîran dinere, ji hêla bi kar anîna mijarên tesewifê û rêbazên wê meriv yekîtiyeke manewî dibîne.

Mele Ehmedê Cizîrî:

Hin ji nêk *dêrê* ve tîn qesta *kenîştê* hin dikin
Ney ji wan im ney ji wan im min *derê xemmarî* bes⁶⁵

Şêx Şemsedîn:

Ez im rindê xerabat nizamim bi çi hal im
Ne ãofi û ne rind im ne kufr û ne musulman
(10/3)

Herwekî ji van malikên jorê tê famkirin her du helbestvan xwedî baweriyê hevbêş in. Lewra rêya herdu şaîran jî rêya eşqê ye. Eşq, Xweda bi hertiştî re yekpare dibîne. Ev yekparebûn bawerî û dîtina Wehdet ûl-Wucudê ye. Li gorî Îbnî Arabî, tenê hebûnek heye, ew jî hebûna Xweda ye. Ji bilî wî ti hebûn nîne. Gerdûn bi tena serê xwe

⁶⁵ Mela Ehmedê Cizîrî, Dîwan , (Werg. Osman Tunç) Weş. Nubihar, Çapa I., Stenbol 2008, r. 350 .

hebûna wê nîne, hebûna wê bi hebûna Xweda ye.⁶⁶ Nunerê vê fikrê yê yekemîn Hellacê Mensur e. Ev rewş û fikir di klasîkên kurdî de jî hene. Ev felsefeya tesewifê van pirsan dike:

Xweda kî ye? Kaînat çawa çêbûye? Em çi ne? Em ji bo çi hatine dinyayê? Dêspêk û dawîbûna rast çi ye?

Îca dema ku em li gorî herdu şaîran bersiva van pirsan bidin, emê bibêjin ku beriya hebûnê êşqa Xweda hebû. Herdu şairan jî bi yek şêwaz û sembol û peyvan behsa vê mijarê kirine. Nêzikatiyeke mezin di navbera herdu şaîran de heye.

Bo nimune:

Mela Ehmedê Cizîrî:

Hê di ber qalûbelayê belku ev èalem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû

êErş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû istiwaê lamiêa *êişqê hebû*⁶⁷

Şêx Şemsedînê Exlatî:

Ji weqtê ku tinoşim meyê *êişqa* Celalî
Ne leyl û ne nehar bûn ne ev gunbedê gerdan
(10/4)

Bi awayekî vekirî herdu şaîran, bi heman sembolan û bi heman şêwazê, hest û ramanên xwe anîne ziman. Mînak:

Mele Ehmedê Cizîrî:

Sed *Nîl û Fîrat* tîn û diderin qelbê me
Pê nahisihîn *qulzem* û *derya* yim ez⁶⁸

Şêx Şemsedînê Exlatî:

⁶⁶ Mustafa Kara, Dervişin Hayatı Sofînin Kelamı, Dergah Yayınları, İstanbul 2005, r. 183.

⁶⁷ Mela Ehmedê Cizîrî, Dîwan, r. 458.

⁶⁸ Mela Ehmedê Cizîrî, Dîwan, r. 334-7.

Ji èişqê ku ticûşim mulazim bi xurûş im
Ez im behrê muhîtê ez im qulzem û èumman
(10/6)

Meriv ji her du şaèiran famdike ku xwedî pîr (Murşid) in. Tişteki pir balkêş e ku herdu şaèiran jî peyva “*pîr*” bikaranîne. Mînak:

Mela Ehmedê Cizîrî:

Sed neql û rîwayet di meya safî mûyek
Îro ku ji *pîrê* xwe bi fetwa yim ez⁶⁹

Şêx Şemsedîne Exlatî:

Xelwetî irşadê pîrê xwe bigir mûhkem bi dest
Guh li xelqê qeû medêr madam ku Baqî bête lêr
(4/5)

Di her du şairan de jî eşq li hember mal û milkên dinyayê tercîha yekemîn e. Yanî eşqê nadin bi seltenet û mal milkên dinyayê. Mînak:

Mela Ehmedê Cizîrî:

Mîrî û patîşahî mûyek li nik Melayî
Nadim bi mûlkê alem yek zerreyek èînayet⁷⁰

Şêx Şemsedîne Exlatî:

Yekser cîhan ti dest im li bal im bi filûsek
Hemû mûlkê dinê û hemî hukmê Suleyman
(10/10)

Her du şair jî derketina xweşîkbûn û heskirina Xweda bi yek zimanekî îfade dikin. Mînak:

⁶⁹ Mela Ehmedê Cizîrî, h.b., r. 336-9.

⁷⁰ Mela Ehmedê Cizîrî, h.b., r. 276-11.

Mela Ehmedê Cizîrî:

*Afîtabê ehediyet di xwe da girtiye kewn
Ne ku èewrek heye lê girtiye çehvên me remed⁷¹*

Şêx Şemsedînê Exlatî:

Ba niqab est af(i)tab est hûsnê dost
Dil xerab est cerg kebab est bûlbil î
(14/10)

Di bi kar anîna simbolên tesewifê yên mîna çiyayê Tûrî Sîna û Hz. Musa wekheviya wan pir eşkere ye. Mînak:

Mela Ehmedê Cizîrî:

*Tûr im û bi dil peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û Tûrê tecella yim ez⁷²*

Şêx Şemsedînê Exlatî:

äaħîbê qelbê selîm im dujminê dêwê recîm im
Cebelê Ûûrê kelîm im tenenaha ya hû
(12/9)

Meriv dikare gelek mînakên nêzîkbûna Şêx Şemsedînê Exlatî û Melayê Cizîrî bide. Weke encam meriv dikare bibêje ku çavkaniya herdu şaèiran ji hêla teşe û naveroka helbestan yek e. Ji ber vê yekê jî hêla bi kar anîna ziman û nêzîkatiya felsefeya tesewifi pir nêzîkî hev in.

3.2. Feqiyê Teyran

Feqiyê Teyran jî hemdemê Şêx Şemsedîn e. Herdû şaèirên edebiyata klasîk in. Bi erûzê helbest nivîsandine. Feqî û Şêx Şemsedîn zimanê xwezayê bi kar anîne. Zimanê Feqiyê Teyran û Şêx Şemsedîn hinekî ji hev cuda ne. Zimanê Feqî hinekî vekiriye. Lê zimanê Şêx Şemsedîn li gorî zimanê Feqî hinekî girtiye.

⁷¹ Mela Ehmedê Cizîrî, Dîwan, r. 310-5.

⁷² Mela Ehmedê Cizîrî, h.b., r. 334-1.

Feqiyê Teyran di edebiyata kurdî ya klasîk de zimanekî folklorîk û sade bi kar aniye. Feqiyê Teyran meteforên çukan baş bi kar aniye. Di bi kar anîna meteforên çukan de Feqî û Şêx Şemsedîn pir nêzî hev in. Mînak;

Şêx Şemsedîn:

Evro we yim ez jêkve nenasim ker û baran
Ferqê nakirim ez nûnkî jêkve gul û xaran

(11/1)

Feqiyê Teyran:

Ey *avê avê avê av*
Ma tu bi eşq û muhbet î
Mewc û pêlan tavê belav
Bê sekne û bê rahet î⁷³

Şêx Şemsedîn:

Dil àerîb est èendelîb est dostê gul
Yar hebîb est ew ùebîb est bûlîb î

(14/4)

Feqiyê Teyran:

Feqî ji *bilbil* ra gotî
Ez *murxe* nav hezar e
Bi dilxweşiyê doj im
Têk bûme pêt û nar e
Ji huba *gulan* disojim
Lew min nayêt qerare⁷⁴

Feqî helbestên xwe bi piranî di terza çarînan de nivîsandine. Gelek berhemên xwe yê menzûm di terza çîrokan de nivîsandine. Şêx Şemsedîn û Feqiyê Teyran ji hêla teşeya helbestê, meriv nikare bibêje pir nêzî hev in. Nêzikatiya wan ji hêla fikra tesewîfî ye. Herdu şaêir jî behsa husn û cemala Xweda ya ku li çiyayê Tûrî Sîna tecellî kiriye dikin. Mînak;

Şêx Şemsedîn:

âahîbê qelbê selîm im dujminê dêwê recîm im
Cebelê Ûûrê kelîm im tenenaha ya hû

(12/9)

⁷³ Feqiyê Teyran, *Ey Av û Av-Şêxê Senanî*, Weşanê Enst. Kurdî Stenbol, ç.1 1999, r. 15-1.

⁷⁴ Feqiyê Teyran, h.b., r. 30-8.

Feqiyê Teyran:

Eşqê gelek sewda kirin
Bê mal û bê mewda kirin

Nura çira winda kirin
*Musayê êImran im ez*⁷⁵

Şêx Şemsedîn:

Ji êişqê ku ticûşim mulazim bi xurûş im
Ez im behrê muhîtê ez im qulzem û èumman
(10/6)

Feqiyê Teyran :

Ah ji dest kovan û qehran
Min sebir nayêt li sehran
Şubhêtê mewcên di behran
*Qulzem û èumman im ez*⁷⁶

Herwekî ku di malikên jor de jî tê famkirin ku herdû şaèiran heman sembol bi kar anîne. Lê ji hêla teşeya helbestê ve Şêx Şemsedîn malik, Feqî bi terza çarînan helbestê xwe nivîsandîne

3.3. Ehmedê Xanî

Herçiqas Ehmedê Xanî (1951 m.1707 m.) ne di dema Şêx Şemsedîn de ye jî, lê me xwest çend tiştan li ser wî binivîsîn. Ehmedê Xanî dema ku di despêka Mem û Zînê de behsa helbestvanên kurd dike wisa dibêje:

Îlm û huner û kemal û îzèan
Şiêr û xezel û kîtab û dîwan

Ev cinsi biba li bal wî meêmûl
Ev neqdi biba li nik wî meqbûl

Min dê èalema kelama mewzûn
èAlî bikira li banê gerdûn

Binave ruha *Melê Cizîrî*
Pê hey bikira *èElîyê Herîrî*

⁷⁵ Feqiyê Teyran, Ey av û av-Şêxê Senanî, r. 22-2

⁷⁶ Feqiyê Teyran, h. b., r. 22-5.

Keyfek we bida *Feqîyê Teyran*
Heta bi ebed bimayi heyran⁷⁷

Di van malikan de, tiştê herî balkêş ev e; çima Ehmedê Xanî behsa şaèirên beriya xwe, Melayê Cizîrî, Eliyê Herîrî û Feqiyê Teyran kiriye; lê çima behsa Şêx Şemsedînê Exlatî ne kiriye? Egerek mezin e, ku Ehmedê Xanî haya wî ji Şêx Şemsedînê Exlatî tune bû. Ev jî dide xwuya kirin ku di wê demê de tesîra Şêx Şemsedîn negihîştîye erdnîgariya Serhedê û Cizîra Botan. Egera diduyan, ji ber ku Şêx Şemsedîn şaèirê gundewariyê bû, dengê wî neçûye kesî û kes pê nehisiya ye. Meriv dikare gelek sebeban ji van malikên Ehmedê Xanî derxe.

Weke encam, meriv dikare bibêje, sedsalên Şêx Şemsedîn û hemdemê wî; Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran têde jiyane, edebiyata kurdî ya klasîk di lutkeya xwe ya herî bilind de ye. Berhemên edebiyata klasîk yê herî baş di van sedsalan de hatine nivîsîn.

⁷⁷ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Amedekar Zeynelabidîn Amedî, Mîzanul Edeb-1990, r. 20.

BEŞA SÊYEM

JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ

Di beşa sêyemîn de em li ser teşeyên nezmê ya dîwanê rawestiyane. Di vê beşê de em li ser serwa (qafiye), kêş (wezin) û redîfan rawestiyane.

1. TAYBETIYÊN TEŞEYÊ

1. 1. Awayê Rêza Helbestên Dîwanê

Şêx Şemsedîn mîna her helbestvanekî klasîk tertîba nivîsandina helbestên xwe di dîwanê de, bi disîplîna rêza elîfbaya erebî saz kiriye. Li gorî agahiyên Zahid Birîfkanî di hemû herfên elîfbayê de helbestên wî hebûne. Zahid Birîfkanî di pêşgotina pirtuka xwe de ev mijar tesbît kirine û wisa dibêje: “Ev helbestên ku me di dîwanê de çap kirin, beşek e ji dîwana wî ya mezin ya ku bi hemû pîtên ebcedî pêk tê. Her pîtek (herfek) jî nêzîkî deh heta yazdeh helbestan e.”⁷⁸ Lê mixabin ev helbest tev, niha di destên me de nînin. Bi giştî li jêrê em dê cîh bidin lîsteya helbestan.

Herf	Hejmara helbestan	Rêza helbestan a di dîwanê de
ت – t	1	2
ر – r	2	3, 4
ق – q	1	5
م – m	4	6, 7, 8, 9
ن – n	2	10, 11
و – w-û	2	12,13
لا – la	1	1
ی – y-î	3	14, 15,16

Herwekî ku di agahiyên jorê de têne xwuyanê dîwana Şêx Şemsedîn ji 8 (-t, -r, -q, -m, -n, -û, -î, -la,) herfan pêk hatiye. Ev jî dide xwuya kirin ku dîwan ji hêla helbestan kême e. Nuxxeya dîwana Şêx Şemsedîn ya ji hêla hejmara helbestan ve pir nuxxeya bi desxeta Memdûh Birîfkanî ye. Lê di nuxxeya Memdûh Birîfkanî de jî gotinên helbestan jê çûne û hinek helbest bi temamî tunene. Herweha di lîsteya jor ya helbestan de tê

⁷⁸ Zahid Birîfkanî, h.b., r. 10.

xwuya kirin ku bi hinek herfan 4 helbest, bi hinek herfan 3 helbest, bi hinek herfan 2 helbest û bi hinek herfan 1 helbest hatiye nivîsandin. Di dîwana Şêx Şemsedîn de di nivîsandina hejmara helbestan de li gorî tîpên erebî hemahengiyek nîne. Lewra di dîwanên edebî de ji hêla hejmara helbestan bi tîpên erebî hemahengiyek heye. Yanî helbestavan bi pîvan li gorî tîpên herfên erebî bi gelemperî helbestan dinivîsînin. Ev tev ji me re delîl in ku gelek helbestên dîwana Şêx Şemsedîn winda ne.

1.2. Teşeyên Nezmê

Cureyên nezmê yên ku di dîwana Şêx Şemsedîn de hatine bi kar anîn: 2 metle', 14 xezel in. Em bawer in ku şa'ir di gelek cureyên nezmê de helbest nivîsandine lê mixabin helbestên wî winda bûne. Di dîwanê de 163 malik (beyt) hene. Di helbesteke dîwanê de hinek malik nîvcone.

Wekî encam di dîwana Şêx Şemsedîn de ji hêla ruxsarê ve giranî li ser cureyê xezelê ye. Menzûmeyên hatine bi kar anîn ji xezelan pêk tên.

1.2.1. Xezel

Xezel, bi wateya xezal, ahû meriv dikare bide nasîn. Xezel li ser evînê, xweşikayiyê, kêfxweşiyê, şerabê, jinan û hwd. têne nivîsîn. Xezel, di helbesta ereban de derketiye û dawiyê derbasî helbesta farisan bûye. Xezel, mîna beşeke ji qesîdeyan bi navê "*texezzul*" hatiye despêkirin. Xezel, di edebiyata kurdî ji 5 malikan heta 30 malikî tê guherîn. Dema ku xezel ji 15 malikan pirtir be wê demê jê re tê gotin "*muyezzel*" an "*muteel*" yanî xezela ku hatiye dirêjkirin.⁷⁹ Di edebiyata farisan de xezel, di dema Sasaniyan de bi Rudekî des pê kiriye û bi Hafizê Şîrazî gihiştîye lutkeya xwe ya herî bilind. Di edebiyata ereban de meriv dikare behsa Ibnû Farid û Mela Camî bike. Lê di edebiyata ereban de xezel beriya Îslamiyetê jî hatiye nivîsandin. Kurdan xezel, bi helbestên Melayê Cizîrî, di sedsala 16 û 17an de nas kirine. Lê derketî holê ku di wan sedsalan de ji bilî Melayê Cizîrî gelek şa'îrên kurd xezel nivîsandine. Herwekî ku Şêx Şemsedînê Exlatî jî di sedsala 17an de gelek xezelên bi bandor nivîsandine.

Xezel, di edebiyata klasîk ya kurdî, erebî, farisî û tirkî de cureya nezmê ya yekemîn e. Di dîwana Şêx Şemsedîn de 14 helbest jî weke xezel hatine nivîsandin. 14

⁷⁹ İskender Pala, *Divan Edebiyatı, Kapı yayınları*, 2008, r. 58; Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, 3F Yayınevi, r. 47.

xezel in û du heb jî metlaè hene. Mijarên xezelên di dîwana Şêx Şemsedîn de ji hev cuda ne. Mijarên wê tesewif, evîn, rêbazên olî û pendên exlaqî ne.

Mijara xezelan ya sereke eşq e. Lê digel vê jî xezelên ku bi mijarên cuda jî hatine nivîsandin hene. Eger mijara xezelê tesewif be, ew xezela sûfiyane ye; eger hikmet û felsefe be, ew xezela hekîmane ye; eger daxwaza xweştiviyê be, ew xezeleke şûxane ye; eger zewqên dinyayê be, ew xezeleke rindane ye; eger kêf û izdiraba ji eşqê be ew xezeleke aşiqane ye.⁸⁰

Mijara 10 heb xezelên Şêx Şemsedîn li ser eşqê ne. Mijara 3 heb helbestên wî li ser tesewifê û helbesteke jî li ser hikmet û felsefê hatiye nivîsandin.

1.2.2. Metlaè

Malika pêşî ya xezelê jê re tê gotin metleè (derketin). Serwaya malikên metleèê di nava xwe de bi yek deng in (a-a).⁸¹ Helbestên Şêx Şemsedîn du heb jê metleèê helbestan in. Mînak;

Dîsan ji àemê èişqê ez bêser û bêpa yim
Mecnûn im û layeèqîl dêwane û sewda yim
(9/1)

Tibêjim ez ji qal û hal ten im tinê we ten tenê
Er çi tîkin xwîn im helal ten im tinê we ten tenê

(16/1)

1.3. Kêş

14 helbest û 2 metleèê ku di dîwana Şêx Şemsedîn de, bi 4 nîfş behrên erûzê hatine nivîsîn. Herweha 13 qalibên cuda yên van behrên erûzê hatine bi kar anîn. Ji behra hezêcê 7 qalib, ji behra remelê 5 qalib û ji behra recezê 3 qalib û ji behra menserîh qalibek hatiye bi kar anîn. Qalibên erûzê yên ku di helbestên Şêx Şemsedin de hatine bi kar anîn di tabloya jêrîn de hatine nîşandan.

⁸⁰ Abdurrahman Adak, h.b., r. 371.

⁸¹ Yekta Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi, 3F Yayinevi, r. 49.

	BEHR	QALIB	HEJMARA BIKARANÎNÊ		
			Hejmara Helbestan	Yekûna Behran	
1	Remel	1	faèilatun / faèilatun / faèilatun / feèulun	1	5
		2	faèilatun / faèilatun / faèilatun / faèilat	1	
		3	Mustefèilun/ musteèilun/ musteèilun/ mustefèilun	1	
		4	faèilatun / faèilatun / faèilatun / faèilun	2	
		5	faèilatun / faèilatun / faèilun	1	
2	Recez	1	mustefèilun / mustefèilun / mustefèilun / mustefèilun	1	3
		2	mefaèilun / mefaèilun / mefaèilun / mefaèilun	1	
3	Hezec	1	mefaèilun / mefaèilun / mefaèilun / mefaèilun		7
		2	feèulun / mefaèilun / feèulun / mefaèilun /	1	
		3	mefèûlu / mefaèîlu / mefaèîlu / feèulun	1	
		4	mefaèilun / mefaèilun / feèulun		
		5	mefèûlu / mefaèilun / mefaèîlu / mefaèilun	2	
		6	mefèûlu / mefaèilun / mefaèîlu / mefaèilun	2	
		7	mefèûlu / mefaèîlu / mefaèîlu / feèulun	1	
4	Munserîh	1	mustefèilun / mustefèilun / mustefèilun/mefèû	1	1
5	Muzarîe	1	mefèûlu / faèilatun / mefaèîlu / faèilatun		
6	Besît	1	mustefèilun / faèilun / mustefèilun / faèilun		

Tablo 1: Tabloya qalib û behrên erûzê yên ku di dîwana Şêx Şemsedîn de hatine bi kar anîn.

Qisurê erûzê di helbestên Şêx Şemsedîn de hene. Di hinek malikên helbestan de car caran tefêîleyên kêr hene. Mînak; Di beyta jêr de di rêza yekem de tefêîleyeke erûzê kêr e.

Ney mest û cinûn ez ji àemê èişq
 Serxoşê meya heq bûme hêj roja elest im
 (6/8)

Car caran di hinek helbestan de bi awayekî vekirî qisurê erûzê di helbestên Şêx Şemsedîn de têne dîtin. Mînak; di malika jêr de peyva “bilbil im” qisurek erûzê ye.

Sûhtî wesânî bilbil im quûbê àema û tehel im
 Her ti Xwuda ez tikel im wey ku bibêm wey ku nebêm
 (8/2)

1.3.1. Îmale

Îmale, dirêjxwendina dengdêrekî kurt a di hundirê peyvekê de ye. Bi gotineke din, di erûzê de kêteyêke vekirî ku wekî kêteyêke girtî bê hesibandin, wê çaxê îmale derdikeve holê.⁸² Şêx Şemsedîn, di helbestên wî de îmale pir in. Ji ber ku helbestên xwe bi piranî herikbar nivîsandine guh nedaye îmaleyê.

Zihî **bade** zihî cam zihî **şerbetê** ā a f î
Zihî **xelwetê** xalî zihî saqiyê mestan
(10/2)

1.3.2. Med

Wateya ferhengî ya “med”ê dirêjkirin an jî kişandin e. Lê di erûzê de med, dirêjxwendina hinekî zêdetir a kêteyên hevedudanî ye.⁸³ Helbestvan di helbesta jêr de û di gelek helbestên din de jî qalibên farîsî pir bi kar anîne. Ji ber van qalibên farîsî med di dîwanê de hatiye bi kar anîn. Mînak;

Sirc *û* find im mest *û* rind im daima
Derd(i)mend im dil ti bend im bulbil î
(14/3)
Ez helak im **derdenak im** xeste dil
N’ez ji xak im rûhê pak im bûlbil î
(14/6)

1.3.3. Zîhaf

Wateya ferhengî ya “zîhafê” dûrxistina ji eslê xwe ye. Lê di erûzê de zîhaf, kurtkirin an jî kurtxwendina kêteyan e ku di rastiyê de dirêj in.⁸⁴ Zîhaf, di helbestên Şêx Şemsedîn de pir hatiye bi kar anîn. Meriv dikare pir bi kar anîna zîhafê bi herikbariya helbestan ve girê bide. Mînak;

⁸² Saraç, h.b., r. 210.

⁸³ Saraç, h.b., r. 211.

⁸⁴ Saraç, h.b., r. 215.

Zihî dur û me'ânî zihî genc û zihî kan
 Zihî lu'ûfê **z**lahî zihî şefqetê îhsan
 ↘ Zihaf

Zihî bade zihî cam zihî şerbetê **ã**a f î
 Zihî xelwetê xalî zihî saqiyê mestan → Zihaf

(10/1.2.)

Derdê èişqê weh li min rojê ezel kir sernivişt
 Her ji hingê dilê kul bûye çî biryan û birişt
 (2/1)

1.3.4. Wesl

Wesl, bihevekirin e. Di qalibên erûzê de bêjeyeke ku dawîya wê bi tîpeke dengdar ve qediyabe, ji ber pêdiviya weznê bi peyveke ku bi dengdêrekî ve destpêdike tê girêdan û bi vî hawî dengê dengdar û yê dengdêr bi hev re têne xwendin.⁸⁵ Me li malikên jêrê wesl daye xwuya kirin. Mînak:

Turk **û** zeng im şox **û** şeng im bilbilî
 Pir bireng **im** mest **û** deng im bilbilî
 ↘ ↘

Ez xumar **im** baqerar **im** roj **û** şev
 Dûr ji yar **im** lew tizarim bilbilî

Sirc **û** find im mest **û** rind **im** dâîma
 Derdemend **im** dil tibend **im** bilbilî
 ↘ ↘

(14/1, 2, 3)

1.4. Serwa (Qafiye) û Cûreyên Wê

Serwa (Qafiye), bi kêmanî wekheviya dengên dawîya du risteyan e. Nivisandina wan mîna hev in lê wateya wan ne yek in. Di edebiyata klasîk de, etîmolojîya her duyan

⁸⁵ Saraç, h.b., r. 208.

jî bi erebî ye.⁸⁶ Di helbestên Şêx Şemsedîn de wekhevîya dawîya dengan pir li pêş e. Serwa pir bi kar aniye. Li jêrê peyvên binê wan xêz kirî tev serwa ne.

Şukrê heq daim tikim ez ku kerê min par mir

Sûcdeyê şukrê tibim ez ku kerê min par mir

(3/1)

Peyva “*ez ku kerê min par mir*” tev redîf e. Şêx Şemsedîn di dîwana xwe de redîf pir bi kar aniye. Mînak:

Ez ku mestê meyê èişq im tenenaha ya hû

Miâr û Beâdad û Dîmeşq im tenenaha ya hû

(12/1)

Şukrê Ôeq daim tikim ez ku kerê min par(i) mir

Secdeyê şukrê tibim ez ku kerê min par(i) mir

(3/1)

1.4.1. Li Gorî Cihê Wê di Risteyê de

1.4.1.1. Serwaya Kutayî

Serwaya kutayî, ew serwa ye ku di dawîya risteyan de cîh digire. Di helbestên Şêx Şemsedîn de hatiye bi kar anîn.

Dîsan ti àeman mayim ev ro pejmirê xwînê

Ke’v mişk hate èenbarê ew ùewlê ti kadînê

(15/1)

1.4.1.2. Serwaya Navekî

Serwaya ku di nava risteyan de cîh digire. Di helbestên Şêx Şemsedîn de hatiye bi kar anîn.

Pêm bestine cot bille óaãil tikirim àille

Ku mişk tikite zille pakij dike çoxînê

(15/3)

1.4.1.3. Serwaya Sereta

Serwaya ku di despêka risteyan de cîh digire. Di helbestên Şêx Şemsedîn de hatiye bi kar anîn.

Geh geh wekî dîwane tigerim li kûyifan

Geh bêser û saman tiçime qerye û şaran

(11/6)

⁸⁶ İskender Pala, Divan Edebiyatı, h.b., r. 29.

1.4.2. Li Gorî Dengan

1.4.2.1. Serwaya Lawaz

Di serwayê de wekheviya dengekî bi tenê ye. Di edebiyata klasîk de serwaya ku bi dengekî tenê hatiye kirin pir kêr e.⁸⁷ Ev serwa, di helbestên Şêx Şemsedîn de nîn e.

1.4.2.2. Serwaya Asayî

Di serwayê de wekheviya du dengan e. Di helbestên Şêx Şemsedîn de hatiye bi kar anîn.

Kûje û rûvî bi lafê key tibin manendê şêr
Rextê mêran ger bipûşît pîrejin nabîte mêr
(4/1)

1.4.2.3. Serwaya Zêdebar

Di serwayê de wekheviya ji du dengan zêdetir e. Di helbestên Şêx Şemsedîn de hatiye bi kar anîn.

Meħbûbê qedeħ dîsa ji nû daye vi dest im
*El minnetu lillah*⁸⁸ ku dîsan waleh û mest im
(6/1)

1.4.2.4. Serwaya Regezdozî

Serweya regezdozî ew e ku ji deng û bêjeyên ku nivîs û bilêvkirina wan wekî hev in. Lê wateya wan ji hev cuda ne. Regezdoz bi wateya cînas e û di heman demê de yek ji hunerên wêjeyî ye. Ev serwa di dîwanê de nehateye bi kar anîn.

Kêşa ji hêla teşeyê ve di helbestên Şêx Şemsedîn de bi tevahî bi vî awayî ye:

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la → a
Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la → a

Xwardive şerbeta ãaf bûyime wekî kûhê Qaf → b
Nabêjim ez evê gezaf ten tele lat la la → a

èAşiq û dîwane yim ez muqîmê meyxane yim ez → c
Sohtî wekû perwane yim ez ten tele lat la la → a

⁸⁷ İskender Pala, h.b., r. 29.

⁸⁸ El minnetu lillah: Minet ji Xweda.

èAşiqê rûyê dilber im mest û xerabê bavzer im → d
 Sotiyê biryan ceger im ten tele lat la la → a
 (1/1-2-3-4)

Di 15 helbestên Şêx Şemsedîn de bi vî awayî (aa-ba-ca-da-) serwa (qafiye) hatine kirin. Lê tenê di helbestekê de serwa (qafiye) bi awayekî (ab-cb-db) cuda hatiye kirin. Egerek mezin e ku metleêa vê helbestê kêm be jî. Ev helbesta ji 3 malikan pêk tê; ew jî ev e:

èUzletê tikirim daim dîsan weku kungir → a
 Her wê ku hebit kavilek ez lê tixûnim qu qu → b

Geh geh wekû hûdhûd ez menôûrê Suleyman im → c
 Geh geh li rûyê ãeħra bi fiàan dibêjim pu pu → b

Dîtîm ku li ser darê ba zebanê fesîħ kapil → d
 Tigirî ku tîbin àafil ev xelqe hemû ku ku → b
 (13/1-2-3)

1.5. Paşserwa (Redîf)

Dema ku li dawiya risteyan nivîsandin û wateya peyvên mîna hev bin, jê re tê gotin redîf.⁸⁹ Di edebiyata klasîk de paşserwa (redîf) ji bo dewlemendkirin û ahenkbûna helbestê pir tê bi kar anîn. Di dîwana Şêx Şemsedîn de redîf di şeş ciyan de hatiye bi kar anîn. Mînak:

Tibêjim ez ji qal û ħal ten im tinê we ten tenê
 Er çî tîkin xwîn im ħelal ten im tinê we ten tenê
 (16/1)

Şukrê heq daim tikim ez ku kerê min pa(i)r mir
 Sûcdeyê şûkrê tibim ez ku kerê min par(i) mir
 (3/1)

èAlem eger çî qal dîkin ez dibêjim ji derdê èîşq
 Qetlim eger ħelal tîkin ez dibêjim ji derdê èîşq
 (5/1)

Weke encam; Şêx Şemsedîn, hunerên edebî di helbestên xwe de bi kar anîne. Weke her şaîrê edebiyata klasîk Şêx Şemsedîn, ji hêla teşeyên nezmê ve xwedî disiplîneke edebî ye.

⁸⁹ Pala, h.b., r. 29.

BEŞA ÇAREM

TEHLÎLA DÎWANÊ

1. DÎN

Edebiyata kurdî ya klasîk, mijarên xwe ji gelek çavkaniyan distîne. Ji hemû mijarên dînî, Qurêana Kerîm, hedîs, qîsetên pêxemberan, mucîzat, kesayetên navdar, xweza, kozmografya, felekiyat, esrarê xeybê û hemû zanyarî û çandan, xwe xwedî dîke û van mijaran kêr zêde di xwe de dihewîne. Di edebiyata klasîk ya kurdî de, şaîran bi sembolan raman û hestên xwe anîne ziman. Gelek şaîran mijarên tesewîfî, bi sembolan li dijî dîn anîne ziman. Weke şerab, meyxane û hwd. Emê di edebiyata kurdî ya klasîk de li ser wateya remzên dînî (sembolan) hinekî rawestî.

Evîn(heskirin): Evîna xwedayî, heskirina ebd li hemberî Xweda.

Evîndar(kesê hez dîke): Kesê ku dixwaze bigihêje Xweda.

Maşûk(kesê jê tê hez kirin): Xweda.

Xweşîkbûn: Tevê tiştên ku bi xweşîkbûn û sîfatên Xweda dagirtî.

Kemal: Rewşa şahî û kêfa bi temamî.

Îşve : Cezba Xwedayî.

Wefa(girêdayîn): Alîkariya Xweda.

Cefa(ezîyet): Biryara dilê kesê di rêya Xweda de.

Cewr (ezîyet): Rawestandina pêşketina kesê di rêya xweda de.

Naz: Dayîna hêza dil.

Tîrê Xemza: Vegerandina îbadet û emelan.

Aşîna (zanîn): Nêzîkbûna Xweda.

Qamet (qam): Layiqbûna ebdîtiyê.

Turre, zûlf, por û mû: Yekîtiya sîfatê Xweda.

Meh rû (heyv rû): Nîşandayîna tecelliya nûra Xweda.

Daneya reş (şana reş): Alema xeybê.

Lêv (Leb): Peyv, wehdet, yekîtiya Xweda.

Zimanê şêrîn: Emrê Xweda.

Kortika çenê: Zorbûna dîtina sirên alema Xweda.

Meclisa kêfê (meclîsî îşret): Lezeta nêzîkbûna Xweda.

Kêfa bi şerabê (eyş û işret): Devama nêzîkayiya Xweda.
Şerab: Evîna îlahî.
Meyxane: Tekiye an jî dilê evîndar.
Qase, qedeh û cam: Dilê evîndar.
Saqî: Murşid
Xerabat (meyxane): Tekîye an jî dilê evîndar.
Ehlê xerabat: Derwêş.
Pîrê muxan: Şêx.
Mum: Nûra îlahî.
Kafir: Kesê ji Xweda xafil e.
Put: Wateyên hur, rastiyên îlahî.
Dêr: Alema însanên bilind.
Qabe: Maqamê gihaştinê.
Bihar: Di mirov de despêka taybetmendiyên ferîşteyan.
Bax, bexçe: Kêfxweşiya dil.
Ewr: Fedî kirin.
Ava rewan (çem): Di rêwîtiya ber bi Xwada de kêfxweşiya daîmî.
Nesîm (ba): Feyz û alîkarî.
Bûse (maçîkirin): Qebûlkirina rastiyan.
Feqr: Ne îhtiyac bûna ji bilî Xweda.
Xew: Xeflet.
Cewher: Wate.
Çewgan (rim): Teqdîra Xweda.
Guy (gok): Sitûxwar kirina li ber teqdîra Xweda.
Heyveron (mehtab): Derketina Xweşîkbûn û heskirina Xweda.⁹⁰

⁹⁰ Iskender Pala, h.b., r. 27-28.

1.1. Xwedê

Edebiyata tesewifê li ser felsefeya tewhîd û wehdetu'l-wicûdê hatiye ava kirin. Şêx Şemsedîn, bi awayekî rasteqîne helbestên tewhîdê an jî munacatê ne nivîsandine. Lê 14 xezel tewhîdê îfade dikin. Mîna hemû klasîkên kurdî helbestên Şêx Şemsedîn jî vê tradisyona edebiyatê Esmaul Husna (navên Xwedê) di xwe de dihundirînin. Di helbestên Şêx Şemsedîn de Xwedê wehdetu'l-wicûdê îfade dike. Jixwe eşq li cem Şêx Şemsedîn Xweda ye.

Navên Xwedê yên ku di dîwanê de hatine bi kar anîn ev in: Óeq, Baqî, Îlah, Celal, Óey.

Ji weqtê ku tinoşim meyê èişqa Celalî
Ne leyl û ne nehar bûn ne ev gunbedê gerdan
(10/4)

Xelwetî irşadê pîrê xwe bigir mûhkem bi dest
Guh li xelqê qeû medêr madam ku Baqî bête lêr
(4/5)

1.2. Pirtûkên Pîroz

Mînakdayîn û bikaranîna termolojiya pirtukên pîroz ji bo gelek şairên klasîk lutkeya herî bilind e. Pirtukên pîroz kelimên Xweda ne. Dema helbestvanek sembolên pirtukên pîroz bi kar bîne herwekî gotinê xwe bilind dike û wateya wan xurt dike. Di dîwanê de di vê beyta jêrîn de behsa Sihûfan, Lewh û Zebûrê kiriye. Dema ku Şêx Şemsedîn dibêje ez “Sihûf û Lewh û Zebûr im” ev bi xwe baweriya wî ya wahdetu'l-wucûdê îfade dike.

èEnber û misk *û* bixûr im ãihuf û lewh *û* Zebûr im
Agir û av im û nûr im tenenaha ya hû
(12/12)

1.3. Pêxember

Pêxember qasidên Xwedê yên li ser rûyê erdê ne. Di gelek dîwanên klasîk de neêt li ser wan hatine nivîsandin. Di dîwana Şêx Şemsedîn de neêtên ku li ser zatê peyxemberan hatine nivîsîn tunene. Pêxemberên ku behsa wan di dîwanê de hatine kirin hene. Ew jî ev in: Sileyman, Nûh, Îbrahîm, Musa Pêxember.

Sileyman: Sileyman Pêxember Sembola seltêneta bi ihtîşam û mal û milk e. Şaèir di beyteke xwe de di vê konteksê de behsa Sileyman Pêxember kiriye û gotiye ku hemû milkê dinê û hemû hebûna Sileyman Pêxember ji bo min bi qasî filûsekî ne bi qîmet in.

Yekser cîhan ti dest im li bal im bi filûsek

Hemû mûlkê ti dinê û hemî hûkmê *Suleyman*

(10/10)

Nûh: Nûh Pêxember bi sebeb temen dirêjîya xwe, tufan û keştiya wî herdem di helbesta klasîk de bûye sembolek.

Zihî èeynî èecaib k' ez im kişwer *û* derya

Timend hemwar *û* mehw im ez im nacî *û* ûûfan

(10/7)

Meôherê zat *û* âîfat im meêdenê èeynê heyat im

Keştiyê Nûh *û* necat im tenenaha ya hû

(12/7)

Îbrahîm: Bi sebeb ku mîna Xelîlullah (Dostê Xweda) wesifdar e û bi mazubantiya xwe qisedar e di gelek berhemên edebî de îqtîbas ji wî hatiye kirin. Di Qur'êana pîroz de behsa wî bi qiseta Nemrûd û avêtina wî ya nava agir jî tê kirin.

Hadiyê rahê delîl im nemekê *û* xwanê xelîl im

Beniyê xaâê Celîl im tenenaha ya hû

(12/8)

Musa: Meriv dikarê bêje di piraniya klasîkên kurdî weke Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de navê Musa Pêxember û îşaretên nisbet bi bal mucîzeyên wî hene û ji qisseyaya wî gelek îqtîbas hatine kirin. Mela Ehmedê Cizîrî:

Tûr im *û* bi dil peyrewê *Mûsa* yim ez

Ateşperes *û* Tûrê tecella yim ez⁹¹

Feqiyê Teyran:

Eşqê gelek sewda kirin

Bê mal *û* bê mewda kirin

Nura çira winda kirin

*Musayê èlMran im ez*⁹²

Jixwe çiyayê Tûrî Sîna *û* xwesteka dîtina Xwedê di helbesta klasîk ya tesewifê de îqtîbasên gelek li pêş in.

⁹¹ Mela Ehmedê Cizîrî, h.b., r. 334-1.

⁹² Feqiyê Teyran, h.b., r. 22-2.

äaħibê qelbê selîm im dujminê dêwê recîm im
Cebelê Ûûrê kelîm im tenenaha ya hû
(12/9)

1.4. Îqtîbasên ji Ayetan

Ayetên Qur'anê di helbestan de mîna îbare an weke bêje îqtîbas têne kirin. Navê serên ayetan an navên sureyên Qur'anê têne bi kar anîne. Şêx Şemsedîn navê serê ayetan, carnan jî weke îbare û mefhuma ayetan îqtîbas kirine. Emê di çend beşan de van îqtîbasan kom bikim.

1.4.1. Çêbûn

Di helbestên Şêx Şemsedîn de gelek îqtîbasên li ser çêbûna Adem û li ser ehda ku însan daye Rebê xwe hatine kirin

1. 'Îname nav êehd û wefa (1/7), *êEhd û wefa*: “*Wê demê Rebê te, ji pişta kurê Adem dola wan wergirt û ew bi xwe li ser xwe kirine şahid û gotiye wan: Erê ma ez ne Rebê we me? Wan hemiyan bi hev re got belê. Em şehdebûnê didin. Daku di roja qiyametê hun nebêjin em ji vê xafil bûn.*”

وإذ أخذ ربك من بنى آدم من ظهورهم ذريتهم وأشهدهم على أنفسهم ألست بربكم قالوا بلى شهدنا أن تقولوا يوم القيامة إنا كنا عن هذا غافلين⁹³

2. Mestê meyê *elest im (1/10)* : *Wê demê Rebê te, ji pişta kurê adem dola wan wergirt û ew bi xwe li ser xwe kirine şahid û gotiye wan: Erê ma ez ne Rebê we me? Wan hemiyan bi hev re got belê. Em şehdebûnê didin. Daku di roja qiyametê hun nebêjin em ji vê xafil bûn.*

4. N' ez ji xak im *rûhê pak im bilbil î (14/6)* :

فاذا سويته ونفخت فيه من روحي فقعوا له ساجدين⁹⁴

“*Êdî min ew dîzayn kir û dema ku min ruhê xwe pîfikir hundirê wî, min got ji bo wî herine sucdê.*”

1.4.2. Qisetên Pêxemberan

Di gelek helbestan de ji qisetên pêxemberan îqtîbasên hatine kirin.

⁹³ Araf 7/172.

⁹⁴ Hicir 15/29.

5. *Hûkmê Suleyman* (10/10):

وَحْشِرَ لِ سُلَيْمَانَ جُنُودَهُ مِنَ الْجِنِّ وَالْإِنْسِ وَالطَّيْرِ فَهُمْ يُوزَعُونَ⁹⁵

“*Ji bo Suleyman arteşek ji cinan, însanan û ji çukan hatibû danhevkin.*”

6. *Menôûrê Suleyman im* (13/2):

وَتَفَقَّدَ الطَّيْرَ فَقَالَ مَا لِيَ لَا أَرَى الْهُدًى أَمْ كَانَتْ مِنَ الْغَائِبِينَ⁹⁶

“*Suleyman rabû berê xwe da teyran û got ez hûdhûd nabînim, gelo ji wundayiya ye?*” *Li vira armanc ji Menôûrê Suleyman teyrê hûdhûd e.*

7. *Cebelê Ûûr û kelîm im* tenenaha ya hû (12/9):

وَنَادَيْنَاهُ مِنْ جَانِبِ لِطُورِ الْأَيْمَنِ وَقَرَّبْنَاهُ نَجِيًّا⁹⁷

“*Me li wira ji aliyê te yê rastê bangkir te û me ew ji bo axaftinek taybet nêzîkî xwe kir.*” *Di berhemên klasîk de çiyayê Tûrî Sîna û qiseta Hz. Mûsa pir tê bi kar anîn. Ji ber ku Hz. Mûsa li çiyayê Tûrî Sîna bi Xwedê re peyiviye, ev sîfetê “Kelîm” dane wî.*”

وَلَمَّا جَاءَ مُوسَى لِمِيقَاتِنَا وَكَلَّمَهُ رَبُّهُ قَالَ رَبِّ أَرِنِي أَنْظُرْ إِلَيْكَ قَالَ لَنْ نَرَاكَ وَلَكِنْ نُنظِرُ إِلَى الْجَبَلِ فَإِنْ اسْتَقَرَّ مَكَانَهُ فَسَوْفَ نَرَاكَ فَلَمَّا تَجَلَّى رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَى صَعِقًا فَلَمَّا أَفَاقَ قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ إِلَيْكَ وَأَنَا أَوَّلُ الْمُؤْمِنِينَ⁹⁸

“*Dema ku wextê tayinkirî hat, Rebê Hz. Mûsa pê re peyivî. Hz. Mûsa got:*

-Xwedayê min, xwe pêş min bike, ez te bibînim.”

Xweda jê re got:

“*Tu nikare min bibînî, lê belê li çiya binêr (çiyayê Tûrî Sîna). Eger ku çiya li cihê xwe bimîne tê jî min bibîne. Dema Xweda di çiya de tecellî kir, çiya parçe parçe bû û Hz. Mûsa bêhiş ket. Ew tecellîya ku Xweda avête çiyayê Tûrî Sîna, tecellîyeke berbiçav bû. Ew tecellî ne tamamê mezinbûn û qudreta xweda bû. Tenê ji mezinbûn û qudreta wî ronahiyeke biçûk bû.*” Şêx Şemsedînê Exlatî mîna gelek saliken rêya

⁹⁵ Neml 27/17.

⁹⁶ Neml 27/20.

⁹⁷ Meryem 19/52.

⁹⁸ Araf 7/143.

manewî ev tecellî ji xwe re kiriye armanc û di helbestên xwe de bi du vê tecelliya Xweda de ye.

8. Keştiya Nûh û necat im tenenaha ya hû (12/7):

وَاصْنَعِ الْفُلْكَ بِأَعْيُنِنَا وَوَحْيِنَا وَلَا تُخَاطِبْنِي فِي الَّذِينَ ظَلَمُوا إِنَّهُمْ مُّعْرِضُونَ⁹⁹

“Di binê çavdêriya me û di çerçeveya wehya me de keştiyekê çêke.”

1.4.3. Xeyb

Di helbestekê de îqtîbas ji ayetên xeybê hatiye kirin.

9. Sîrrê àeyb lêm bûye haôir (3/5) :

وَعِنْدَهُ مَفَاتِحُ الْغَيْبِ لَا يَعْلَمُهَا إِلَّا هُوَ¹⁰⁰

“Kilidên xeybê li cem Xweda ne. Ji bilî Xweda kes nizane.”

Di Qur'ânê de 17 ayetên ku behsa xeybê dikin hene. (En'âm 59, En'âm 50, Yasîn 83, Hud 123-49, Neml 65, Ra'ed 9-43, Cum'a 8, Nahl 89 û hwd.)

1.4.4. Tezkiya Nefsê

Di malikekê helbestê de li ser paqijkirina nefsa rawestiyaye û 'îqtîbas ji ayetê hatiye kirin. قَدْ أَفْلَحَ مَنْ زَكَّاهَا¹⁰¹

“Birastî ew kesê ku nefsa xwe paqij kirî serfiraz e.”

Sata ki dave me qedeḥ gote emin feqed efleh¹⁰²

E' tayim û mest û fereḥ ten tele lat la la

(1/12)

1.4.5. Bereketa Qur' anê

⁹⁹ Hud 11/37.

¹⁰⁰ Enam 6/59.

¹⁰¹ Şems 91/9.

¹⁰² Feqed efleh: [Şems 91/9] قَدْ أَفْلَحَ مَنْ زَكَّاهَا “Birastî ew kesê ku nefsa xwe paqij kirî serfiraz e.”

Li ser berekata sureya Yasînê rawestiyaye û ji vê sureyî îqtîbas kriye.

يس 103

Ev **Xelwetî** aza bû dîsan ji àeman rabû

Şukrane ku dil şabû ez ber'ketê Yasînê

(15/7)

1.4.6. Tecelliya Xweda

Îqtîbas ji tecelliya Xweda hatiye kirin.

Meêherê zat û âîfat im meêdenê èeynê heyat im:

اللَّهُ نُورُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ 104

“Xweda nûra erd û esmana ye.”

1.5. Secdeya Şikrê

Dema ku meriv dighêje nîmetekî an ji bela û aciziyekê xelas dibe, li gorî baweriya dînî secdeya şikrê tê kirin. Şêx Şemsedîn di helbesteke xwe de, nefsa xwe teşbîhî kerê kiriye û bi sedem kuştina nefsa xwe kêfxweşiya xwe bi secdeya şikrê aniye ziman.

Şukrê Ôeq daim tikim ez ku kerê min par(i) mir

Secdeya şukrê tibim ez ku kerê min par(i) mir

(3/1)

1.6. Melek, Horî û Cin

Melek, horî, û cin mijarên baweriyê ne. Şêx Şemsedîn “horî” mîna lezetên xweş ên cenetê didenîşandan. Herwiha di dîwanê de ev peyv bi vî awayî cih digirin:

Ev dilê kul sûz û derdî ji te besin ta ebed

Nemit vê hûr û qusûr û cumle lezzatê bihişt

(2/2)

Leşkerê èişqê èelem înavê şehristanê dil

áarit kir ehlê şehir çend lêk tibûn hor û durîşt

(2/7)

Dema ku Şêx Şemsedîn dibêje ez deng im kas im, melek û cin im ne nas im, evya bahweriya wahdetu'l wucûdê ye. Ji xwe dibêje ez ji bilî te yanî ji bilî Xweda ez tu kesî nas nakim.

¹⁰³ Yasîn 36 /1.

¹⁰⁴ Nûr 24/35.

èAşiq û deng im û kas im melek û cinn im û nas im

âeyrî wî kes dî nenas im tenenaha ya hû

(12/4)

1.1. TAYBETIYÊN TESEWIFÎ

Tesewif, bi erebî bêjeyeke bi wateya li xwe kirina hiriyê ye. êIlmeke di navbera ebd û Xweda de ji bo çêbûna başiyê an ji bo dîtina reyên qezenckirina wesfên baş e.¹⁰⁵ Tesewif di lîteratura Îslamê de deryayêke kûr e. Hinek kes tesewifê mîna mîstîzma Îslamê dizanin. Bingeha tesewifê ji nerîna afirandinê pêk tê. Li gorî vê Xweda wicûda Mutleq e û di heman demê de Kemala Mutleq û Husna Mutleq e. Şana wî tecelliya wî ye. Evîna Xwedê ya zatê xwe û xwesteka Xwedê ya nîşandan û dîtina sifâtên xwe bûye sebebê afirandina vê alemê. Ewilî Xwedê nûra Muhemmed (s.) afirandiye. Vê nûrê li hember ezemeta Xwedê xwêdan daye. Xwedê ji wê xwêdanê derya û ji kefa wê, felek afirandiye. Dawiyê bi dorê çar unsur (ax, av, hewa û agir) afirandiye. Paşê Mewalîdê Selase (sê çêbûn; bêcan, nebatat û heywan) afirandiye. Herî dawî însan afirandiye.¹⁰⁶

Di tesewifê de çar mertebeyên ku bi çar deriyên têne bi nav kirin hene: Şerî'et, tarîqet, heqîqet û me'rifet in.¹⁰⁷

Di tesewifê de fena, dûrketina însan ji xesletên xwe yê nebaş e. Beqa, sitendina sifâtên Xweda yê kamil e.¹⁰⁸ Fenafillah, tûnebûna însan di zat û sifâtên Xwedê de ye. Di edebiyata klasîk de ev tradîsyon di hemû helbestvanan de heye. Kêşên ku di zat û sifâtên Xwedê de tune dibin ji wan re dibêjin fenafillah (wûndabûna di Xwedê de). Her mutesewifek armanca wî ya sereke, gihastina maqamê fenafillahê ye. Şêx Şemsedîn jî di vê tradîsyona tesewifê de ye û xwe di zat û sifâtên Xwedê de tune kiriye.

Tesewif, ji sedsala 16an heta sedsala 20an di çanda edebiyata kurdî de mijara herî li pêş bû. Di van sedsalan de li derdora tekya û medreseyan de edebiyateke tesewifî

¹⁰⁵ Cebecioğlu, h.b., r. 629.

¹⁰⁶ Pala, h.b., r. 25.

¹⁰⁷ Cebecioğlu, h.b., r. 412.

¹⁰⁸ Cebecioğlu, h.b., r. 267.

derketiye holê. Ji van derdoran terîqetên Neqşibendî û Qadirî yên herî sereke ne. Di edebiyata kurdî de weke derdora tekiya ya Xelwetî, Şêx Şemsedîn nimûneyeke sereke ye. Helbestvanên mutesewif di edebiyata tesewifê de, edebiyat ji bo fikir û meylên xwe mîna navgîn bi kar anîne.

Şêx Şemsedîn di têgehên tesewifê de termînolojiyê serbixwe ava nekiriye. Bi şaêirên tesewifî yên hemdemê xwe re heman termîlojiyê bi kar aniye. Şêx Şemsedîn, hinek heqîqetên tesewifê xistine hundirê heqîqetêke mecazî.

Emê di vê beşê de li ser xalên sereke yên ku Şêx Şemsedîn di helbestên xwe de bi kar anîne rawestî.

1.2.1. Wehdetu'l- Wicûd

Bi erebî yekîtiya hebûnê ye. Ji bilî Xweda tunebûna hebûna hebûnê ye. Wehdetu'l-wicûd bi zewqê tê bi destxistin û bi jîyanê jî tê zanîn. Li gorî wehdetu'l-wicûdê her tiştên hebûnê tecelliyatên Xweda ne.¹⁰⁹ Şêx Şemsedîn, xwediyê baweriya wehdetu'l-wicûdê ye. Di helbestên xwe de bi awayeke zelal baweriya xwe ya wehdetu'l-wicûdê îfade kiriye. Emê li jêrê çend mînakên wehdetu'l-wicûdê ku di helbestên Şêx Şemsedîn de hatine bi kar anîn bidin.

Meôherê zat *û* âîfat im meêdenê *è*eynê heyat im
Keştiyê Nûh *û* necat im tenenaha ya hû

âaħibê qelbê selîm im dujminê dêwê recîm im
Cebelê Ûûrê kelîm im tenenaha ya hû

èEnber *û* misk *û* bixûr im âihuf *û* lewh *û* Zebûr im
Agir *û* av im *û* nûr im tenenaha ya hû
(12/7.9.12.)

1.2.2. Evîn

Li gorî Şêx Şemsedîn evîn, evîndariya li hebûneke bêhempa ye. Ew evîn, evîneke ezêlî ye. Ji roja elestê ev evîn dest pê kiriye. Ji derdê vê evînê *è*aqil ji serî çûye.

Ten telela tibêm hunûn waleh mest im *û* cinûn
èAşiq im ez li yekî bêçûn ten tele lat la la

¹⁰⁹ Cebecioğlu, h. b., r. 683.

(1/13)

Ney mest û cinûn ez ji àemê èişq
Serxoşê meya heq bûme hêj roja elest im
(6/8)

Ev ne laf est şehdê ãaf est ba deàel
æemrê èeyin û şîn û qaf¹¹⁰ est bûlbil î
(14/8)

1.2.3. Dinya

Dinya, bi erebî bi wateya nêzîk, nizim û cihê ku însan lê dijîn e.¹¹¹ Dinya ji bo sofiyekî an ji bo salikê terîqet û eşqê re tiştê herî sereke ye ku meriv jê bi dûr bikeve. Şêx Şemsedîn jî bi vî şiklî nêzîkî dinyayê bûye.

Meoherê zat û ãîfat im meedenê èeynê heyat im
Keştiyê Nûh û necat im tenenaha ya hû
(12/17)

Yekser cîhan ti dest im li bal im bi filûsek
Hemû mûlkê dinê û hemî hukmê Suleyman
(10/10)

1.2.4. Terîqet

Di helbestên Şêx Şemsedîn de peyva terîqet derbas nebûye. Şûna terîqet kurmanciya wê “rê” û erebiya wê “sebîl” bi kar anîne. Rê, pêvajoya gihaştina Xwedê û naskirina wî ye. Ev her du term tenê di beytekê de û bi wateya rêya gihaştina Xwedê de bi kar anîne.

Êmin im ez ji qal û qîl li vê rêyê èişq e delîl
Xweş e ki hestin ev sebîl ten tele lat la la
(1/9)

1.2.5. Rind

Di dîwanê de rind, bi wateya kesên aşiq û di cezbeya eşqê de ne. Rind bi wateya baş de ye. Di malikên jêrê de peyvên mîna *rindê xerabat*, *helqeya rindan* hatiye bi kar anîn.

¹¹⁰ èeyin û şîn û qaf: “èeşq.”

¹¹¹ Cebecioğlu, h.b., r. 174.

Ez im rindê xerabat nizanim bi çi hal im
Ne ãofi û ne rind im ne kufr û ne musilman
(10/3)

Waleh û faş mest im ez mestê meyê elest im ez
Rind(ê) qedeş ti destim ez ten tele lat la la
(1/11)

Ti meyxaneyê êişqê serê xwe te kir û nê
Vexwu badeyê ãafi were helqeyê rindan
(10/9)

1.2.6. Nefs

Nefs, bêjeyeke bi erebî ye û gelek mana ihtîva dike. Bi wateya rih, eqil, bedena însan, xwîn, ezemet, izzet, raman, çavên nebaş, cewhera tişteki, eziyet, xwestek, mirad û hamiyet e.¹¹² Di dîwanê de pir li ser nefse hatiye rawestandî. Teşbîha nefse bi ker û mişk ve hatiye kirin. Di zimanê tesewifê de, bo gihaştina êeşqeke rastî, pêwîst e meriv ji nefse xelas bibe. Herwekî ku Şêx Şemsedîn di helbestê de gotiye; dema ku meriv di emrê nefsa xwe de be, meriv dibe bindestê nefse û nefse li meriv siwar dibe. Lê dema ku meriv serdestî nefse be û meriv bi ya nefse neke wê demê nefse dibe kerê meriv û meriv lê siwar dibe.

Şukrê Óeq daim tikim ez ku kerê min par(i) mir
Secdeya şukrê tibim ez ku kerê min par(i) mir

Ew kerê rehwar û vervî beûir û bêdest û kûvî
Jêma nema yêkcar(i) hîvî ku kerê min par(i) mir
(3/1-2)

Şêx Şemsedîn di helbestekê de teşbîha nefse bi mişk ve kiriye. Mişk çawa kadîn û qût talan dike, herwiha nefse jî manewiyata meriv talan dike.

Kadîn heke pir ka ye ew tewlê li ser ra ye
Her munteûir im maye ta lêm bi kiti'birînê

Mişkê ku bûye dijmin hinban kiriye kun kun
Nehîşt genim û erzin rêj biriye poxînê
(15/4-5)

Ji camê meyê êişqê xumar im hem [û] mest im
Ez im qatilê nefse ez im dijminê Şeyûan

¹¹² Cebecioğlu, h.b., r. 472.

1.2.7. Zuhd û Teqwa

Zuhd, bi erebî bi wateya bêrexbetbûn û rû guherandinê ye. Zûhd bi wateya dijberîya zewq û sefayê ye. Lê hember vê durketinê, xwe dabûna îbadetê ye.¹¹³ Teqwa, tirsê ji Xwedê û terkirina tiştên ku dîn qedexe kirine.¹¹⁴ Şêx Şemsedîn, di malîkekê de behsa zahidan kiriye.

Ev rumûzê cawidanî ehlê meêna vê tizanî
Her dibêjim zahidanî ku kerê min par(i) mir
(3/17)

1.2.8. Xeyb û Sir

Xeyb û sir du têgehên derheqê tiştên veşartî ne. Di tesewifê de tiştên ku meriv bi eqlê xwe nikare bidestxe, lê li gorî destûrdayîna Xwedê û zanîna wî, bikare bidestbixe xeyb û sir in. Sir hebûna letîfeyeke Rebbanî ya di dil de ye.¹¹⁵ Şêx Şemsedîn, li ser sirê xeybê rawestiyaye. Xeyb û sir tev di destên Xweda de ne. Ayetên Qur'anê van agahiyan piştrast dikin. Di ayeta Qur'anê de Xweda dibêje: *Xeyba erd û ezmanan ya Xwedê ye. Kar tev vedigerin bi bal wî ve.*¹¹⁶

Ez xweş im ev car ku ker mir àaib est û niye haêir
Sirrê àeyb lêm bûye ôahir ku kerê min par(i) mir
(3/5)

Ji derdê èişq evan tibêm ôahir e hem èeyan tibêm
Sirrê xefî beyan tibêm ez tibêjim j' derdê èişq
(5/3)

Zihî naûiqê nuûq im ku ev sirrê èecîb in
Zihî sirrê nihanî zihî defterê eèyan
(10/12)

Muşkil û hellê beyan im xefî û sirrê nihan im
Nadirê ehlê zeman im tenenaha ya hû
(12/10)

âamit û lal û xemûş im sirê yarê xwe dipoş im
Ger çi ez badefiroş im tenenaha ya hû
(12/16)

¹¹³ Cebecioğlu, h.b., r. 734.

¹¹⁴ Cebecioğlu, h.b., r. 625.

¹¹⁵ Cebecioğlu, h.b., r. 641.

¹¹⁶ Hud 11/123.

1.2.9. Uzlet û Xelwet

Bi têgehên uzlet û xelwetê durketina ji nîmetên dinyayê, mijulbûna bi îbadetê re, terbiyekirina nefse û xurtkirina rihê manevî tê qesd kirin.¹¹⁷ Şêx Şemsedîn, jixwe pîrê xelwet û uzletê ye. Mînaka herî pir ku di dîwanên klasîk de tê dayîn mînaka Mûsa Pêxember e. Di Qur' ana pîroz de behsa Mûsa Pêxember wisa tê kirin: “*Me bi Mûsa re ji bo sîh rojê peyman danî, dawiyê me deh rojên din jî bi ser ve kirin. Li ser vê ev dem ji teref Xweda bi çil şevî hate tamam kirin.*”¹¹⁸ Xweda, ji bo ku bi Mûsa re bipeyive û ji bo ku Tewratê jê re daxê, piştî sîh şevî civan dayiyê. Mûsa Pêxember di vê demê de rojê girtiye. Xweda dawiyê deh rojên din jî bi ser wextê wî ve kirine. Di vî wextî de Mûsa Pêxember rojê girtiye. Îradeya Mûsa Pêxember, bi wê rojiya ku girt xurtir bûye.¹¹⁹ Şêx Şemsedîn, şa' irê uzlet û xelwetê ye. Mexlesa Şêx Şemsedîn Xelwetî ye. Uzlet û xelweta wî ya li çiya û li deverên ji însanan xewle di helbestên wî de bi awayekî eşkere xwuya ye. Di gelek helbestên wî de nimûneyên uzlet û xelwetê hene.

èUzlet tikirim daim dîsan(i) wekû kungir
Her wê ki hebit kavilek ez lê tixûnim qû qû
(13/1)

Ev **Xelwetî** aza bû dîsan ji àeman rabû
Şukrane ku dil şabû ez ber'ketê Yasîne
(15/8)

1.2.10. Murşid, Pîr û Îrşad

Murşid, bi erebî bi wateya ew kesê ku rêya rast nîşan dide, kesan şiyar û îrşad dike. Murşidê rast Hz. Muhemmed (s.) e.¹²⁰ Pîr, di farisî de ji kesên xwedî temen re tê gotin. Ji bo serokê tesewifê jî re tê gotin. Bi wateya pîspor jî tê bi kar anîn.¹²¹ Îrşad, bi erebî bi wateya ew kes ê ku ji salikê riya eşqê re rêbertiyê dike.¹²² Ew kesê ku ketiye riya eşqê, bi tena serê xwe nikare bigihêje armanca xwe. Ji ber vê pêdiviya wî bi murşidekî heye. Îrşad nişandayina rêya rast e. Şêx şemsedîn teqez di vê siluka rêya eşqê

¹¹⁷ Süleyman Uludağ, TDİA., c. 15, r. 386.

¹¹⁸ Elmalı, h. b., r. 168.

¹¹⁹ İmam Taberi, Tefsir, Werg. Mehmet Keskin, Ümit Yayınları, İstanbul, c. 2, r. 690.

¹²⁰ Cebecioğlu, h.b., r. 455.

¹²¹ Cebecioğlu, h.b., r. 503.

¹²² Cebecioğlu, h.b., r. 317.

de xwedî murşid û pîrekî ye û ji bo rêya rast hatiye îrşad kirin. Şêx Şêmsedîn, bi awayekî eşkere van tiştan di malikê jêr de îfade dike.

Xelwetî irşadê pîrê xwe bigir mûhkem bi dest
Guh li xelqê qeû medêr madam ku Baqî bête lêr
(4/5)

1.2.11. Ya Hû

“Hû” gotineke erebî ye. Bi wateya “ew” e. Cînavka “hû” Xweda ifade dike. “Hû” ji navên Xwedê ye. Heta hinek sofî dibêjin ku “Hû” navê Xwedê yê mezin e (Îsmê Azam). Sofî vê peyvê ji bo xîtab û bersivê bi kar tînin. “Ya Hû” gotina bi dawîkirinê ye, herwekî ku dibêjin me ji vî karî re got “Ya Hû”.¹²³ Derwêş di dema zikir de dibêjin “ya hû”.¹²⁴ Şêx Şêmsedîn, jixwe ev gotina disiplîne kiriye û di seranserê helbestekê de weke redîf bi kar aniyê.

Ez ku mestê meyê êişq im tenenaha ya hû
Miâr û Beàdad û Dîmeşq im tenenaha ya hû
(12/1)

1.2.12. Çelebî

Çelebî; weke kesayet hatiye bi kar anîn. Çelebî; ûnvanê pîrên herî mezin yên Bektaşî û Mewlewiyan e.¹²⁵ Şêx Şêmsedîn, dibe ku ji bo xwe jî sembolan bi kar anîbe. Ji ber ku di helbestê de ji kesekî din pirtir xîtabî xwe dike.

Car car ki tibit şeb şeb hey hey Çelebî *qum qum*
Xweş xweş tibim ez heb heb hey hey Çelebî *qum qum*

Sotim ji àemê mû mû ta çendî biçim sû sû
Ey dost(i) were zû zû hey hey Çelebî *qum qum*
(7/1-2)

1.3. CIHÊN TAYBET

1.3.1. Welat û Bajar

¹²³ Abdulbak, Gölpınarlı, Divan Edebiyatı (15-16.yy.), İstanbul, 1965, r. 163.

¹²⁴ Cebecioğlu, h.b., r. 278.

¹²⁵ Cebecioğlu, h.b., r. 141.

Welatên ku di helbestê de hatine bi kar anîn Misir, Bexdad û Dîmeşq (Şam) e. Misir, Bexdad, Dîmeşq (Şam), bi sebeb bajarên qedîm û kevin in ji aliyê Şêx Şemsedîn ve hatine bi kar anîn. Di wê demê de bajarên herî meşhûr in.

Ez ku mestê meyê èişq im tenenaha ya hû
Miâr û Beàdad û Dîmeşq im tenenaha ya hû
(12/1)

1.3.2. Derya û Çiya

Şêx Şemsedîn, Weke her helbestvanekî klasîk Çiyayê Qaf û Çiyayê Tûr bi kar aniye.

Çiyayê Tûr, ji ber ku tecelliya nûra Xwedê lê bûye, di klasîkên kurdî tesewîfî de bûye mîna sembolek helbestê. Şêx Şemsedîn, sembola Çiyayê Tûr, di helbestê de ji bo baweriya wehdet-ul wicudê bi kar aniye. Çiyayê Qaf, çiyayekî efsanewî ye. Ev çiya jî di klasîkan de weke simbol tê bi kar anîn.

Xwardive şerbeta ãaf bûyime wekî kûhê Qaf
Nabêjim ez evê gezaf ten tele lat la la
(1/2)

ãahîbê qelbê selîm im dujminê dêwê recîm im
Cebelê Ûûrê kelîm im tenenaha ya hû
(12/9)

Bi tevahî navê deryayan ji bo teşbîhê hatiye bi kar anîn. Lê ev teşbîh li ser baweriya wehdet-ul wicudê hatiye ava kirin. Yanî dema ku Şêx Şemsedîn dibêje ez *behrê muhît* im, ez *qulzem* û *èumman* im di rastiya xwe de dibêje ez û *behrê muhît* û *qulzem* û *èumman* yek tiştin. Ev jî bahweriya wehdet-ul wicudê îfade dike.

Ji èişqê ku ticûşim mulazîm bixurûş im
Ez im *behrê muhîtî* ez im *qulzem* û *èumman*
(10/6)

1.4. JIYANA CIVAKÎ

Şêx Şemsedîn, ji ber şa' irê uzlet û xelwetê ye, ji jiyana civakî dûr e û simbolên jiyana civakî pir di helbestên xwe de bi kar naniye. Emê li jêrê cîh bidin çend tiştên jiyana civakî ku Şêx Şemsedîn di helbestên xwe de bi kar anîne.

1.4.1. Aletên Pîvanê

Şêx Şemsedîn, aletên pîvanê pir bi kar neanîne. Sembola “remeq” hatiye bi kar anîn. Remeq, di navbera jiyan û mirinê de dûrbûna herî kin, an jî mesafeya herî kin îfade dike.

Hetta ku maye nîv remeq dersê àem in û meh sebeq
Co ku ve tê li balê heq ez tibêjim j' derdê èişq
(5/11)

1.4.2. Aletên Muzîkê

Ji aletên mûzîkê “saz” hatiye bi kar anîn.

èIzz û naz est cumle raz est serbiser
Hem niyaz est zewq û saz est bûlbil î
(14/12)

1.4.3. Aletên Şer

Şûr (şîr), xişt û rextê mêran ji aletên şer in. Şêx Şemsedîn ev sembola di helbestên xwe de bi kar anîne. Tabîra leşkerê èişqê (leşkerê evînê) hatiye bi kar anîn.

Derd û èişq herdu cemabûn hatin ser dilê xerab
Lew perat ev dil ku hingavt hem bi şîr û hem bi xişt
(2/4)

Kûje û rûvî bi lafê key tîbin manendê şêr
Rextê mêran ger bipûştî pîrejî nabîte mêr
(4/1)

1.4.4. Lîstîk, Kêf û Şahî

Li gorî ku di helbestên Şêx Şemsedîn derbas dibe, helqeya rindan; cihê civîn, suhbet, vexwarina şerabê û lîstîkê ye. Di vê helqeyê de şerab, bade, qedeh, saqî û saz hene. Di helqeya rindan de yar her daxwaziya beşdarîbûnê jê tê kirin.

Ti meyxaneyê èişqê serê xwe te kir û nê
Vexwu badeyê ãafî were helqeyê rindan
(10/9)

èAşîq û dîwane yim ez muqîmê meyxane yim ez
Sot wekî perwane yim ez ten tele lat la la
(1/3)

èIzz û naz est cumle raz est serbiser
Hem niyaz est zewq û saz est bûlbil î
(14/12)

1.5. ÎNSAN

1.5.1. Yar

Li cem Şêx Şemsedîn xwestekeke ji bo dîtina yar heye. Ew yar mîna dostê xwe dibîne û her daim xwestekeke wî ji bo ghiştina yarê heye. Yar bi sir e. Herwekî ku yar, hinek sir dabinê ew wensa xwe bi van siran tîne.

Ûalibê dîdarê yar im custûcu daim tikim
Ger xerabat est û mescid wer çî keêbest û kenîşt
(2/5)

Dilê xwe weke erşê yarê dibîne û herwekî ku dilê wî bi neqşê yarê xemiliye û neqîşiyê. Ev neqşê yarê mîna xezîneya sirrên Xwedê ne.

Meħw(i) nabîtin li ber dilê xerab im neqşe yar
Ta kî mesken qebr û balînim bibîtin berdê hişt
(2/10)

Ji meyê èişqê xumar im me nema ãebr û qerar im
èAşiqê weãletê yar im tenenaha ya hû
(12/13)

ãamit û lal û xemûş im sirê yarê xwe dipoş im
Ger çî ez badefiroş im tenenaha ya hû
(12/16)

Xelwet îm û ãuhbet îm û dost(i) dar
Şerbet îm û èişret îm û bûlbil î
(14/13)

1.5.2. Tesewira Xweşikbûnê

Şêx Şemsedîn, di helbestên xwe de li ser unsûrê xweşikbûnê bi berfirehî nerawestiyaye. Di helbestên xwe de weke rûyê dilber, neqşê yar, cemala te, rûyê dilgeş, hûsnê yar, zihî, hwd. weke sembolên xweşikayiyê hatine bi kar anîn.

èAşiqê rûyê dilber im mest û xerab û bavzer im
Sotiyê biryan ceger im ten tele lat la la
(1/4)

Dîsa seraser ateş im èaşiqê rûyê dilgeş im
Mest û xerab û serxweş im wey ku bibêm wey ku nebêm
(8/4)

Meħw(i) nabîtin li ber dilê xerab im neqşe yar
Ta kî mesken qebr û balînim bibîtin berdê hişt
(2/10)

Bêãebr im û bêfehîm im û bêsekne û aram
Heta ku cemalê te bibînim kedperest im
(6/7)

Ba niqab est af(i)tab est hûsnê dost
Dil xerab est cerg kebab est bûlbi l î
(14/10)

Zihî dur û me`anî zihî genc û zihî kan
Zihî lu`ufê îlahî zihî şefqetê îhsan
(10/1)

1.6. REWŞÊN EVÎNÊ

1.6.1. Dînîtî

Ji ber îşqê rewşa dînîtiyê peyda dibe û dibe sedema gelek halên cuda di jiyana
êaşiq de. Herwekî ku di dîwanê de sembola cinûn (dînîtî) pir hatiye bi kar anîn.

Ji hingî nûrê mest im ti dest camê elest im
Li bo vê çend cinûn im bûyim waleh û heyran
(10/5)

Ney mest û cinûn ez ji `emê `îşq
Serxoşê meya heq bûme hêj roja elest im
(6/8)

Waleh û mest û cinûn im ji `emê `îşqê zebûn im
`Aşiqê heyyê bêcûn im tenenaha ya hû
(12/14)

Ez cinûn im `erqê xûn im malxerab
Merdê kûn im lew zebûn im bulbil î
(14/5)

1.6.2. Ax, Hewar, Fîxan û Nalîn

Rewşên wekî ax, hewar, fixan, û nalîn ji ber dînîtiya heyî û ji ber `eşqê
derdikevin. Şêx Şemsedîn, ev simbol pir belav bi kar anîne.

Çûye ji min `ebr û qerar tigrîm bi feryad û hewar
Navê t e min `eyrî dîdar ten tele lat la la
(1/5)

Şehmarê `emê `îşqê dîsan ser ku hilîna
Feryad û fî`aan ku`v dilê mecrûh(i) bi gest im
(6/4)

Her geh ku ti bê car car feryad tikim ez zar zar
Daim tibêjim yar yar hey hey Çelebî qum qum
(7/14)

Ev **Xelwetî** bêgav tikete nale û feryad
Me`ezûr bikin hûn bi kerem jê gelî yaran
(11/11)

1.6.3. Mest, Xerab, Waleh û Serxweş

Di dîwanê de ji ber rewşa eşqê simbolên, *mest*, *serxweş* (*xirab*), *waleh* hatine bi kar anîn. Sebebê rewşên heyî haletê eşqê hatiye dîtin. Ev simbolên edebiyata klasîk di dîwanê de pir hatine bi kar anîn.

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la
Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la
(1/1)

Waleh û faş mest im ez mestê meyê elest im ez
Rind(ê) qedeh ti destim ez ten tele lat la la
(1/11)

Dîsa seraser atêş im *êaşiqê* rûyê dilgeş im
Mest û xerab û serxweş im wey ku bibêw wey ku nebêw
(8/4)

1.6.4. Weslet (Gihastin)

Xwesteka evîndar a sereke ev e ku rojekê bigihêje yarê xwe. Xwedê di ayeta Qur' anê de dibêje ; “her nefis wê mirinê tam bike û hûn ê dawî vegezin ba me.”¹²⁶ Li vira bi awayekî eşkere gotina vegezin wesletê îfade dike. Herwekî Mewlana Celaliddînê Rumî ku roja mirina xwe weke “şebî arûs” (şeva bûkê) bi nav dike. Şêx Şemsedîn, bi awayekî vekirî eşqa xwe ya îlahî di beyta jêrê de aniye ziman. Ev jî delîl e ku Şêx Şemsedîn evîndarê Xweda ye û eşqa heqîqî li cem wî heye.

Teşne ê abê wîâl im ji *êemê* *êişqê* tinalim
êAşiqê *Óeyyê* Celal im tenenaha ya hû
(12/2)

Ji derdê *êişq* tinalim ez mestê ti wecd û hal im ez
Bayê rû û wîâl im ez ez *tibêjim* j' derdê *êişq*
(5/9)

1.6.5. Bade, Şerab, Qedeh, Mey û Cam

Bade di edebiyata klasîk de bi wateya serxoşê evînê û bi wateya hestên kur tê tabîr kirin. Badefiroş, ew kes e ku heskirinê belav dike. Gotina şerab, di edebiyata klasîk ya tesewifê de zehf berbelav e.

¹²⁶ el-Enkebût 29/57.

Zihî bade zihî cam zihî şerbetê ã a f î
Zihî xelwetê xalî zihî saqiyê mestan
(10/2)

Xelwetî èaşiqê mest im qedehe bade bi dest im
Ji dinê da ew perest im tenenaha ya hû
(12/17)

Ney mest û cinûn ez ji àemê èişq¹²⁷
Serxoşê meya heq bûme hêj roja elest im
(6/8)

Xumar im ji şerabê werîne nuql kebab
Dîsan zewq û ãefa ye bibîn bezmê herîfan
(10/11)

Sata ki dave me qedehe gote emin *feqed eflehe*
E' tayim û mest û ferehe ten tele lat la la
(1/12)

1.6.6. Dil

Dil, tê wateya qelb. Dil sê perçe ne. Yek jê tenê bi dinyayê re meşxûl e. Yê duyan, perçeyek bi dinyayê re, perçeyek bi axretê re meşxul e. Ya sisêyan bi mihebeta Xwedê re meşxûl e.¹²⁸ Di helbestên Şêx Şemsedîn de dil bi awayê; *dilê xerab, dilê kul, dilê sûz, dil àemgîn, dilê mecrûh, dilê suhtî kebab, dilê xeste, dilê xerîb, dil tibend*, hatiye bi kar anîn. Em di vê baweriyê de ne ku dilê Şêx Şemsedîn tenê bi mihebata Xwedê re meşxûl bû.

Ey dostê dilê suhtî ne car car disujîtin
Wellah ki dilê suhtî kebabest hemû caran
(11/2)

Mubah bûwest li min şerab ava bûyî dil mî xerab
èişqê tu rast neql û kîtab ten tele lat la la
(1/10)

1.7. TIŞTÊN SIRUŞTÎ

1.7.1. Av, Ax, Agir, Hewa û Nûr

Av, ax, agir, hewa û nûr ew maden in ku Şêx Şemsedîn di çêbûna însan de derxistine pêş. Lê ev maden û simbolên di beyta jêrê de ji bo bahweriya wehdet-ul

¹²⁷ Di vê rêza helbestê de tefileyêke erûzê kême e.

¹²⁸ Cebecioğlu, h. b., r. 341.

wicudê bi kar anîne. Herwekî ku di beyta xwe de jî îfade kiriye ku di heqîqetê de ne ji axê ye, ji *ruhê pak* (rûhê Xweda) e.

Ènber û misk *û* bixûr im *âihuf* û *lewḥ* *û* Zebûr im
Agir û av im û nûr im tenenaha ya hû
(12/12)

Ez helak im derdenak im xeste dil
N'ez ji xak im *rûhê pak* im *bûlbil î*
(14/6)

1.8. DEM

Di helbestên Şêx Şemsedîn de peyvên *mîna dem* (wext), *wekî sata* (saeta), *roja elest*, *leyl* (şev), *nehar* (roj), *yek lehze*, *wext*, *roja ezel* û *par hatine* bi kar anîn.

Yek *leḥōe* û *saèet* me *nema sukne* *û* *ãebr* im
Madam(i) ez im *wî ketî* *zarê efê* *û* *maran*
(11/4)

Kok(i) li *deèwiyê* ku'z *şahê weqt* im *ebleh est*
Qet bi *lafê şexãê* *birsî bêguman nabîte têr*
(4/3)

Derdê *èişqê* *weh* li *min rojê ezel* *kir sernivişt*
Her ji *hingê dilê* *kul bûye* *çi biryan* *û birişt*
(2/1)

Şukrê *Óeq daim* *tikim ez ku kerê min* *par(i) mir*
Secdeya şukrê *tibim ez ku kerê min* *par(i) mir*
(3/1)

1.9. AJEL (HEYWAN)

Di *dîwanê* de navên *ajelên* ku *hatine* bi kar anîn ev in: *Kund*, *rovî*, *şêr*, *ker*, *mişk*, *kuje* (*quzik*, *totik*, *delek*, *kujik*), *mar*, *bilbil*, *hudhud*. *Şaèir dengên hinek heywanan* jî bi kar anîne. *Mîna*; *qu qu* (*kund*), *pu pu* (*hudhud*).

Şêx Şemsedîn, ji ber jiyana wî di nava gundewariyê de bû û bi ajelan re têkildar bû, di helbestên xwe de ajel weke sembol pir bi kar anîne.

1.9.1. Ker

Şêx Şemsedîn di helbestên xwe de nefsa xwe teşbîhê kerê kiriye. Herwekî di helbestê de dibêje; “Carinan nefse zora min dibir û carinan min zora wê dibir. Lê dawiya dawî, kerê min (nefsa min) mir.” Her çiqas bi giştî nav û taybetmendiyê kerê hindik tê bi kar anîn, lê di edebiyata kurdî ya klasîk de hinek kesan bi kar anîne. Yek ji wan kesan Melayê Cizîrî ye. (Qedre gulane çî zanit kerbeş divêt kerê reş)¹²⁹

Geh li ser min ew tibû bar geh tibûm ez li wî sîwar
Her li bo tîkrîme car car ku kerê min par(i) mir
(3/9)

1.9.2. Bilbil

Di berheman de çukê ku herî zêde navê wî tê bi kar anîn bilbil e. Sebeb ew e ku di evînê de teşbîha evîndar bi bilbil û teşbîha yarê jî bi gul tê kirin. Herwekî ku di dîwanê de jî bi vê têkildariyê hatiye bi kar anîn. Şêx Şemsedîn, di tevahiya helbestekê de peyva “bilbil” kiriye redîf.

Dîl àerîb est èendelîb est dostê gul
Yar hebîb est ew ùebîb est bûlbil î
(14/4)

1.9.3. Kund

Kund, bi bêoxiriya xwe tê naskirin. Bi roj xwe vedişêre, bi şev jî derdikeve. Çavên wî di reşahiya şevê de baş dibînin. Lê di dîwanê de bi taybetmendiya dengê xwe û bi sekna wî ya kavi û şikeftan derketiye pêş. Helbestvan xwe teşbîhê kund kiriye. Herwekî ew jî li cihên xewle uzletê dike û di vê uzletê de her zîkrê Xwedê dike.

Kunde tibêjit qu qu hûdhûd xwe tibêjit pû pû
Ez her tibêjim hû hû hey hey Çelebî qum qum
(7/11)

èUzlet tikirim daim dîsan(i) wekû kungir
Her wê ki hebit kavilek ez lê tixûnim qû qû
(13/1)

1.9.4. Rovî û Kuje

Rovî, bi hîlekariya xwe meşhûr e. Di dîwanê de bi sebeb vê taybetmendiya rovî û bêhêzbûna wî, herwekî ku nikaribe bibe mîna şêr derketiye pêş.

¹²⁹ Melayê Cizîrî, Dîwan, Selman Dilovan, Nubihar, İstanbul 2012, r. 111.

Kuje, heywanekî ji rovî piçuktir û ji kîvroşkê mezintir e. Mîna pisîkan e, lê ne pisîk e. Li herêma Mêrdînê hinek cî (Nisêbîn) jê re dibêjin totik û hinek jî (Sirgucî) dibêjin quzik. Di helbestê de teşbîha kuje û rovî hatiye kirin.

*Kûje û rûvî bi lafê key tîbin manendê şêr
Rextê mêran ger bipûşît pîrejin nabîte mêr
(4/1)*

1.9.5. Şêr

Şêr, bi hêza xwe meşhûr e. Di helbestan de pir tê bi kar anîn. Di helbestê de bi taybetmendiya wî ya rasteqîne hatiye bi kar anîn.

*Kûje û rûvî bi lafê key tîbin manendê şêr
Rextê mêran ger bipûşît pîrejin nabîte mêr
(4/1)*

1.9.6. Hudhud

Taybetmendiya hudhud ew e ku bi Sileyman Pêxember tê naskirin. Çûkekî rengîn e. Di helbestê de helbestvan xwe beramber û teşbîhê hudhud kiriye.

*Kunde tibêjit qu qu hûdhûd xwe tibêjit pû pû
Ez her tibêjim hû hû hey hey Çelebî qum qum
(7/11)*

*Geh geh wekû hudhud ez menôûrê Suleyman im
Geh geh li rûyê ãeħra bi fiàan dibêjim pû pû
(13/2)*

1.9.7. Mişk

Mişk, heywanekî ku bi dizî zirarê dide derdorê. Di dîwanê de bi wateya nefsa heywanî hatiye bi kar anîn.

*Dîsan ti àeman mayim ev ro pejmirê xwînê
Ke'v mişk hate èenbarê ew ûewlê ti kadînê
(15/1)*

1.9.8. Mar (Suèban, Ejderha)

Mar (Suèban, Ejderha), heywaneke ku tirsawî heye. Mar û ejderha di edebiyata klasîk de mîna dijmin tene dîtin. Şaèir sembola mar ji bo tirsê bi kar aniye.

*Yek leħêe û saèet me nema sukne û ãebr im
Madam(i) ez im wî ketî zarê efê û maran
(11/5)*

1.10. RIWET(NEBAT)

Şêx Şemsedîn uzlet û xelweta xwe di nava çiyayan dar û beran de derbas kiriye lê di helbestên xwe de zehf behsa taybetmendiyên nebatan û navên wan nekiriye. Emê li jêrê cîh bidin nebatên ku hatine bi kar anîn.

1.10.1. Dar û Ber

Her çiqas şaèir di nava siruştê de jiyabe jî pir behsa nebatan nekiriye. Di malika jêrê de helbestvan peyva “ber û dar” bi kar aniye.

Satê ku dikim newhe û zarê ji àema te
Bêgav ti xurûş tînim û girye ber û daran
(11/49)

Dîtîm ki li ser darê ba zeban fesîh kapil
Tigirî ki tibin àafil ev xelq(i) hemû kû kû
(13/3)

1.10.2. Gul (èendelîb), Xar (Sitirî) û Bilbil

Weke her şaèirekî edebiyata klasîk di dîwanê de şaèir, behsa têkiliya gulê bi sitirî (xar) û bilbil re kiriye.

Dil àerîb est èendelîb est dostê gul
Yar hebîb est ew ùebîb est bûlbil î
(14/4)

Evro we yim ez jêkve nenasim ker û baran
Ferqê nakirim ez nûnkî jêkve gul û xaran
(11/1)

BEŞA PÊNCHEM

METNÊ DÎWANÊ

1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ

1. 1. Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî

1. 2. Nusxeyên Dîwanê

Dîwana Şêx Şemsedîn bi temamî li ber destê me nîne. Nusxeyên dîwana wî hene. Heta niha me du nusxe tesbît kirine. Emê li jêrê bi firehî li ser van nusxeyan rawestin.

1. 2.1. Nusxeya Şêx Memdûhê Birîfkanî

Ev nusxe bi destxeta neviyê Şêx Şemsedîn, Şêx Memdûhê Birîfkanî di sala 194an hatiye nivîsîn. Ev nusxe di sala 2002yan de li dawîwa kitêba “Dîdarê Yar” ya Zahid Birîfkanî hatiye çapkirin. Di desxetê de Şêx Memdûhê Birîfkanî weke pêşgotinekê nivîsiye û behsa kalê xwe Şêx Şemsedîn dike. Lê di vê desxetê de dîbaceya nivîskarê dîwanê nîne. Ji ber ku ev agahî di destê me de nîne, meriv raste rast nikare bibêje ka nivîskar bi çi mabestê ev dîwan nivîsandiye. Desxeta Şêx Memdûh ji 16 helbestan pêk tê. Ji van helbestan 14 heb xezel in û 2 heb jî metleêê xezelan in. Di helbesta “qum qum çelebî” de di hinek malikan de kêmaniya risteyan heye. Muhtemel e ku ev helbesta li ber lingan çûye û nehatiye xilaskirin.

Nusxeya Şêx Memdûhê Birîfkanî ne kevn e. Li gorî bahweriya me wê Şêx Memdûh ev nusxe li ber nusxeyekê nivîsîbe. Yekem, Şêx Memdûh hinek helbestên kêmkî di nusxeya xwe de nivîsîne. Ya diduyan pêwîstî dîtîye li kêleka rupelên hinek helbestan hinek serast kirin û destnîşan kirina hinek peyvên bike ev jî dide xuya kirin ku ji ber nusxeyeke têkçuyî nusxe nivîsiye.

Ji ber ku helbestên dîwanê bi piranî di vê nusxeyê de cî digirin ji me re ev nusxe pir giring e. Muhtemel e ku Şêx Memdûh hinek peyvên helbestan şaş nivîsandibin paşî agahdar bûye û ev peyvên rast kirine. Ya duyemîn ji bo ku peyvên bêne fahm kirin hinek agahî nivîsandine.

Nusxeya Şêx Memdûhê Birîfkanî, ji hêla cureyên nivîsê bi nesxeke nexweşik hatiye nivîsandin. Ev nusxe niha li cem lawê Şêx Memdûh, Zahid Birîfkanî tê parastin.

1.2.2. Nusxeya Mihemed Tahirê Birîfkî

Zahid Birîfkanî lawê Şêx Memdûh Birîfkanî ye. Herwekî ku Zahid Birîfkanî, di kitêba xwe de behsa destxeta Şêx Mihemed Tahirê Birîfkî¹³⁰ dike. Me di derbarê vê desxetê ji neviyê Şêx Şemsedîn, Zahid Birîfkanî pirsî. Zahid Birîfkanî di derbareyê desxeta Şêx Mihemed Tahirê Birîfkî, ji me re got ku ev desxeta, ji çend helbestan pêk tê. Me ev desxet lêkolîn kir, em gihîştin encamekê, ku ev nusxe di mecmuêeyeke bi navê “Tuhfetul Xullan” de cî digire. Me pêşgotina vê mecmuêe di pêvakan de destnîşan kiriye. Ev mecmuêe ji sê beşan pêk tê. Beşa yekemîn, li ser tewsiya Seyid Elî¹³¹ kurê Şêx Seyid Ebdilhemîd ji teref xizmetkarekî wî bi navê “Ehmed” hatiye nivîsîn. Beşa duyemîn nivîskarê wê nediyar e. Beşa sêyemîn, di sala 1821ê de ji hêla Şêx Mihemed Tahirê Birîfkî hatiye nivîsîn. Di beşa sêyemîn de çar helbestên Şêx Şemsedîn cî digirin. Ev mecmuêe niha li cem Îsmâil Taha Şahîn e. Piştî wefata Şêx Muhemmed Tahirê Birîfkî, ev mecmuêe digihêje lawê wî Şêx Beşîrê Birîfkî. Paşî Şêx Beşîrê Birîfkî vê mecmuêe ji bo parastina wê dide Îsmâil Taha Şahîn. Îsmâil Taha Şahîn, zavayê kurê Şêx Beşîrê Birîfkî Ebdusselam e. Îsmâil Taha Şahîn, xelkê Sêmêlê ye. Sêmêl navçeyeke 14 km nêzî Duhokê ye.

Nusxeya Mihemed Tahirê Birîfkî ji hêla cureyên nivîsê bi nesxeke normal bi hibreke reş bi pênuşeke qalind hatiye nivîsandin. Nusxe niha li Başurê Kurdistanê li cem Îsmâil Taha Şahîn tê parastin. Emê li jêrê ji bo danasînê despêka helbestan rêzika yekem bidin nîşandan.

Helbest 1. Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la

Helbest 2. Şukrê heq daim tikim ez ku kerê min par(i) mir

Helbest 3. Ez ku mestê meyê èişq im tenenaha ya hu

Helbest 4. Tibêjim ez ji qal û ôal ten im tenê we ten tenê

